NAVEROK

Pêşgotina çapa yekem 7

Pêşgotina çapa sêyem 10

Feqiyê Teyran 11

Nav û Nasnavên Feqiyê Teyran 18

"Feqe û Feqîtî" Çi Ne û
Çima Ji Wî re "Feqiyê Teyran" Gotine? 20

Feqiyê Teyran Kengê Hatiye Dunyayê û
Di Kîjan Çaxê De Jiyaye? 36

Ciyê Feqiyê Teyran Lê Xwendiye û Lê Jiyaye 50

Berhemên Feqiyê Teyran 54

Zimanê Helbestên Feqiyê Teyran 60

Naveroka Helbestên Feqiyê Teyran 63

Helbestên Feqiyê Teyran Yên Hicwî 80

Awayê Helbestên Feqiyê Teyran 80

Jêderên Van Helbestan 85

Çend Çîrokên Li Ser Feqiyê Teyran 95

Erê Şoxê 95

Feqiyê Teyran û Sêva Heram 98

Feqe û Xwarinên Muksê 99

Tirba Feqî 99

Feqiyê Teyran û Zêr 99

Feqî û Keça Mîr 100

Feqî û Zimanê Teyran 100

Helbestên Feqiyê Teyran 103

Ellah Çi Zatek Ehsen e 103

Ey Av û Av 111

Îro ji Dest Husna Hebîb 127

Bi Çar Kerîman 137

Îro Girya Me Tê 149

Feqe û Bilbil 147

Dilber 157
Feqe û Melê 163
Dilo Rabe 203
Îlahî Lew Dikim Zarî 237
Şêx Sen'an 239
Bersîsê 'Abid 337
Şerê Dimdim 383
Zembîlfiroş 399
Ez Çi Bêjim... 417
Ay Dilê Min Ay Dilo 417
Qewî Îro Ze'îfhal im 421
Çiya Anî li Deştê kir 425
Îlahî 'Ebdukel Atak 429
Ji 'Işqê Sotîme Welleh 435
Ji Rengê Dilbera Horî 439
Bizan Ku Min Yar Tu Yî 443
Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa 449
Ordeka Ava Cizîrê 453
Fesla Bihara Cennetê 457
Xwedawenda Gunehkar im 461
Xwedawenda Tu Sebbûhû î 465
Îro ji Eşqa Sorgluê 469
Dilo Carek Xwo Hişyar ke 473
Min Dî Di Xewnê da Gulek 477
Ji Exqa Te Ezî Dîn im 479
Hatim Ber Dergahê Rehmet 483
Ah Ji Dest Cama Wîsalê 487
Ellah Sehergaha Ezel 491
Îlahî Ger Gunehkarem 493
Sînem û Çerxa Felekê 495

Ferhengok 497

Helbestên Feqiyê Teyran

Ellah Çi Zatek Ehsen e*

1.
Ellah çi zatek ehsen e
Zêde letîf û qadir î
Mexlûq hemî nexşê te ne [1]
Vêk ra li hemyan fekirî [2]
Hemd û sena laiq we ne [3]
Yê 'erşê 'ezîm çêkirî [4]

2
'Erşê 'ezîmê ekber e
Zînet û raza merkezî [5]
Ew kursiya heq li ser e
Bêşems û gerdûn dibezî [6]
Heq wahid e witr e fer e [7]
Bê newm e baxvanê rezî [8]

---

1. Mexlûq hemî neqşê te ne (Zinar)
2. Vêk ra di hemyan fikirî (Zinar)
3. Hemd û sena layiq te ne (Zinar)
4. Ê erşê e'zem çêkirî (Zinar)
5. Ji neh qerar û merkezî (Zinar)
6. Bêçerx û gerdûn nabezî (Zinar)
7. Heq wahid e witr û fer e (Zinar)
8. Bênewm î baxvanê rez î (Zinar)

* Ev helbesta li ber pirtûka Seîd Dêreşî Pêzanê Elîxan, *Dîwana Feqiyê Teyran* û ya Zeynelabidîn Zinar *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî* hatiye hevberkirin û tûjandin. Ya bingehîn a Seîd Dêreşî Pêzanê Elîxan e. (M. X. S.)

3.

Baxê ku baxvan bête ber
Erdek heye ew lê nebî
Dara ku enqa bête ser
Belgek heye sih lê nebî [9]
Kî j'nî'metê dê dit xeber [10]
Ya Reb derê feyzê vebî

4.

Ser çeşmeya feyzê çi ye?
Hate lîsanê 'arifan
Ew nûreka esmanî ye [11]
Darête qelbê xaîfan [12]
Jê şem'eyek da Miksî ye [13]
Lew bûm nedîmê taifan [14]

5.

Lew bûm herîf lew bûm nedîm [15]
Min 'işqeka dijwar heye[16]
Kovî kirim serfa 'ezîm [17]
Min hêj meya pêrar heye
Minet ji Rehmanê Rehîm [18]
Min mîrekî setter heye [19]

---

9. Belgeh heye sî lê nebî
10. Kî j'ni'metek da kit xeber
11. Ew nûrekî rehmanî ye
12. Darihte qelbê xaîfan
13. Jê şem'eyek da Muksî ye
14. Lew bûm nedîmê taifan
15. Bûme nedîm bûme herîm
16. Min 'işqikî dijwar heye
17. Kêfê dikim serfa 'ezîm
18. Minet ji Rehman û Rehîm
19. Min mîrekî setar heye

6.
Ew Mîr kerîm e, satir e [20]
Xweş hakim e d'barê xwe da
Xelqno! Ne dûr e, hazir e
Ew wahid e û bê îbtîda
Her çî bikit ew qadir e
Ew xaliqê bê bab û da

7.
Xelqno! Ji kê ra ev qese [21]
Da heq bi 'urfê nas bikî
Er dê bizanî ev bes e
Ferxunde ye ne j'ferxekî
Ew yek ji 'amê ra bes e
Neh çerx di nêva çerxekî

---

20. Ew Mîr kerîm û satir e
Xweş hakim e di bar xwe da
Herçî bike ew qadir e
Ew sani'ê bêîbtîda
Xelqno ne dûr e hazir e
Ew wahid e bê bab û da

21. Wahid yek e ne ji kes e
Ferxende ye ne ji erxekî
Ew yek ji 'amê re bes e
Muhtac neh in bal ferxekî
Ustadê aşê etles e
Neh çerx di nava çerxekî

8.
Çerxê di nêv çerxa ez im [22]
Ruh û rewana min tu yî
Ez hişkedar im narizim [23]
Xeml û rihana min tu yî [24]
Bêy te neşêm gavek bezim
Xanim mirada min tu yî [25]

9.
Bêy te miradek meyt im [26]
Qelbim ji surr mîr'ate ye
Ez kuştiyê natebitim
Fexra qulûban te heye
Xelqno! Bi Furqan û xet im
Herçî dibêjim her we ye

22. Bê te çi me? ez ne ez im.
23. Ez hişkedar im ne rez im
24. Xemr û ruhana min tu yî
25. Çûn û sekana min tu yî
26. Bê te mirar im meyit im
Qelbê ji ser mirate ye
Ez kuştiyê natebîb im
Behra qulûban te heye
Xelqno bi Qur'ana 'ezîm
Her çi dibêjim her we ye.

10.
Ma ez dibêm vê gotinê
Bêy te ziban bê gotin e [27]
Ew qal û qîlê di dinê [28]
Zahir û batin sakin e
Bûn û mîqata mirinê [29]
Ew j'bal te ne, ne j'bal min e [30]

11.
Min hewl nehin quwet nehin [31]
Rûh ji te ye dîn ji te ye
Min zehr û ezman navebin
Deng ji te ye sewt ji te ye
Awaz ji kewna qudret in
Dest ji te ye çeng ji te ye

12.
Ew çeng çi ye roja ewel [32]
Çeng û lîsan jî digirî
Deng têt ji sazê pir'emel
Tembûr tiraş û kun kirî
'Işq û evîndarê te dil
Hubba di nîvê çêkirî

---

27. Bê te zeban bêgotin e
28. Kî ne ku mana bibînê
29. Ew qîl û qalê di dinê
30. Têk j'bal te ne ne j'bal min e
31. Mi hewl neh in quwet neh in
Mi sewt û ezman bi te ye
Mi zehr û ezman qet neh in
Dest ji te ye çeng ji te ye
Mi fikr û hem himet neh in
Ruh bi te ye rah bi te ye
32. Ev şeşmalke û şeşmalkên li dû 13-19. di pirtûka Zinar de nîn in. Di pirtûka Zinar de 12 şeşmalik hene. 11 şeşmalik hevber bûn, lê ya 12ê hevber nabe. Ji bo hindê jî em dê li dawiyê wê binivîsin.

13

Hub rêtî canê beşer e
Sewda ji mejyê wî firî
Goyinê nêv dar û ber e
Bêsûc e qet nakit girî
'Işq û evîna qemer e
Netq û lîsanê jê birî

14.

Deng ji defa canê me tê
Kirdin nefir û nayekî
Sani' bi herfê pif ketê
Her zehrekî b'awazekî
Subhan ji şahê qudretê
Her canekî û ebdanekî

15.

Kelamekî mutleq dibên
Bû ruh li her heywanekî
Tesbîheka rewneq dibên
Her xelkekî bi ezmanekî
Hemd û senaya heq dibên
(...) [33]

33. Ev malke di helbestê de nehatiye.
We diyar e ku ya winda ye.

19.

Dê b'çîne nîva axekê
Perda turabê tarî ye
Feqî dê rakit rahekê
Bi mehdera wî barî ye
Bo çak û parsa b'carekê
L'cennet bikin serdarî ye

20.

Avek mehîn im kemter im [34]
Min cerg û dil bûne birîn
Sewda û dîn û ebter im
Pabendê vê nefsa le'în
Muksî yê jar û bedtir im
Ferhemnî xeyre rahimîn

34. Ev şeşmalke di pirtûka Zinar de hebûn, lê di ti pirtûkên din de berçav neketin.
Ji ber hindê me êxistine dawiya vê helbestê.

Ey Av û Av

1.

Ey av û av ey av û av [1]
Ma tu bi 'işq û muhbetê [2]
Mewc û pêlan tavêy belav [3]
Bê sekne û bê rahetê

2.

Bê rahet û bê sekne yî
Yan 'aşiqê baxwê xwe yî?
Yan şubhetê qelbê me yî
Ji işqa kê natebitê [4]

---

1. Ey avî av ey avî av
2. Ma tu bê eşq û muhbetê (Z.N.)
3. a- Tavêj belav (A.)
   b- Mewc û pêlan davê belav (Zinar)
4. a- Ji işqa kê........... (F.)
   b- Ji işqa kî natebitê (Zinar)

3.

Ji işqa kê her têy û têy [5]
Heta kengê her bêy û bêy
Bo min bêj heyranê kêy
Da ez bizanim qissetê

4.

Da ez bizanim vê surrê
Ji hindekê heta purrê [6]
Ji me'neya vê gurgurrê [7]
J'kê ra dikî vê ta'etê

5.

Ta'et dikî bê pa û dev [8]
Çendî dikî çûna li hev
Dengê te tê bi roj û şev
Zikrê dikî bi haletê

---

5. a- Ji işqa kê tu tê û tê
Heta kengê tu bê û bê
Bo min bêje heyranê ê (A.)
b- Ji işqa kê tu têy û tî
Heta kengê tu bêyî û bî (M.)
c- Ji işqa kî tê û tê yî
Heta kengê bê û bêyî
Bo min bibêj heyran kê yî
Da ez bizanim heybetê (Zinar)
6. a- Ji hindekiyan yan ji pirê (A.)
b- Ji hindekê heya pirê (M.)
c- Ji hindikî yan ji pirî (Zinar)
7. Ji maniya vê gurgurê (Zinar)
8. Ev çarîne di pirtûka Zinar de hebû û di yên din de nebû.

6.

Ji kê ra dikî zikrî bi hal
Qet guşguşa nakî betal [9]
Şubhetê min rehtê êmal
Şevan û rojan xew netê

7.

Şevan û rojan bêxew î [10]
Ji muhbeta kê ditewî?
Şevtariyan qet nahewî
Tu j'emrê kê ve lez ketê

8.

Tu j'emrê kê her têy bi bez [11]
Sewdaserî şubhetê ez [12]
J'kê ra dikî çûna bi lez
Vê serqutan û xulmetê [13]

---

9. a- Şev û rojê nakit betal
Şubhetê min reht î emal e'mal
Lew şev û rojan xew netê (A.)
b- Qet gujgujê nakî betal
Teşbîhê min rehtî e'mal
Lew şev û rojan xew netê (Zinar)
10.a- Lew şev û roj bê xew î
Ji mihbetê l'hev ditewî
Şevtariyan qet naxewî
Daîm diçî dengê te tê (A.)
b- Lew şev û rojan bê xew î
Ji mihbetê l'hev ditewî
Çi sebebe qet nahewî
Ji emrê kê bi lez ketê (Zinar)
11.Ji emrê kê têyî bi lez (Zinar)
12.Sewdaserî teşbîhê ez (Zinar)
13.Vê serqutan û xizmetê (Zinar)

9.

Xulmet dikî bê pê û dest [14]
J'kê ra dikî çend koh û best
Baxwoy negot gavek vewest
Hindî diçî dengê te tê

10.

Dengê te tê bê pê û hev [15]
Ta'et dikî bê qelb û dev [16]
Peyda dibin j'te mewc û kev[17]
Şîn bûy ji rengê qudretê [18]

11.

Geh geh sipî şubhetê şîr [19]
Qet mislê te naçin tu tîr
Reng e ku te yar tête bîr [20]
Meyla Hebîb j'çûna te tê [21]

14.Xizmet dikî bê pa û dest
Çendî dikî çûna guhest
Baxwe nekî gavek celest
Daîm diçî dengê te tê (Zinar)
15.Dengê te tê bi roj û şev (Zinar)
16.a- Ta'et dikî bi qelb û dev (A.)
b- Ta'et dikî bi roj û şev (M.)
17.a- Peyda dibin jê mewc û kef (A.)
Subhan ji şahê qudretî (A.)
b- Peyda dibit jê mewc û kef (Zinar)
18.Şêrîn ji rengê qudretê (Zinar)
19.Rengê te jê yar tête bîr
Geh geh diçî teşbîhê tîr
Nagijne tekesek bi seyr
Meyla hebîb ji çûna te tê (Zinar)
20.Dengê te tê yar tête bîr (A.)
21.Meyla hebit................A.

12.
Lazim te mehbûbek heye
Yan dost û metlûbek heye [22]
Yan meyl û mensûbek heye
Lew bê libas û kîswetê

13.
Lew bê lîbas û taziyî
Bi reqs û seyr û gaziyî
J'kê ra dikî işqbaziyî [23]
Remz û sirran te vêketê [24]

14.
Remz û sirran vêkra dikî
Hem'yan ji baxwo ra dikî [25]
Wek aşiqan seyran dikî
Gerha di mîhra xurbetê [26]

22.Di pirtûka Zinar de vê malikê cih guheriye.
Wek:
Lazim te mehbûbek heye
Yan meyl û mensûbek heye
Yan dost û mensûbek heye
Lew bê lîbas û kiswetê
23.Ji kê ra dikî şahbazî (A.)
24.a- Lew bê lîbas û taziyê
Vê seyr û reqs û gaziyê
Ji kê ra dikî şehbaziyê
Remzê di xwe îşaretê (Zinar)
b-Remzê di xwe îşaretê (F.)
25.a- Hemiyan ji bo xwar dikî (A.)
b- Tu teşbîha ji kê ra dikî
Hemyan ji Xwedê ra dikî
Girtî di behra xefletê (Zinar)
26.Geryam ji mîhra xurbetê

15.
Gerha di nav pîredinê
Qet nanivî, nasekinê
Reng şubhetê qelbê minê
Ji muhbetan û rehmetê [27]

16.
Zehmetber î mihnetkeş î [28]
Tu nazik î û teb'et xweş î [29]
Bê ruh li erdê ra d'meşî [30]
Bê dest û pê tu j'kû ve tê [31]

27.a- Geryam ji ber mîhra dinê
Qet nahewî nahedinî
Roj şubhetê qelbê min î
Bi destê kê dikêşî mihnetê (A.)
b- Girtî di vê behra denî
Qet nanivî nasekinî
Reh şubhetê qelbê min î
Ji mihnetan û zehmetê (Z.)
28.Zehmet pir î mihnetkeş î (A.)
29.Ey nazika teb'etxweşî (F.)
30.Bê le erdan têy meşî (Z.)
31 a- Bê dest û pa tu ji kû ve tê (Z.)
b- Ev çarîne di pirtûka Zinar de bi vî awayî ye:
Zehemetpirê mihnetkêşê
Lê nazikê teb'etxweşê
Bê ruh li erdê dimeşê
Bê dest û pa tu ji kû ve tê (Zinar)

17.
Bê dest û pê bê çeng û perr [32]
Ew pêl û mewc û fetl û gerr [33]
Peyda dibin j'te "kerr" û "ferr" [34]
Nakî beyan vê 'îlletê [35]

18.
Vê îlletê beyan bike
Bes vê sirê star bike [36]
Carek li min 'eyan bike [37]
Da seh bikîn hîkayetê [38]

19.
Da seh bikim vê meselê [39]
Cuz'ek ji behsa ewwelê [40]
Binyad-i bûna menzelê [41]
Dewran û çerxa xîvetê [42]

---

32. a- Bê dest û pê û çeng û per (F.)
 b- Bê dest û pa û çeng û per (Zinar)
33. Ew mewc û pêl û fetl û ger (F. û Zinar)
34. a- Ji kê ra dikî ev "kir" û "fir'"F.
 b- Ji kê ra dikî ev ger û xer (Zinar)
35. a- Nakî beyana vê illetê (A.)
 b- Nakî Beyana illetê (Zinar)
36. a- Bes vê sirê star bike (A.)
 b- Bes vê surê penhan bike (Zinar)
37. a- Carek li min îzhar bike (A.)
 b- Carek li min beyan bike (Zinar)
38. a- Da ez bizanim hey'etê (A.)
 b- Da seh bikim ez meselê (Zinar)
39. a- Da ez bizanim meselê (A.)
 b- Da seh bikim ez meselê (Zinar)
40. a- Cuz'ek ji behsa ewelê (A.)
 b- Cuzek ji behra ewelê (Zinar)
41. a- Ji dunya di bûna menzelê (A.)
 b- Bîna bike vê menzelê (Zinar)
42. a- Ji dewran û çerxa adetê (A.)
 b- Dewran û çerxa xifetê (Zinar)

20.

Xîveta alem di navê [43]
J'berketa feyz û gulavê [44]
Min temenna kir ji avê
Ji me'neya heqîqetê

21.

Heqîqeta van cewheran [45]
Me'rîfeta 'enasiran [46]
Penhan neke j' yar û biran [47]
Bê dev bibêje hikmetê [48]

22.

Bê dev û qîl û qal bibêj *
Hêdî bi lefzê hal bibêj [49]
Ber "Mîm û Hê û Dal" bibêj
Şerh û beyana kaxetê [50]

---

43. Ew xifeta alem di nav (Zinar)
44. a- Ji berketa wê feyz û gavê (F.)
    b- Ji berketa wê feyz û gav (Zinar)
45. a- Ji me'neya çar cewheran (A.)
    b- Ji heqîqeta çar cewheran (Zinar)
46. Ji me'rîfeta enasiran (A. û Zinar)
47. a- Lûma bikin ji bar û biran (A.)
    b- Ponhan nekir j'yar û biran (Zinar)
48. a- Bê fem bibêjî hikmetê (A.)
    b- Qet kes nema li vî haletê (Zinar)
* Ev çarîne û hersêkên li dû tên di pirtûka Zinar de ne.
49. Hindî bi lefzê bal bibêj (F. û Z.)
50. Medh û beyana kaxetê (A.)

23.
Da kaxetê "îsbat" bikin [51]
Qeydêd hûr "î'tîbar" bikin [52]
Carek li min "îzhar" bikin
"Wazih" ku fehmê min re tê [53]

24.
Dîdar û dîna sertemî [54]
Avê bi Rebbê 'alemî
Tu hadis î yan qidem î
Yan tu nizanî hikmetê [55]

25.
Ber çi nemeşrûh ev sexin
Rojek ji bunyada mezin
Bîna qedeh jê d'hate min
Ew bîn ji bunyada te tê [56]

26.
Ew reng dibêt ava zelal [57]
Buhrîn li min çend mah û sal
Qet kes nekir ev reng sual [58]
Heta geham vê sa'etê [59]

---

51. Vê kaxetê beyan bike (A.)
52. Qeydê di hûr îsbat bike (A.)
• Qeydê di hûr dîyar bike.
53. Wezzûh ku fehma min netê (A.)
54. a- Bê darê dunya sirtimî
b- Tu ava Rebbê alem î (A.)
55. a- Yan tu jî dizanî heyetê (F.)
b- Bi hizra min di navbeyna çarînên 24. 25. û 26ê de çend çarîn kêm in. Lewra ev çarîne li dû yêk nayên, wehe ye ku kêm in.
56. Ev çarîne bi tenê di destnivîsa F. de hebû.
57. a- Ez ava Rebbê Zulcelal (A.)
b- Ev reng dibê ava zelal (Zinar)
58. Qet kes nekir ev reng sual (A. û Zinar)
59. Heta niha vê saetê- F û Zinar

27.
Heta gehame vê demê
Ma yek nebû d'vê 'alemê [60]
'Ebdek ji pişta ademê [61]
Bifkir di ehwalê şetê [62]

28.
Kehnî dizên co jê diçin [63]
Hindî Xwedê dan îns û cin
Qet kes nekir ev pirs ji min [64]
Ne ji enbiyayê ummetê [65]

29.
Miksî dibê avê we bû [66]
Pêxemberan aqil hebû
Qet hewceyî pirsan nebû [67]
Wan dest gihabû sohbetê [68]

---

60. Carek nebû di nêv alemê (Zinar)
61. a- Qet kes nebû di vê alemê
Ebdê ji pişta ademê (A.)
b- Evdek ji pişta ademê (Zinar)
62. a- Bifikrîte min vî haletî (F.)
b- Pirs kir ji ehwalê şetê (Zinar)
63. a- Kehnî dizên şet jê diçin (A.)
b- Kanî dizên şêt jê diçin (Z.)
64. Kes ev sual nekir ji min (F.)
65. a- Ez enbiyayê umetê (A.)
b- Ji enbiya û umetê (Zinar)
c- Di pirtûka Zinar de çarînek din jî heye. Ew jî her wekî vê çarînê ye; dibe ku dubare bibit. Weha ye:
Avê got: Kanî dizên şet jê diçin
Hindî Xwedê da ins û cin
Qet kes nekir ev pirs ji min
Ji ulemayê ummetê.
66. a- Feqî dibê avê we bû (A.)
b- Feqî digo ey av we bûn (Zinar)
67. a- Hewcey çi pisyaran nebû (F.)
b- Qet hewceyê pirsa nebûn (Zinar)
68. a- Wan dest gihande huccetê (A.)
b- Wan zanîbû vê hikmetê (Zinar)

30.
Avê digo: Feqî rabe [69]
Bê tedbîr û ‘emel nabe
Ji halê te dê çawa be
J’kê ra dikî vê suhbetê

31.
Ew sohbeta cara ewil [70]
Pêxemberan d’zanî şuxil
‘Eyb e ji bo ehlê ‘eqil [71]
Teftêş bikin me‘rîfetê

32.
Me’rîfetê teftêş bikin [72]
Pirsan li bûna pêş bikin [73]
Wan qisetan vetêş bikin [74]
Li ‘arifan kerahetê*

69. Ev çarîne bi tenê di pirtûka Zinar de heye. Ne bi vê rêzê bû lê min êxiste nav vê rêzê.
70. a- Ji suhbeta cara ewel (A.)
b- Ji huceta cara ewul (Zinar)
71. a- Eyb e li nik ehlê aqil (A.)
b- Eyb e li bal ehlê aqil (Zinar)
72. Ev çarîne û herduyên li dû di pirtûka Zinar de nîn in.
73. Pirsê ji wan sual bikin (A.)
74. Qenc vê qisê îspat bikin (A.)
* Ji ‘arifan kerametê.

33.
Xelkê Xwedê aqil kirî
Hem arif û kamil kirî*
Nûrek di dil da hilkirî
Eslê qisan rê dibetê [75]

34.
Ê mîslê min bê 'îlm û xet
Mecnûnekî heywan sifet
Bê teftêş pisyaran diket [76]
Bê rehnima kî babetê

35.
Pirsa Feqî bê cih nebû
Lewra di Furqanê hebû
'Erşê Xwedê li ser te bû
Avê gelo bîra te tê?! [78]

---

* Hem 'alim û 'amil kirî.

75. Eslê qisan wî di bitê (A.)

76. Û misli me bê ilm û xet
Mecnûn û heywansîfet
Bê teftêş pirsanî diket (A.)

77. Pirsa Feqî bê bi cêh nebû (A.)

78. Pirsa Feqî bi cî nebû
Lewra di Qur'anê hebû
Erşê Xweda li ser te bû
Ey av gelo bîra te tê? (Zinar)

36.
Avê cewab da bê suxen
Ezman nebû b'hal gote min
Remzên di padşahê mezin
Subhan ji vê seltenetê [79]

37.
Subhan ji ma'bûdê li ser
Kî dê j'Allah ra kit xeber
Em j'çar bakir anîne der
Kiç bûn di kenza qudretê [80]

38.
Keç bûn di kenza qidemî
Baxwoy ji eşqa ademî
Anîne karê alemî
Zahir kirîn l'vê sûretê [81]

39.
Zahir kirîn çar "bakir" e [82]
Ba w av û ax û agir e
Heywan hemû jê çêkire [83]
Dar û nebata kiswetê [84]

---

79. a- Avê cewab da ev suxen
Ziman nebû bi hal gote min
Remzek ji padîşahê mezin
Subhan ji vê seltenetê
b- Ev çarîne û yên li dû tên bi rêzê 37-47.
di pirtûka Zinar de nîn in.
80. Kê ji Xwedê da bit xeber
Em car kirin anîne der
Qenc bûn di kenza qudretê (A.)
Genc bûn di kenza qudretê
81. Ev çarîne bi tenê di destnivîsa F. de hebû.
82. Zahir kirin çar papire
Av, ax û ba û û gire (A.)
83. Heywan hemû ji me çêkire (F.)
84. Durr û nebat û qîmetê

40.
Dar û nebat û le‘l û zer
Heywan û esnafên di ser
Teyr û tûrî û de’bewer
Teftêş kirin ji nutfetê [85]

41.
Çi tişt pîçe nafericin
Însan ji tînêd xaricin
Lew cin ji narêd maricin
Dûr e li melek teb‘etê.

42.
Çar teb’et in vêk ra zid în
Hem ateş in hem barid în
D’behra heyûla d’warid în
Melbûs bi vê wechiyetê

43.
Bi çar wechan em yabis în
Muqîm yek e em hadis în
Lewra ritûb û yabis în
Hem jî dixwazin ref’etê

44.
Hem suflewî bazî dikîn
Hem meylî evrazî dikîn [86]
Hem “keynûn” hem gazî dikîn
Carek bibînin ru’yetê

85- Dar û nebat û le’l û durr
Teyr û tuyur û dehhepurr
Heywan û însanê besurr
Terkî kirin ji nutfetê
86- Hind şîn û hind şahî dikin.

45.
Carek bibêj em çar xweh in
Bê meslehet nakerrihîn
Ji meşyetê na bettihîn
Cuda kirin j'wesfiyetê

46.
J'wesfiyetê cuda kirin
Ji suhbetê em rakirin
Heta qiyam sewda kirin
Sergeşte yin di hîretê

47.
Di hîretê sergeşet yîn
Qaîm li ser zatê xwe yîn
Çarde tebeq karê we yîn
Rabû ji maza xefletê

48.
Ew 'alim in ez feqe me [87]
Serseriyek...............
Ez hewceyê pirsa te me
Li min bike tu şefqetê

49.
Ava mezin firfir meke
Zikrê bike fexrê meke
Ehlê Xwedê aciz meke
Bes e bide min ezyetê

---

87. Ev çarîne û hersêkên li dû tên bi tenê di pirtûka Zinar de hebûn. Ev çarînana li gel yên pêşiya xwe û yên li dû xwe lêk nayên. Lê her çawa be ev çarîn jî yên vê helbestê ne. Ev tişta jî hem ji awayê wan û hem jî ji gotinên wan kifş e. Ji ber hindê min êxistine dawiyê.

50.
Ava mezin l'hev şêwirî
Pêla pêş j'Feqe inirî
Dav dav li Feqe........
Ku bavê d'yarê zulmetê

51.
Gava Feqe xwe têk dida
Pêla pêş xwe l'stû dida
Feqe girt û l'erdê dida
Go: Her bimre l'xisaretê [88]

88. Ji bilî van helbestên me li vir hevber kirin û tûjandin, helbesta "Ey Av û Av" di pirtûka Qanadê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî* de jî heye. Lê gelek cudahiyên wê û yên van helbestan hebûn. Me nikariye wê li gel vana bitûjînin. Em dê wê helbestê bi awayê Qanatê Kurdo nivîsî di dawiya vê pirtûkê de binivîsin.

Îro ji Dest Husna Hebîb

1.
Îro ji dest husna hebîb
Sergeşte û heyran im ez [1]
Min eşq û muhbet bûn nesîb
Sewdayê sergerdan im ez

2.
Eşqê gelek sewda kirin
Bê mal û bê mewda kirin
Nûra çira winda kirin
Mûsayê 'Umran im ez [2]

3.
Mûsa ji dest husna bi nûr
Şîrîniya xalên di hûr
Secde bire ber Kohê Tûr
Nêzîkî remzê wan im ez

---

1. Serkeşte û heyran ez (B.)
2. a- Eşqê gelek şeyda kirim
   Bê mal û bê mewda kirim
   Nûra çira winda kirim
   Mûsayê Umranî me ez (E.)
   b- Mûsa îbnî Umran im ez (B.)

4.
Remzê ku dê dilber bikin [3]
Carek bi çeşman seyr bikin [4]
Dê Kohê Qaf kerker bikin
Mecrûhê pir kovan im ez

5.
Ah ji dest kovan û qehran [5]
Min sebir nayêt li sehran
Şubhetê mewcên di behran
Qulzemê 'Umman im ez [6]

6.
Qulzem û behrên di heftê [7]
Agirê eşqê ku keftê
Dê sojit şubhetê neftê [8]
Min diye û pê zanim ez

---

3. Remza ku dê dilber bikin (B.)
4. Carek bi çavan seyr bikin (E.)
5. Min ah ji dest kovan û qehran (A.)
6. Qurzem û Umman im ez (B.)
7. Qurzem û berên di heftê (B.)
8. a- Dê disojit şubhî neftê (B.)
b- Dê bisojit şubhê neftê (Zinar)

7.
Min diye muhbet çi reng e [9]
Soht e dijwar e pereng e [10]
Min mudam dil jê bi heng e
Bi nalîn û efxan im ez [11]

8.
Nalîna teyr û tiyûran
Kalîna çeng û bilûran
Xuxulîn d'qesr û qisûran
Bilbilê xweşxwan im ez [12]

9.
Bilbilim daîm dixwînim
Ez yekî er te nebînim[13]
Dîn dibim sewda dimînim
Şerxweş û sekran im ez [14]

---

9. Min diye û muhbet çi reng e (F.)
10. a- Sahtî me doja piring e (A.)
    b- Sohtime doja perenge (Zinar)
11. Bi nalîna efxanî me ez (A.)
12. Bilbilê xwoşxan im ez (A. û E.)
13. a- Ez yeqîn ez te nebînim (A.)
    b- Ez ku vê yarê dibînim (E.)
14. Serxwoş û sekran im ez (A. û F)

10.
Serxweş û ebter kirim te
Ji ‘illeta rengzer kirim te
Sotim û ker ker kirim te
Agir û biryan im ez [15]

11.
Agir û pêta di dil da
Me‘neya daxan ku hilda [16]
Ew kitab naçit tu cilda [17]
Hafizê medhan im ez [18]

12.
Hafizê medh û pesindan [19]
Rohniya mehbûb û rindan
Bê hîsab werbûn di findan
Sotiyê bêcan im ez

---

15. a- Tev agir û biryan im ez (B.)
b- Wê serxwoş û ebter kirim
Ber illetê rengzer kirim
Sotim wê ez ker ker kirim
Tev agir û biryan im ez (E.)
c- Te serxwoş û ebter kirim
Te ji illeta rengzer kirim
Te sotim û ker ker kirim
Tev agir û biryan im ez (Zinar)
16. a- Me’neya daxan ku hilda (A.)
b- Ah û efxanê me hilda (E.)
c- Me’niya daxa ku hilda (Zinar)
17. Ew kitab naçit du cilda (A.)
18. Hafizî xetxan im ez (E.)
19. a- Hafizê medh û pesendan (A.)
b- Hafiz û mehd û pesindan (Zinar)

13.

Sotime qet pêt û nar ne
Kuştime derb lê diyar ne
Min demek sebr û qirar ne
Nexweşê pirr jan im ez

14.

Nexweşê reng lê nemayî
Dest li ser falê nihayî
Wan digot j'çavan gihayî
Kuştiyê 'eynan im ez [20]

15.

Kuştime herdu 'uyûnan
Yengiyên nîsbet ji nûnan [21]
Radikin ew qetl û xûnan [22]
Girtiyê zindan im ez

16.

Girtî me insaf di mîr ne [23]
Qazî û miftî û feqîr ne [24]
Qeyd kirim kes pê xebîr ne [25]
Bendeyê hicran im ez

---

20. Wan digot ji çavî gihayî (A.)
21. a- Yakiyêt nisbet ji nûnan (A.)
    b- Yengiyêt nisbet ji nûnan (Zinar)
22. Radikit ew qetl û qûtan (A.)
23. Girtî me insaf dimir ne (F.)
24. Qazî û miftî vebîr ne (A.)
25. Qeyd kirim kes pê xebîr ne (A.)

17.
Ma di benda firqeta te
Canfedayê xidmeta te
Da bibînim rehmeta te
Nobedarê xan im ez [26]

18.
Nobedarê qullehê xwe
Dergevanê dergehê xwe
Bîne bîr û agehê xwe
Tûleyê asîtan im ez

19.
Tûleyê dergehê yar im
Şev û rojan nobedar im
Westayê der intîzar im
Çavriyê siltan im ez

20.
Çavriyê sîrra li pêş im [27]
Meqseda ez lê viyêşim
Hicreta Yûsif dikêşim
Ye'qûbê Ken'an im ez

---

26. a- Nobedarê xan im ez (A.)
b- Newbedarê Xan im ez (Zinar)
27. Meqseda ez lê finêşim (A.)

21.
Kore bû Ye'qûb ji dinê
J'perdeya daxa evînê
Ger dibîn veke birînê
Hewceyî Loqman im ez

22.
Wan digot Loqman tebîb e
Gote min xef 'indelîb e
Şafiyê derdan hebîb e
Bêbawer û îman im ez [28]

23.
Sond dixwim b'şahid û dostan [29]
Kevir û seylên li bestan
Min bi xwe l'cerhan bi bestan [30]
Bêrahet û asan im ez [31]

24.
Aşiqan rahet ya kêm e [32]
Agir û pêta dilê me
Çend hizar medhan dibême
Muhîtê esman im ez [33]

---

28. a- Bi bawer û îman im ez (F.)
b- Pê bawer û îman im ez (Zinar)
29. a- .... said û destan (A.)
b- Sond dixwim said û destan (Zinar)
30. a- Min bixwin li curhan bi bestan
b- Min bi xwe li cerhan bi bestan (Zinar)
31. Bi rahet û asan im ez
32. a- .... yekê me
b- Aşiqan rahetî ya kêm e (Zinar)
33. Muhîtê isman im ez

25.
Xwezî min sed ser hebana
Sed hizar dev pêve bana
Ew hemû l'medhê te bana [34]
Hêj bi wan noqsan im ez

26.
Ez kiz û zer bûm ji qehrê [35]
Dê devek çi b'kit ji behrê [36]
Yan du çav çi b'kin li sehrê [37]
Li dîtina 'eynan im ez [38]

27.
Sed hizar çav min divîna
Bayekî perde hilîna
Xet û xal min têr bidîna
Işq û qûtê can im ez

---

34. a- ....hebûna
......................pê vebûna
..........................tê bûna (A.)
b- Xwezî min sed ser hebûna
Sed hezar dev pêve bûna
Ew hemû l'medhê te bûna (Zinar)
35. a- Ez ker bûm, zer bûm ji qehrê (B.)
b- Ez gezozer bûm ji qehrê (Zinar)
36. Dê devik çi bikit ji behrê (Zinar)
37. a- ....ji sehrê (A.)
38. Bê dîtina eynan im ez (A.)

28.
Her kesê işq tê eser kit
Sed hizar perdan di ber kit
Hemûwan dê ker bi ker kit
Taziyê 'uryan im ez

29.
Perde çû ez mame tazî
Dil sera mehbûb dixwazî [39]
Min 'îbadet işq û bazî
Bê mey û meyxan im ez [40]

30.
Xaneya bade û mey tê [41]
Muxnî û hem çeng û ney tê [42]
Min ji eşqa heyahey tê [43]
Serxweş û sukran im ez

---

39. Dil sira mehbûb dixwazî (A.)
40. Bi mey û meyxan im ez (A.)
41. Xaniya badey û mey tê (A.)
42. Mexnî û hem çeng û ney tê (A.)
43. a- Min ji işqan heyehey tê (A.)
b- Min ji işqan heyehey te (Zinar)

31.
Serxweşê ava heyatê
Meclisa reqs û sema tê
Dê çikim b'sewm û selatê
Bi kûze û fincan im ez

32.
Ew meyê gerden dirêjan
Şîşe û wan baderêjan
Min nema hiş li nivêjan
Li deftera dînan im ez

33.
"Mîm û Hê" aqil ve der da
Sicleya işqê û derda
Lew qelem anî bi ser da
Me'fûyê xufran im ez [44]

44. Me'fuwê xufran im ez (Zinar)

Bi Çar Kerîman

1.
B' çar kerîman dînmuhkem în [1]
Bê wech û sûret adem în
D' kenza qidem da qidem în
Ev mesele rast li we tê

2.
Rast e qewî ev mesela
Eslê qisan d'zanî mela
Hîna ku bû qal û bela
Ma hûn nebûn di hizretê

3.
Di hizretê ma hûn nebûn
Di xilweta baxwê xwe bûn [2]
Li hatinê d'araste bûn [3]
Heta vî roja axretê [4]

---

1. Be çar kerîman dên muhkem in (A.)
2. Di xizmeta baxuy xo bûn (A.)
3. Le hatnê de azaste bûn (A.)
4. Heta ve roja axretê

4.
Heta heyîn em maîl în
Hişyar bibîn ey xafilîn
Em ji heyatê dest hilîn [5]
Ji we'deya emanetê

5.
Barî emanet wî li we [6]
Nakim siyaset wî li we
Ferz û kifayet wî li we
Heşr û beyana kaxetê

6.
Barî emanet nas bikin
Ew xwar dibit hûn ras bikin [7]
Xwe rû sipî û xilas bikin
Pêşîmanên qiyametê

7.
Ew "Mîm û Hê" qelb û mitalan
Her bi wan fikr û xiyalan
Rast dikit pend û misalan [8]
Şairê nesîhetê *

---

5. Em dê ji heyatê dest hilîn (A.)
6. Barê emanet wî li we
Nakim siyaset wê li we (A.)
7. Er xwar dibit hûn rast biken (A.)
8. Rast dikin pend û mîsalan (A.)
* A. Yûsif nivîsiye ku: "Hindek ji pêşiya vê şi're wenda bûye. Di nav wê destnivîsê de nemaye."

Îro Girya Me Tê

1.
Îro werin lêzim werin [1]
Cîran û xelkê Hêşetê
Hûn rayekê li min bikin
Îro qewî girya me tê

2.
Îro qewî j'mi tê girîn [2]
Sosin li mêrgan xeyirîn
Sed heyfa lêvê şekirîn
Êdî venaxun şerbetê

3.
Lêvên di le'lîn û şeker [3]
Kêm bûn ji wan durr û xeber
Sed ah û kovan û keser
Heyf eyn û lam çûn hicretê

---

1. Dê hûn werin lêzim werin-Doskî
2. Îro qewî min têt girî
   Sosin li mêrga xeyirî
   Sed heyf ji lêva şekirî
   Êdî venaxun şerbetê-Doskî
3. Ew lêvêt le'lîn û şeker -Doskî

4.
Heyf eyn û lam bûne cuda [4]
Şîn û girîn dîsa te da
Em razîne b'emrê Xuda
Herçî ji dergahê te tê

5.
Herçî dikit ew mîr dikit [5]
Xêr û şeran teqdîr dikit
Daxan li qelban pir dikit
Sohtim bi narê firqetê

6.
Sotim bi nar û agirî
Vê faniyê em j'ev kirî
Hetta xweş in em dê girî [6]
Dost çû ye çerxa adetê [7]

---

4. Heyf eyn û lam jêk bûn cuda
Huzn û girî dîsta te da-Doskî
5. Ev malke di pirtûka Zinar de ya kêm e; peyva "pir" tê de nîn e. Lê me ev peyv êxiste nav helbestê ku awayê wê serasttir bibe.
6. Ev malke di pirtûka Zinar de kêm e. Peyva "em dê girî" nehatiye.
7. Dost çû bi çerxa adetê re bibe.

7.
Eman adet bê eman e [8]
Wan melek mehbûb revan e
Can di nêv axê nihan e
Ê felek bê mirwetê

8.
Ey felekê bê wefa yê [9]
Te çira muhlet nedayê
Yar di nêv axê gihayê
Ey felek bê mirwetê

9.
Ey felekê bê î'tîbar [10]
Min bi te nîn in qet çu car
Nê te gelek mehbûb veşar
Paşî ewan xal û xetê

10.
Nazik û mehbûb ciwanik [11]
Qamet û bejna ziravik
"Kullu şey'în" dê bin halik
Ji xeyrî Şahê Qudretê

---

8. a- Ew adeta çerxa ewan
   Carek me dî mehbûb rewan
   Wî dost di nav axê nihan
   Ey felekê bê mirwetê-Doskî
   b- Di malka çarê de peyvên
   "bê mirwetê" di pirtûka Zinar de kêm in.
9. Ev çarmalke di nivîsa Doskî de nîn in.
10. Ev çarmalkiye di pirtûka Zinar de nebûn.
11. Ev çar malke di nivîsa Doskî de nîn e.

11.
Her bi can xeyrî wî nabin [12]
Ew hemî ax û turab in
....
Çûye mala zulmetê

12.
Zulmeta tarî û kûr e
Meqbera nav lê qubûr e
Ji haniyan yanî dûr e*
Qebr e benda firqetê

13.
Meqbera mehbûb di nêve
Min muqîm çav man bi rê ve
Çirra yek nanî ji wê ve
Dîn kirim vê hîkmetê

14.
Min heyf li cotê sorgulan [13]
Zulfê muqîm li ser milan
Danîne nav ax û hilan
Êdî bi kê dim ulfetê

---

12. Ev çarîne di kitêba Dêreşî de wiha ye:
J'i xeyrî wî can dê wefa bin
hemû ax û tû bin
Min bi çavan dî muxabin
Çûne mala zulmetê
Her wisa ev çarîne û herduyên din ku li dû tên di nivîsa Doskî de nîn in.
* J' hayinan yaran û dûr e.
13. Sed heyf bo cotê sorgula
Marê muqîm ket ser mila
Wan bir bi axê wessila
Dê kine dîn bi ulfetê-Doskî

15.
Min heyfa reyhanê di reş [14]
Kan sorgul û werdê di geş
Kêm bûn bi wan bêhnê di xweş
Nîşan û xalê cebhetê

16.
Nîşan û xalê fulfulîn
Min heyf li zulfa kagulîn
Hatin ku em jê dest hilîn
Hêj nagirin em 'îbretê [15]

17.
Paşî wan xal û nîşanan
Qet nayê bêhna rihanan
Ji mihnetê êş û janan
Tên ji narê firqetê [16]

---

14. Sed heyf li reyhanê di reş
Kêm bûn ji wan bihnên di xweş
Nîşan û xalê cebhetê-Doskî
15. a- Nîşan û xalê xulxulî
Sed heyf li zulfa gulgulî
Hatin ku vî dostî hilî
Hêj nagirin j'vê îbretê-Doskî
b- Bi gotina Doskî di destnivîsa Yûsifî de malika dû wê
"Min heyf li zulfa kakulî" ye.
c- Her dîsa bi gotina Doskî di destnivîsa Yûsifî de heta vêrê ev helbest heye.
16. Paşî wan xal û nîşanan
Qet nema bihn kem reyhanan
J'mextûm û nîşan û janan
Tîrek ji tîra firqetê-Doskî

18.
Firqeta wê her bi derb e
Daîma êşan û kerb e
Ê ku dî zanî çi derb e
Min ji xewfan xew netê [17]

19.
Min şevan xew lê tunîne
Bager û êşan nihîn e
Daîma têtin girîne
Mam li ser kes ew netê [18]

20.
Tîrekê dijwar fîraq e
Her kesê dî ev fîraqe
Mihnet û dax û hîraq e
D' qeyd û bend û mihnetê [19]

---

17. Ev fîraq tîrek bi zerb e
E ku dî ev dax û derbe
Dîma qeyd mextûm û kerb e
Bi şev o roja xew netê-Doskî
18. Şêv û roja xew lê nîn e
Daîma şîn û girîn e
Agir û pêt û nihîn e
Ma b'serê kesê ev netê-Doskî
19. Ev çarmalkiye di pirtûka Zinar de nîn e.

21.
Gumbeda tarî sitar e
Meqbera dost lê veşare
Te l'min heram kir bihar e
Çîçek û bêhn j'dûrî te tê [20]

22.
Qet nema bêhn kem çi werda
Çîçek û bîhnxoş li erda
Paşî me mehbûb ku b'derda
Çîmena kê j'dora netê [21]

23.
Çîçeka kanî û av lê
Sosina daîm xunav lê
....
Dê temam kim suhbetê

24.
"Mîm û Hê" şairkî pak e
Herkesê b'ruh bû ji make
Hemiyan dê ew fena ke
Ew jî Şahê Qudretê.

---

20. Kunbeta............................
Meqbera tê da ku yar e
Te li min hermandî par e
Çîçeka ji destan ketê (Zinar)
21. a- Ev çarmalkiye di pirtûka Zinar de nîn e.
b- Heta vê çarmalkiyê di nivîsa Doskî de heye.
Ji vir û pê de nîn e.

Feqe û Bilbil

1.
Bilbil dibê awazan
Xirab carek xweya kir [1]
Bes bike şi'r û sazan [2]
Ateş li min te rakir
Çend didî fir û bazan [3]
J'te ra nîn in çu agir [4]

2.
J'te ra nîn in çu pêt e [5]
Çewa tu pir 'ezab î [6]
Daîm dengê te tête
Saetek hêdî nabî [7]
Muqîm te yek divête [8]
Kifş e tu halxirab î [9]

1- Xweş dikî derdan tu yî
1. a- Xerab carek te rakir (M.)
   b- Xerab carek xwiya kir (Zinar)
2. Bes bêje şi'r û sazan (Zinar)
3. a- Çendî di fer û bazan (A.)
   b- Tu mede fir û bazan (Zinar)
4. a- Ji te ra nîn e çu agir (M.)
   b- Te ra nîn e çu agir (Zinar)
5. Te ra nîn e çu pê te (Zinar)
6. Tu çawan bi 'ezab î (M.)
7. Kifş e tu halxerab î (Zinar)
8. Yeqîn te yek divête (Zinar)
9. Saetek hedî nabî (Zinar)
   Diyar e ku di vir de rêzikan cih guhartiye.

3.
Ez dê çima hêdî bim [10]
Em pur dibîn biharan [11]
Mecrûhek bêtebîb im
Di nav leyl û neharan [12]
Ji dosta xwe xerîb im
Zêde ji ‘işqa yaran [13]

4.
Kesê ku girtî yar e[14]
Bi dil yekê d'hebînî
Êdî nayê qerar e
Dê daîma bixwînî
Xiyal û xem di dar e [15]
Divê kengî bibînî [16]

---

10. a- Bulbul dibê em hêdî nabin
Em pir dibin biharan
Mecrûhek bêtebîb in (A.)
b- Bulbul.................. (Zinar)
11. Dûr dibînim buharan (Zinar)
12. Di van leyl û neharan (Zinar)
13. Ji işqa hindî yaran (Zinar)
14. Kesê ku girtî yarek
Bi dil yekê piristî (Zinar)
15. Xiyal û xem diyar e (A.)
16. Dê tu kengê bibînî

5.

Kesê bi işq û muhbet [17]
Bi dil yekê peristî
Daim dê bête xizmet [18]
Bi rastî û dirustî
Muqîm dê çav li rê bet [19]
Lew şev û roj nawestî [20]

6.

Er bi şev er bi roj im [21]
Ez murxê nav hezar e [22]
Bi dil xwoşiyê doj im [23]
Têk bûme pêt û nar e [24]
J'huba gulan disojim [25]
Lew min nayê qerar e [26]

---

17. a- Kesê ku işq û muhbet (M.)
  b- Ev şeşmalke di pirtûka Zinar de ber çav neket.
18. Daîm dibête xidmet (A.)
19. Muqîm di çav li rê bit (A.)
20. Lew şev û roj newestî (M.)
21. a- Her şev û her rojan (A.)
  b- Her şev û her roje (M.)
  c- Bi şev eger bi roj im (Zinar)
22. a- Ey murxê nam hezar e (A.)
  b- Ey murxê na hewar e (M.)
  c- Ez murxê nîvhezar e (Zinar)
23. a- Vê terfê şubhê dojê (A.)
  b- Vê girê şubhê dojê (M.)
  c- Bi dil xwe şubhê doj im (Zinar)
24. Têkel bibit û nar e (A. û M.)
25. Ji huba gulê disoje (A. û M.)
26. a- Min lew naêt qerare
  b- Mi lew nayêt qerare (Zinar)

7.

Feqî j'bilbil ra gohtî [27]
Tu j'vê sirê çi zanî [28]
Ewa tu j'pêş ve sohtî [29]
Fida bike tu canî [30]
Ew xezala te pohtî [31]
Tewhîd e bê me'anî [32]

8.

Tewhîd e 'ilmê hal e [33]
'Arif dikin tefsîrî [34]
Miradek e li bal e [35]
Bi "mîn ledun" xebîr î [36]
Nizam te kî xiyal e
Tu b'kîjanî dilgîr î [37]

---

27. a- Feqî we gote bulbul (A.)
b- Feqî dibêje bulbul
Tu meqsedê nizanî (Zinar)
28. Eva te j'pêş ve sotî
Fida ke rih û canî
Ew xezala te gotî
Tewhîd e pir meanî (Zinar)
29. Awaz tu pişt ve sohtî (A.)
30. Fida bike tu canî (M.)
31. Ew xezala te gotî (A.)
32. Tewhîd e pir meanî (Zinar)
33. Tewhîd ji ilmê hal e (Zinar)
34. Alim dikin tefsîrê (Zinar)
35. Meyla te wê li bal e (Zinar)
36. Bi mil didit xebîrê (Zinar)
37. Tu bigrê dilbigirê (Zinar)

9.

Bilbil dibê bi zar e [38]
Daxa di dil rehistin [39]
Kamil bûye bihar e [40]
Ahek ji gul ra hiştin [41]
Bişkiftî belgê dar e
Heram bûye nivistin

10.

Nivistin l'min heram in [42]
Daîm dixulxulim ez
Ji werdan hal geha min
Bi ismê bilbil im ez
Evînî qaf û lam in [43]
Muqîm ku dilkul im ez

---

38. Bulbul dibê îzhar e (M.)
39. a- Sal û di meh ku hatin (A.)
    b- Salê di meh guhestin (M.)
    c- Me hêdî sal gehiştî (Zinar)
40. Kamil dibû bihare (Zinar)
41. a- Di baxan gul rehistin (M.)
    b- Daxek ji gul re hiştin (A.)
    c- Li baxan gul rawestî (Zinar)
42. a- Nivistin li min heram bû (A.)
    b- Nivişt li min heram in
    Daîm dixulxulim ez
    Ji derdan hal geha min
    Bi mislê bulbul im ez
    Evînê kaf û lam in
    Muqîm bi dil im ez (Zinar)
43. Evînî qaf û lam e (A.)

11.
Serdarê dilkulan im
Ji êş û jan û daxan [44]
Ji terhê sunbulan im [45]
Dixwînim lew di baxan[46]
Aşiqê sorgulan im
Dê lê bigrim qişleyan [47]

12.
Feqî go bilbil taze [48]
Tu bilbilek sewda yî
'Işqa gulê mecaz e
Tu yarek bê wefa yî [49]
Dostê ebed bixwaze [50]
Da lê nebit fenayî [51]

---

44. a- Serdarê sorgulan im
Ji êş û nûn û daxan (A.)
b- Bi êş û jan daxan (Zinar)
45. a- Bi serhê sunbulan im (A.)
b- Ji terhê sunbulan im (Zinar)
46. Dixwînim xweş li baxan (Zinar)
47. a- Dê lê bigirim aşiqan (A.)
b- Lew digrî qijlaxan
48. a- Feqî we gote bilbil (A.)
b- Ev şeşmalke di pirtûka Zinar de wiha hatiye:
Feqî dibêje bilbil:
Tu bulbulek sewda yî
Işqê gulê mecaz e
Gul yarek bêweta yî
Dostek ebed bixwaze
Qet lê nebit fenayî (Zinar)
49. Ew yarek bêwefaî (A.)
50. Dosta ebed bixwaze
51. Da nebêtin fenayî (A.)

13.
'Işqa mecaz tu terk ke [52]
Ew sir û dîn betal bûn [53]
Tu yarekê heder ke
Li min bê ilm û xeyb bûn [54]
Carek li wî nezer ke
Ebed heye her hebûn [55]

14.
Işqa mecaz hilîne
Ev reng dibê betal bit
Tu bes wiha bixwîne
Te ber bi zî celat bit
Dostek ebed bibîne
Daîmê bêzewal bit

---

52. Işqa mecaz tu terke (M.)
53. Ew sir dinê betal bê (M.)
54. Alim bê bi ilmê xeybê (M.)
55. a- Her heye û dê her hebe
    b- işqa mecaz tu terke
    Ev sormecalî pey bî
    Tu yarê wiha der ke
    Alim bî ilmê xeybî
    Tu carek lê nezer ke
    Daîm ebed her hey bî (Zinar)

15.
Bilbil dîsa xeber da
Qismet cara ewel bû
'Aşiq bûme li werda
Maşûqa min sorgul bû
Dikêşim jan û derda [56]
Lew min birîn di kul bû [57]

16.
Ji werdan ez bi êş im
Di xafil im sehergah [58]
Mulaziman meykêş im [59]
Gişt exleban dernimah [60]
Daîm ez wê li pêş im [61]
Dixwînim gah û bêgah [62]

---

56. a- Lewra dikêşim derda
Ku min birîn di dil bû (A.)
b- Ev lew dikêşim derda (Zinar)
57. Birîna min her gul bû (Zinar)
58. Lew dixwînim daîman (M.)
59. Mala zimanî dikêşim (A.)
60. Exleb di hemî gavan (M.)
Gişt exleban derîn mah
61. Daîm ezê li pêş im (M.)
62. a- Dixwînim gah bi gahan (M.)
b- Ev şeşmalka di pirtûka Zinar de lengîn e, wiha ye:
Ji werdan ez bi êş im
..............................ez
Mulaziman dikêşim
Kuştiyê .... ez
....
....

17.
Feqî we gote bilbil [63]
Murxê fehm be'îd e
Te zû bi der da aqil [64]
Xiyal nayê tewhîde
Padîşahê kul û mil [65]
Tu muhbetê bi wî de

18.
Her kesê ew nenasî [66]
Maye di xefletê da
Digel kor û qiyasî [67]
Ebed di zulmetê da
"Fe yu'xez bînnewasî"
Melûl e d'hîretê da [68]

---

63. Feqî dibêje bilbil
Ey murxefehm bêîd e
Te xweş bi derdan eqil
Xiyal numa tewhîd e
Paşayê....................
Tu muhbetê bi wî de (Zinar)
64. Ê mehrûqê bexîd e
Te zû bi derda aqiy (A.)
65. Ew padişahê merda
66. Kesê ku heq nenasî (Zinar)
67. Gerya ye kor û asî (Zinar)
68. Melûl di heyretê da (Zinar)

19.
Ya heq tu fê'lan çêke [69]
Me dûr ke j''asiyatan
Şefqê li "Mîm û Hê" ke
Bi litf û hem bi îhsan
Ava rehmê tu lê ke
Lewra ku tu yî xufran [70]

20.
Em dê biçîn j'oldaş e
Navê mê dê bimîne
Umrê me çû belaş e
Çu feyde me nedîne
Ger qewlê me bibêjî
Fatîhe j'bo me bixwîne [71]

---

69. Ev şeşmalkên dawiyê di pirtûka Zinar de nîn in
70. a- Lewra ku tu xefar î (A.)
b- Ev şeşmalkên jêrî di Dîwana Feqiyê Teyran de hebûn:
Ya heq filat tu çêke
Me bikirin ser isyanê
Şefqê li "Mîm û Hê" ke
Bi edlê û îhsanê
Ava rehmê tu lê ke
Lewra ku tu xufran î.
71.Ev benda tenê li bal Prof. Celîlê Celîl de hatiye. Dûr nîne ev benda piştî Feqî bi ser de hatibe zêdekirin. *(Jêrenota Weşanger)*

Dilber

1.
Ey dilbera gerdenzerî [1]
Way nazika dêmqemerî [2]
Qamet ji mûma fenerî [3]
Wêran ez im, malim xirab

2.
Ew dilbera gerdenletîf
Way nazika qametelîf [4]
Qamet ji reyhana xefîf [5]
Wêran ez im malim xirab

---

1. Ey dilberê ey dilberê (Zinar)
2. Wê nazika dêmqemerê (Zinar)
3. Qamet ji mûm û fenerê (Zinar)
4. Wey nazika qametelîf (Zinar)
5. Qamet ji reyhanzerîf (Zinar)

3.
Ey dilbera gerdenzucac [6]
Way nazika mislê zucac
Qamet ji reyhana qirac [7]
Wêran ez im malim xirab

4.
Ey dilbera qametmîsal [8]
Way nazika dil î hejar [9]
Te j'xandinê kirim betaî [10]
Wêran ez im malim xirab

5.
Ey dilberê wey dilberê [11]
Feryad ji destê keserê [12]
Avek ji ava kewserê [13]
Wêran ez im malim xirab

---

6. Ey dilbera gerden ji 'ac (Zinar)
7. Qamet ji reyhana mizac (Zinar)
8. Ey dilbera qelemmîsal (Zinar)
9. Wey nazika dêmîşepal (Zinar)
10. Işq û mihebet min li bal (Zinar)
11. Ey dilbera dêmî zerê (Zinar)
12. Feryad ji destê kederê (Zinar)
13. Cûrek ji ava kewserê (Zinar)

6.
Ey dilbera gerdenzirav [14]
Dêmşûşeya tijî gulav
Ey duxtera bejna zirav [15]
Wêran ez im malim xirab

7.
Çavan ku hiltînî b'mest e [16]
Ew çend ya misrî bi dest e
Li kuştina min te bi qest e
Wêran ez im malim xirab

8.
Tu bi qesta min dikujî [17]
Tu bi kifra dil nasojî
Gelek sotim kirim rijî
Wêran ez im malim xirab

---

14. Ey dilbera bejinzirav (Zinar)
15. Wey esmera tilîzirav (Zinar)
16. Ev çarmalkiye di pirtûka Zinar de nîn in.
17. a- Ev çarmlke di pirtûka Zinar de nîn in.
b- Ev çarmalkiye di pirtûka Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî* rp. 77. de bi tenê hatiye. Li ser vê guherînê Qanatê Kurdo dibêje: "Eva helbesta Peqê Teyran 'Dilber' berê pêşîn li kitêba S. Movseyan de ya bi navê Zimanê Kurmancî (kin) li sala 1935 li Êrîvanê çap bûye. Min ew ji wê kitêbê wergirtiye, çimkî bi fikra min ew aslî ji destnivîsara Feqiyê Teyran hatiye wergirtinê. Min ber li wê da rêzên benda 8. guhastine, di kitêba S. Movseyan de ew rêz bi vî cureyî hatibûne çapkirinê:
Ew be qesta min bikujî
Ew kafira dil nasojî
Gelek sotim kirim rijî
Wêran ez im malim xirab "

9.
Subhan ji Şahê Zulcelal [18]
Way nazika sahibcemal
Ji xwendinê kirim betal
Wêran ez im malim xirab

10.
Subhan ji Şahê bi tenê
Xalik li xala gerdenê
Ez dîn kirim berdam dinê
Wêran ez im malim xirab

11.
Sotim biraştim bêhesab [19]
Lê pirsî bo kirme kebab
Kirye bi min sed reng ‘ezab
Wêran ez im malim xirab

12.
Gelek sotim kirim kibab
Kirye bi min sed reng xirab
“Ya leytenî kuntu turab” [20]
Wêran ez im malim xirab

18. Ev çarmalkiya di pirtûka Qanatê Kurdo de nîn e.
19. Ev çarmalkiya û yên li dû tên heta 16ê di pirtûka Zinar de nebûn.
20. Wateya vê rêza erebî “Xwezî ez bibûma ax” e.

13.
"Ya leytenî kuntu" vexûr
Wey nazika min te ji dûr
Bêhiş kirim zilfê di hûr
Wêran ez im malim xirab

14.
Bêhiş kirim zilfê di reş
Biskê siyah, bihnê di xweş
Ey duxterê çapik bimeş
Wêran ez im malim xirab

15.
Bêkêf kirim zilfê di reş [21]
Biskê siyah, zilfêd qemer
Eşq û muhbeta min li ser
Wêran ez im malim xirab

16.
Eşa mecaz peyda bûye
Îro li min dijwar bûye
Hîvî dikim heqîqî ye
Wêran ez im malim xirab

---

21. Bêhiş kirim xalê di qer (S)

Feqe û Mela

Feqe:
Selama min heqîrê [1]
Sedefek di vê tê kin [2]
îroke li Cizîrê [3]
Heq e ku li Melê kin [4]
Hilak in j'derba tîrê [5]
Derman divê ku lê kin [6]

---

1. Suala min heqîrî (Hej. S.)
2. Sedefek tivê têkin (Hej. V. S.)
3. a- Îroke di Cizîrê (A.S.V.)
   b- Îro li Cizîrê (T.M.)
4. a- Heqe li Melê kin (V.)
   b- Heqe ku li Melê ken (H.)
5. a- Ku derba tîrê (S.F.)
   b- Hilak ji derba têrê (Hej.)
   c- Hilakî ji derba tîrê (B.)
6. a- Derman heye lê kin (S.V.)
   b- Çi derman heye lê kin (Hej.)
   c- Derman divêt ku lê kin (M.A.)

Mela:
Selamên milyaketan [7]
Bê hedd û bê hisêb in
Şubhetê avên şetan [8]
Ji Mela l'"Mîm û Hê" bin [9]
Hilak in ji zehmetan [10]
Derman ji "Lam û Bê" bin. [11]

---

7. a- Selamên melaîketan (M.H.B.)
   b- Silamêt meaîketan (A.)
8. a- Şubhetên avên şetan (Hej.)
   b- Biqedrê avên şetan (A.T.)
   c- Qeder avên şetan (M.)
   d- Şubheetî avêt şetan (H.)
   e- Şubhetî avên sinanan (B.)
9. a- Ji min ra li "Mîm û Hê" bin (Ş.)
   b- Ji meran li "Mîm û Hê" bin (A.)
   c- Li me da li "Mîm û Hê" bin (T.M.)
   d- Ji me da li "Mîm û Hê" bin (T.M.)
10. a- Hilakên ji zehmetan (S. Hej.)
    b- Hilakê ji zehmetan (T.M.)
11. Derman "Lam" û "Bê" bin (A.)

Feqî:

Şerbeta "Lam û Bê"yan [12]
Nadim ez wê b'heyatê [13]
Me'dena "Dal û Rê"yan [14]
Dibarînin nebatê
Zahir dikin me'niyan [15]
Ji husna but û latê [16]

---

12. a- Şerbeta "Lam û Be"yan (ş. Hej.)
    b- Şerbeta "Lam û Bî"yanê (A.)
    c- Şerbeta "Lam û Bê"yan- T. M.
13. a- Ez nadim bi heyatê A. T. M. B.
    b- Nadem bi heyatê (H.)
14. a- Me'dena "Dal û Rê"yan (Hej.)
    b- Di me'dena "Dal û Rê"yan (A.) M.
    c- Me'dena dil û rêyan (T.)
    d- Me'dena dalî rêyan (H.)
15. a- Îzhar dikin me'neyan (S. V.)
    b- Zahir diken me'nêyan (T. B.)
    c- Îzhar dikin me'niyan (Hej.)
    d- Îzhar ken me 'neyan (H.)
    e- Zahir diken me'neyan (M. A.)
16. Ji husna but û latan (V. Hej.)

Mela:
Ji neqşê but û latan [17]
Me sîne butxane ye [18]
Te'eyyuna sîfatan [19]
Tecella d'qelbê me ye
Di 'îd û şevberatan [20]
Ji wan ra me secde ye.

17. a- Ji neqşê bute û latan (S. T. M. H.)
    b- Ji neqşê but û latan (V. Hej.)
    c- Ji neqş bit û latan (B.)
18. a- Me sîne bitxane ye (A.)
    b- Sîne butxane ye (M.)
19. a- Te'eyyina sifatan (S. ş.)
    b- Te'yîna wan siftan (A.)
    c- Te'eyyîna van sifatan (H.)
    d- Di eyna sifetan (B.)
20. Îd û şevê beratan (S. V. Hej.)

Feqî:
Secdeya şukrê carek
Me ferz e di wîsalê [21]
Ne perde, bê sitarek [22]
Li ber wechê hîlalê [23]
Ehsenellah tebarek [24]
Ji sira wê cemalê [25]

---

21. a- Ferz e di wîsalê (S. V.)
b- Ferz e di wê wîsalê (B.)
c- Bîne ferzêt wîsalê (A.)
22. a- Ne perde bê ne sitarek (Hej.)
b- Ne perdeyek ne sitarek (A.)
c- Ne perde nê sitarake (B.)
d- Ne perde bîne sitarek (T.M.H.)
23. Li ber wechêt hîlalê (A.)
24. Ehsenellahû tebarek (S. V.)
25. a- Ji sirra wê cemalê (Hej.)
b- Ji husna wê cemalê (A.)

Mela:
Cemala nûrîn saf e
Di wechên tecellayê [26]
Bi herfên xwe kişaf e [27]
Demîr didin me'nayê [28]
"Ha, Mîm, 'Eyn, Sîn Qaf e" [29]
Di remza mu'emmayê [30]

---

26. a- Di wechê tecellayî (Hej. ş.)
    b- Di wechê tecella lê (T.M.H.)
    c- Di wechê tecellaê (B.)
27. Herfên di kişafe (A.)
28. a- Zimîr dirin me'nayê (S. ş. V.)
    b- Zemîr didirin me'na lê (B.)
    c- Zemîr didin me'naê (H. M. H.)
29. a- Hîm û işq e -ş. H.
    b- Ha, Mîm, û 'Eyn, Sîn, Qaf e.
30. a- Remza wê miemmayê (V. S.)
    b- Di remza muemma lê (B.)
    c- Remza wê muemmayê (Hej.)

Feqî:
"Hê"yên di heft hamîman [31]
Nuqteyan lê peyda kin [32]
Bavêne cem du cîman [33]
Işqê jê huweyda kin [34]
Ismên di du "Tasîman" [35]
Du "Mîm"an jê cuda kin [36]

---

31. a- Hi yên heft hamiyan (V. S.)
    b- Hê yet heft hammiyan (H.)
    c- Hêt di heft hamiyan (A.)
    d- Hey yên sifethamiyan- B.
    e- Hêyên.........................Hej.
32. a- Nuqtan lê peyda kin (V. A. S.)
    b- Nuqteyan lê peyda ken (T. M. H.)
    c- Nuqteya lê peyda ken (B.)
33. a- Pavê ne ser cem cîman (A.)
    b- Pavêne cem cîman (V. J.)
    c- Bavên cem du cîman (T. M. B.)
34. a- işqê jê peyda kin V. S. A.
    b- Işqê ku jê peyda ken- T. M.
35. a- Ismên du tasîman (V. S. ş.)
    b- Ismê di du tasîman (T.)
    c- Ismê du tasîman (M. B.)
    d- Ismêt du satîman (H. A.)
36. a- Mîman jê cuda kin (S. A. V.)
    b- Mîman jê cuda ken- T. M.

Mela:
Heft xum tejî bade [37]
Di meykeda qidemê [38]
Xuma ku min murad e [39]
'Işq rêhte cama Cemê [40]
Lewhê du "Nûn" lê "Sad" e [41]
Lew feyzê da qelemê [42]

---

37. a- Heft xum tijîne bade (Hej.)
    b- Heft xum tijî bade bin (T.)
    c- Heft xumê tejî bade
38. a- Di meykedeya qidemê (B.)
    b- Di meygeda qidemê (S.)
    c- Di meykedeya qedemê (A.)
39. a- Xuma kumey îrade e (S. V.)
    b- Ji xuma ku me îrad e (H.)
    c- Ji xuma ku me azad e (B.)
    d- Xuma ku min ji mirad e (A.)
40. a- Işq rêht cama cemê- S. V. Hej.
    b- Işq rêht cmam cemî (B.)
    c- Işq rête cama cemê (A.)
41. a- Lewhê ku nûn lê sad e (A.)
    b- Lewhê lê nûn û sad e (Hej.)
    c- Lewhê nûn lê du sad e (B.)
    d- Lewhê du nûn sad e (H.)
42. Feyzê jê da iqlîme (A. T. M.)

Feqî:

Saqî ji xemra ezelî [43]
Nûn qelem jê afirand [44]
Darêhte lewha ewelî [45]
Rizq û nesîb pê qediran
Ew bû murada meselê [46]
Neqşê mecaz pê sewirand

---

43. a- Saqiyê xemra ezelî- A. B. H. T. M.
    b- Saqiyê xemra ezel (Hej.)
44. a- Nûr û qelem jê afirand (B. A. ş.)
    b- Nûra qelem jê afirand (T.M.H.)
45. a- Darête lewhê ewelî (A. H.)
    b- Darêt lewha ezlelî-ş. T.
    c- Darêhte lewha ewwel (Hej.)
    d- Darêhte lewhê ezelî (B.)
46. a- Ew murada musehel (Hej.)
    b- Ew bû murada mayilîn (A.)
    c- Ew e murada meselê (B.)
    d- Ev bû murad meselê (H.)
    e- Ew bû murad sailî (T.) M.)

Mela:
Neqşê mecaz tilism e [47]
Mezher ji reng mîr'atê
Sûret li bal me ism e [48]
Me'na bi tecella tê [49]
Herfên di nûrîn cism e [50]
"Kaf Ha" ye di ayatê

---

47. a- Neqşê mecaz telesm e (Hej.)
    b- Neqşê mecazî..................... (B.)
48. a- Sûret le bal ism e (A.)
    b- Sûret li bal min ism e-ş.
    c- Sûret li ba min ism e (T. M. B.)
    d- Sûret li balê ism e (H.)
49. a- "Misemma"ye tecellatê (A.)
    b- "musemma" ye tecellatê-ş. T. M.
    c- Me'neya tecellatê (B.)
    d- Me'neya tecellatê (H.)
    e- "Musemma" ye di mecellayê (Hej.)
50. Herfên nûrîn cism e (S. V.)

Feqî:
"Kaf Ha" ismê kûr e*
Tuxra ye di tenzîlê
Cisim wî "Kohî Tûr" e [51]
Îcmal e di tefsîlê [52]
Cemal ji 'eynî nûr e [53]
Kewkeb e di qendîlê [54]

---

* Kaf Ha ye ismê kûr e (S.)
51. a- Cismê xwo Koh Tûr e (A.)
    b- Bi cisim Koh Tûr e (M.)
    c- Cisim wek Kohê Tûr e (Hej.)
52. a- Di me'nayî te'wîlî (A.)
    b- Di me'na û te'wîlê (T. M.)
53. a- Cemal e eynî nûr e (Hej.)
    b- Cemal eynî nûr e (S. V.)
    c- Cemala eynê nûr e (T. M.)
    d- Cemal ji eynê nûr e (T. M.)
54. a- Kewkeb me di qendîlê (V. S. Hej.)
    b- Kewkeb di qendîlê- (T. M. A. B. H.)

Mela:
Kewkeb e dêmbeşer e [55]
Nûrek e munezzeh tê [56]
Çi husnek misewer e
Ismek e ji Allah tê [57]
Yeqîn bi xwe mezher e
Çerxek e sed xergeh tê [58]

---

55. Kewkeb di bêm beşer e (V. S. Hej.)
    b- Kewkeb dêm beser e (A. T. M. B.)
56. a- Nûrek munezzeh tê (S. V.)
    b- Nûra munezzeh tê (T. M.)
57. a- Remzek ji min ellah tê (Hej.)
    b- Ismek di bên Ellah tê (B.)
    c- Ismek jîn Ellah tê (H.)
58. a- Çerxek sed xergah tê (A.)
    b- Cerxe sed xergah tê (S. V.)
    c- Cerxeke sed xergeh tê (V.)

Feqî:

Xergeh bi min hicab e
Star dikit cemalê [59]
Ewrê reş û niqab e [60]
Nedî dikit hilalê [61]
Perwane lew b''ezab e [62]
Mehbûb e ji şemalê [63]

---

59. a- Sitar diket cimîl (A.)
b- Sitar di ket şemalê-ş.
c- Sitar ti ket şemalê (B.)
d- Sitar ti ket şemalê (H.)

60. a- Evrê reş û nîqab e (Hej.)
b- Evrê reş xwo nîqab e-ş. A.
c- Ewrê xwo reş nîqab e (T. M.)
d- Ewrê reşê nîqab e (B. H.)

61. a- Li ber wechê hilalî- S. V. Hej.
b- Ne diket ji hilalê (T. M.)
c- Ne dê kêm ji hilalê (M. B.)
d- Ne dî kêm ji hilalê (H.)
e- Ne dê diket ji hilalê (A.)

62. Perwane lew di ezab e (S. V. Hej.)

63. Mehcure ji şemalê (A.)

Mela:

Şemla j''eynî nûr e [64]
Şewq li ber sitar tê [65]
Perwane bê destûr e
Di çerxê semadar tê [66]
Heyran sirra xefûr e
Lew canfidayî yar tê [67]

---

64. a- Şemal ji eynê nûr e (A. T.)
 b- Şemal eynê nûr e (S. V.)
 c- Şemala ji eynê nûr e- B. M.
65. a- Şewq ku lê sitar tê (A. ş.)
 b- Şefeq ku lê sitar tê- T. M. B.
66. a- Li çerxê semadar tê- T. M. B. A.
 b- Di çerxa semadar tê (H.)
67. Lew can fidayê yar tê (T. M. B.)

Feqî:
Yarê heqîqî Xaliq e [68]
Çûn canfidayî vêkevin [69]
Rast û dirist û sadiq e [70]
Çi reng bi şûna rê kevin [71]
Qenc û letîf û laiq e [72]
D' baxê "îrem" da vêkevin [73]

---

68. a- Yarê heqîqet xaliq e (S. V. A.)
    b- Yar heqîqet xaliq e (Hej.)
69. a- Cin canfida da vî kevî (A. ş.)
    b- Cin can fidayî vêkevin (Hej.)
    c- Çin canfida da vêkevin- M. B. T.
    d- Da çin canfida vêkevin (A. ş.)
70. a- Rast e û dirist e û sadiq e- A. ş.
    b- Rê dirist e û sadiq e (Hej.)
    c- Rast e emînê sadiq e (H.)
71. a- Çe reng fiş û nevî kewîn (A. B. T. M.)
    b- Çi reng şunarî kewîn (Hej.)
72. a- Qence û letîf e û laîq e (S. V. B.)
    b- Qenc letîf û laîq e (Hej.)
    c- Qenc e û letîf e laîq e (H.)
73. a- Baxê Îrem da vêkevin (A.)
    b- Er ti vê baxê kewîn (Hej.)
    c- Di baxê Îrem da kevin (H.)

Mela:
Baxê ji nûr wereq lê [74]
Yar di wê de zuhûr bit [75]
Spêdeyî şefeq lê [76]
Mezher ji 'eynê nûr bit
Pertew ji husnê heq lê [77]
Da 'eksê bêqisûr bit [78]

---

74. Baxê ji nû wereq lê-ş. (H. T. M.)
75. a- Yar dê zihûr bit (S. V.)
    b- Yar dê di wê zuhûr bit (H.)
    c- Yar dê li wê zihûr bit (A.)
76. a- Spêdeya şefeq lê (A.)
    b- Di spêdeê şefeq lê (H.)
    c- Di spêdeya şefeq lê (B.)
77. a- Pirtû ji husna heq lê (H.)
    b- Purtew ji husna heq lê (Hej.)
    c- Pertew ji husna heq bit (B.)
78. a- Da eksê bêqisûr bit (A. T. V. B.)
    b- Da eksî bêqisûr bit (Hej.)

Feqî:
'Eksê ji heq dibînin [79]
Li dor wechê mehbûban [80]
Li halekî namînin [81]
Li surra wan metlûban [82]
Geh d'nalin geh dixwînin [83]
Dûr in ji wesla xûban [84]

---

79. a- 'Eks ji heq te bînin (B.)
 b- Eks ji heq da bînin (H.)
80. a- Le wechên te mehbûban (A.)
 b- Li wechên di mehbûban (B. M. T.)
 c- Wechên mehbûban (H.)
81. a- Li halek em namînin (A. T. M.)
 b- Li halekî emnamînin (B.)
82. a- Sura wan metluban (S. Hej.)
 b- Ji sira wan metlûban (A.)
83. a- Geh dinalin û geh dixwînin (S.)
 b- Geh dinalin geh dixunin (A. H B. T. M.)
84. a- Dûr in ji wesla xuban (A.)
 b- Dûr in ji wesla xoban (S. Hej.)

Mela:
Feryad ji dest firaqê [85]
Di dûr in ji sultanan [86]
Tîrên j'lewnê beraqê [87]
Heybet ji surra xanan [88]
Roj hatiye şiraqê [89]
Lew dimirin j'kovanan [90]

---

85. a- Feryad ji dest firaqetê (H. A.)
b- Feryad ji destê firqetê-
T. M. B. H. (ya destnivîs)
86. a- Dûr in ji sultanan (S. V.)
b- Ti dûr in ji sultanan (B.)
87. a- Tîj in lewnê berqê S. Hej.
b- Tîr e ji rengê berqê (A.)
c- Tîj e ji lewnê berqê (B.)
d- Tîj ji lewnê berqê (T. M.
e- Tîj in ji lewnê berqê (H.)
88. a- Roj e hatiye şerqê (A.)
b- Roj aniye işareqê (Hej.)
c- Rojhatiye şerqî (T. M. B.)
d- Roj me hatiye şerqê (H.)
89. ....
90. a- Dinalîn ji kovana A. T. M.
b- Dê mirin ji kovanan (H.)
c- Tinalin ji kovnana (B.)

Feqî:
Kovanên mihirdaran [91]
Bêhedd û bê hejmar in
Tîrên di wan hîsaran [92]
Sed caran sed hezar in [93]
Xedengên di nûbaran
Nihîn li dil dibarin [94]

91. a- Kovan têt mihirdaran (A.)
b- Kovanêt mihirdaran (V. Hej.)
c- Kovanêt muhirdaran (T.)
d- Kovanên ji muhirdadan (H.)
92. a- Tîrên ji hesaran (S. V.)
b- Tîr in tên ji hesaran (Hej.)
c- Tîrî di wan hesaran (B.)
d- Tîrê di wan hesaran (T. M. A.
e- Tîr tên ji wan hisaran (F.)
93. a- Sed car û sed hezaran (V. Hej. S.)
b- Sed caran sed hezaran (T. M. B.A.)
c- Sed car sed hezaran (H.)
94. a- Nihînî xef dibarin (A.)
b- Nihîn di dil dibarin (S.)
c- Nihîn û xef dibarin-ş.
e- Nîn û xef dibarîn (T. M. H.)

Mela:

Nihîn li dil direşînin [95]
Tîran ji şubhê goşan [96]
Dû mîr xezeb dikêşînin [97]
Li qetla me bêhoşan [98]
Ji "Eyn û Qaf û Şîn" in [99]
Xedengên eswed doşan[100]

---

95. a- Nihînî dilreşîn in (B.)
   b- Nîn in dil dreşînin (T. M. A.)
96. a- Tîrên di siyahgoşan (Hej.)
   b- Tîran ji siyahgoşan (K.)
   c- Tîr in te siyahkoşan (B.)
   d- Tîra ji siyahkoşan (H.)
   e- Tîr in di siyahkoşan (T. M.)
97. a- Du mîr xezeb dikşînin (T. M.)
   b- Du mîr bi xezeb dikêşînin- S. V.
98. Li qetla me medhoşan (Hej.)
99. a- Ji "Qaf Waw û Sîn în" in (A.)
   b- Ji eynê qewsan diweşînin (H.)
100. Xedengên eswedpoşan (B.)
   b- Xedeng in eswedpoşan (T. M. A.)
   c- Xedengîn eswedkoşan (H.)

Feqî:
Du nûn di siyahreng in [101]
Bi sir li me ku kêşan [102]
Derbên ewan xedeng in [103]
Li qelbê me derwêşan
Aşiq ji dest bi heng in [104]
Ji dax û zecr û êşan

101. a- Du nûn siyahreng in (Hej.)
b- Du nûn di siyehreng in (T.)
c- Du nûn te siyehreng in (B.)
d- Du nûn di siyareng in (H.)
102. a- Wan sir li min dikêşan (A.)
b- Bi ser li me ku kêşan (Hej.)
c- Wan ser li min kêşan (B.)
d- Bi ser li me kêşan (H.)
e- Wan ser li mil kêşan (T.)
103. a- Derbênd di wan xedeng in (A.)
b- Zerbên di wan xedeng in (T. M. B.)
c- Derbên wan xedeng in (H.)
104. a- Aşiq ji dest nehing in (S. V. ş.)
b- Aşiq ji des nehing in (T. A. M.)

Mela:
Daxên me pur di kul in [105]
Xeber jê nayê gotin [106]
Yengiyan derb li dil in [107]
Hinav me pur jê sotin [108]
Kemendar reşqatil in [109]
Gezme li dil bi cot in [110] *

---

105. Daxên di pir dikelin (A.)
    b- Daxên di pur ti kul in (B.)
    c- Daxên di pir di kul in (T. M.)
    d- Daxên me pur kul in (H.)
106. a- Xeber jê naêt gotin (A.)
    b- Xeber jê naên gotin (H.)
107. a- Yengiyan derb lê dil in (A.)
    b- Yengiyan zerb li dil in (S. V. Hej.)
    c- Yengiyan derd li dil in (B.)
108. a- Hinav ji ber disojin (A.)
    b- Hinav ji ber disotin (T. M.)
    c- Henav me jê pir sotin (Hej.)
    d- Hinav me ji ber sotin (H.)
    e- Hinav ji ber tisot in (B.)
109. a- Kemandarê reşqatil in (S. V.)
    b- Kemandar di reşqatil in (A.)
    c- Kemandarê te reşqatil in (B.)
110. a- Gezme le dil............ (A.)
    b- Gezme li dil bi cot in (T. M. H.)
    c- Gezme li dil pir cot in (B.)

*Ji gotinên Mela û pêve di kitêba *el-Eqdul Cewherî fî Şerhî Dîwanî eş-Şeyx el-Cezerî* de ev beş nîn e.

Feqî:
Gezmên "Eyn û Sad"an [111]
Îşaret remz û surr in [112]
Kişandin goşe badan
Mehbûb di tîr awir in [113]
Tîrên wan du celadan [114]
Batin li dil difirin [115]

---

111. a- Gezmên eyn sadan (Hej.)
b- Gezmeyên eyn û serdan (F.)
c- Gezmeyên 'eyn û sadan
112. Bi îşaret remz û sûr in (A. M. H. B.)
113. a- Mehbûb tîjawir e (V. S.)
b- Mehbûb e tîjavir e (Hej.)
c- Mehbûb te tîravir in (A.)
d- Mehbûb tîjaver in (B T. M. H.)
114. a- Tîrên du celadan (S. V.)
b- Tîrên di wan celadan (Hej. A.T. M.)
c- Tîrên ti wan celadan (B.)
115.Batin di dil difirin (A.)

Mela:
Awirên cotê belek [116]
Berqeke j'semawatê [117]
Xurşîdê çerxa felek [118]
Hatiye nêv mîratê [119]
Însan e sûretmelek [120]
Yan Hor e di cennatê [121]

---

116. a- Awirê cûtê belek (A.)
b- Awirên cotê belek (S. ş. M.)
117. a- Bergek ji semawatê (A.)
b- Berqî ji semawatê (Hej.)
c- Berqîn ji semawatê-ş. H.
118. a- Şems e di çerxa felek (Hej.)
b- Şemz e ji çerxa felek (H.)
119. a- Hatiye nîv mîrate (Hej.)
b- Şems e ji çerxa felek (H.)
119. a- Hatiye nîvmîrate (Hej.)
b- Hatî nîv mîratê (H.)
120. a- Însan e bi sûretmelek (S. A.)
b- Însanê li sûretmelek (H.)
121. Ya horî ye di cennatê (S.)

Feqî:
Horî ku têk cema bin [122]
Perî hem di wê gavê [123]
Hemî ji reng çira bin [124]
Nêzîkî şems û tavê
Ji şerma xwuya nabin [125]
Ji husna wê gulbavê

---

122. a- Horî têk cima bin (H. A.)
b- Horî lew tek çima bin (B.)
123. a- Perî hem di vê gavê (Hej.)
b-Perî di vê gavê (H.)
124. a- Hemû ji reng çira bin- S. H. Hej.
b- Hemû di reng çira bin (A. ş.)
125. Ji şerma da xwiya nabin (S.)

Mela:
Wan şerm e j'dêmê zerî [126]
Eqreban derb li dildan
Xurşîd e mah û muşterî [127]
Pêrû di muqabil dan [128]
Însan e b'şiklê perî [129]
Ya horî ye sifetwîldan [130]

---

126. a- Şerme ji dêmê zerî (Hej.)
b- Şermîn ji dêmê zerî (H.)
c- Wan şerm e ji dêmzerî (B.)
127. a- Xurşîd e û mahmuşterî (A.)
b- Şems û meh û muşterî-Hej
c- Xurşîd û mah û muşterî-ş.
d- Xurşîd û mehmuşterî (H.)
128. a- Pêro di miqabil dan (Hej.)
b- Pêro ti miqabil dan (B.)
c- Perwan di miqabil dan (H.)
129. a- Însan bi şiklê ferî (A.)
b- Îns e bi şiklê perî (Hej.)
c- Însan e bi şiklê peryan-ş.
d- Însan bi şeklê perî (S.)
e- Însan li şiklê peryan (H.)
f- Însan e bi şiklê peryan (B.)
130. a- Ya horîsifetwîldan (Hej.)
b- Horî ye sûret wildan (B.)
c- Hor e sûretwildan (H.)
d- Yan hûr e sîfet wildan.

Feqî:
Pêro yeqîn ku xal in [131]
Di eqda Suryayê [132]
Du roj in du hîlal in [133]
Li dêmê wê leylayê
Bêwesf û bêmîsal in
Di remza şekerxayê [134]

Mela:
Bi remz û guft û surran
Nebatê ew dirêjin [135]
'Işweyên le'l û durran
Lu'lû şeker bihêjin [136]
Xedengên di awiran[137]
Aşiqan dibirêjin [138]

---

131. a- Pêro yeqîn xal in (B. A.)
b- Pêwer yeqîn xal in (H.)
132. a- Di iqda Sureyayê (Hej.)
b- Di eqda Sureyyayê (S.)
133. Du roj û du hîlal in (S. Hej.)
134. a- Di remza şekerxayê (A. Hej.)
b- Di remzên şekerxayê (H.)
135. a- Nebatê ew ji tîr in (A. Hej.)
b- Nebatî lew dirêj in (H.)
136. Lu'lu'şeker dibêjin (Hej.) H.
137. a- Xedengên ti awiran (A.)
b- Xemzeyên wan awiran (H.)
c- Xedengên di wan awiran (B.)
138. a- Aşiqa dibirêjin (Hej.)
b- Aşiqan ti birêjin
c- Aşiqan diberêjin (A.)

Feqî:
Aşiqên leb û lêvan [139]
Şabaş e ji Xwedê ra [140]
Selweya bih û sêvan [141]
Belçîm ji zîv û zêra
Heram in xew di şêvan[142]
Li kesê muhbet vê ra

Mela:
Kesê ku yek divêtin
Sohtiye bi ulfetê [143]
Şevan ku xew naêtin [144]
Ji tîra muhebettê
Aşiq li pey wê têtin [145]
Ji cezb û ji firqetê [146]

---

139. Aşiqê dev û lêvan (Hej.)
140. a- Selwa bi bih û sêvan (Hej.)
 b- Selwa bih û sêvan (H.)
141. a-Belgên ji zîv û zêra
 b- Belgên ji zîv û zêra (A. H.)
 c- Biçin ji zîv û zêra (B.)
142. a- Heram in xew di şevan (A.)
 b- Heram e xewê di şevan-ş. M.
 c- Heram in xewê di şevan (B.)
 d- Heram e xewa şîvan (H.)
 e- Heram e xew di şîva (A.)
143. a- Mihtiyê bi ulfetê (A.)
 b- Sotiye bi ulfetê (H. B.)
144. a- Şevan ku ev xewêtin (Hej.)
 b- Şevan ku wî xew têtin (S.)
 c- Şevan ku xew nîn in (H.)
 d- Şevan ku xew naêtin (A.)
145. a- Aşiq li pê wî têt in (A.)
 b- Mihdaîr pê tetin (H.)
146. Ji weslê û firqetê (H.)

Feqî:
Firaqê têk hirqet e [147]
Be'îd e ji xiyalê
Tûtak e bi zehmet e [148]
Bilbil ji ber cemalê [149]
Goyîn qet xew nakete
Ku dûr e ji wîsalê [150]

Mela:
Zehmet bi min wîsal e
'Aşiq ji ber cezbeyê
Lew têt bi derd û hale
Ji ber berqa şe'şeyê [151]
Dema ku têt şemalê [152]
Nezer daye perwaneyê [153]

---

147. a- Firaq têk hirqet e (S. A.)
b- Ebîd ji xiyalê (H.)
148. a- Tutak e bi zehmet e (A. M.)
b- Tuna ye û zehmet e (H.)
c- Tutak e pir zehmet e (B.)
149. a- bulbul ji ber cemalê (S.)
b- Bilbil ji wê cemalê (H.)
150. a- Dûr in ji wîsalê (H.)
b- Dûr e ji wîsalê (A.)
151. a- Ji berqa wê şe'şeê (A. H.)
b- ji berqa wê şe'şeê ye (Hej.)
c- Ji berqa şe'ee'yê
152. a- Dema hilêt şemale (Hej.)
b- Dema hilbit şemal e (H.)
153. a-Nezer de perwane yê (Hej.)
b- Nezer di perwaneyê (A.)
c- Nezer ke perwaneê (H.)

Feqî:
Perwane lew dimirit [154]
Xweş nîn e ev bijînê [155]
Zeîf e xwe nagirit [156]
Tîj e berqa evînê
Di perdê nasebirit [157]
Perde kemala dînê[158]

Mela:
Perwane lew disojî [159]
Li lem'eya cezbatê
Fida kirin 'umr û jî [160]
Di keşfa sebbehatê [161]
Ku da ji nû ve vejî [162]
Baqî bit di heyatê

154.Perwane lew dimirit (S. Hej.)
155. a- Xwoş nîn e ew bi jînê (S.)
b- Xwoş niye ew bijîne (A.)
156. Zeîf e xwo nagirit (S. A.)
157. a- Bi perdê nasebirit (A. ş.)
b- Di perdê nasebirit (S.)
c- Di perde nasebirit (H.)
158. a- Darêt kemala dînê (Hej.)
b- Da birêt kemala dinê (A.)
159. Perwane lew disojit (A.)
160. a- Fidakar in umr û jîn (A.)
b- Fida dikit ruh û jî-ş. H.
161. a- Di keşfa subbuhatê (Hej.)
b- Di keşfê wê subhatê (H.)
162. Ku da ji nû ve bijî (A.)

Feqî:
Heyat li bal min wesl e [163]
Du lat ger bibin latek
Murad bi xwe her esl e [164]
Têk da bibin sifatek [165]
Ji hev êk nîn e fesl e [166]
Wahid bimînit zatek

---

163. a- Heyat bi min wesl e (S.)
b- Heyat yeqîn wesl e (H.)
c- Heyat bi min her wesl e (B. A.)
164. a- Murad bi xwo her esl e (S. A. Hej.)
b- Murad bi xwe esl e (H.)
165. a- Têk be bîne sifatek (K.)
b- Têk da bibîne sifatek (S.)
c- Têk da bîn sifatek (H.)
d- Têk da bîne sifatek (B.)
166. a- Ji hev êk nebin fesl e (Hej.)
b- Ji hew êk nîn e fesl e (A.)
c- Ji hev nebin be fesle (H.)
d- Ji hev têk têne fesle (B.)

Mela:
Wahid zatek e ferd e [167]
Tecella d'wan sîfatan [168]
Li eynê dil nezer de [169]
Li cimley te'yînatan [170]
"Tewehhum" bûye perde
Bi ismê but û latan

Feqî:
Lat sûretek heq e [171]
Ji esmayên heqqanî
Li bal min muheqqeq e
Di nêv keşfa subhanî
Lahut e her mutleq e
Di nasûta însanî [172]

---

167. a- Wahid zatek ferd e (S. A.)
b- Wahid zatek e ferd e (Hej.)
168. a- Tecella di sifatan (Hej.ş.)
b- Tecella bi van sifatan (H.)
169. a- Le'lên di dil nezer de (A.)
b- Bi eynê dil nezer de (Hej. H. B.)
170. a- Li cumle te'yînatan (Hej.)
b- Le cimlê te'yînatan (A.)
c- Cemlên te"yînatan (H.)
d- Lat sûretekî heqqe.
171. Lat jî sûretek heqq e (Hej.)
172. Di nasûtê însanî (Hej. H.)

Mela:
Însan bi min nasût e
Gewher di nêv sedefê
J'alema ceberrut e [173]
Şems hatiye şerfê [174]
Tenezzul ji lahût e
Mehbûb e cam di kefê

Feqî:
Kefa kûze û tas tê [175]
Nazik û spî zend in
Cama ku meya xas tê [176]
Binêrin talib çend in [177]
Wexwun ji destê rastê
Bi medhan mehbûb xwendin

---

173. Ji ilma ceberrût e (Hej.)
174. a- Şems hatî şerefê (ş.)
b- Şems e hatî şerqê (H.)
175. a- Kefa kûz û tas tê (S.)
b- Kefa ku kûs û tas tê (ş. B.)
c- Kefa ku kûz û tas tê (Hej.)
d- Kefa ku kûz e û tas tê (A.)
e- Kefa kûz e û xas tê (H.)
176. a- Qedeha meya xas tê (H. Hej.)
b- Cama meya xas tê (A.)
177. a- Binê talib çend in (H.)
b- Binêrin talibî çend in (B.)

Mela:
Wesf û medhên mehbûban [178]
Li daxên kul heyat in [179]
Qût e ji bo qulûban
Gulav qend û nebat in
Ji nexma medhên xwuban [180]
Aşiq ji ber b'cezbat in [181]

Feqî:
Aşiq bi wesf û medhan
D' fîraqê de sebirî [182]
Nesîm bêt ji wan terhan [183]
Bilbil xwuhê bigirî? [184]
Xûnin dê derbit ji cerhan [185]
Bi daxên kul bimirî [186]

---

178. a- Wesfên di mehbûban (S.)
b-Wesfên ti mehbûban (B.)
179. Li daxêt gul heyat in (Hej. A. B.)
180. Ji nexmeya medhan xuban (S. A.)
181. a- Aşiq bi cezbê hatin (Hej.)
b- Aşiq bi cezbat in (H.)
c- Aşiq ji ber dicezb in (A.)
182. a- Bi fîraqê ti sebîr î (B.)
b- Bi fîrqetê disebirîn
183. a- Nesîm ji wan terhan (Ş.)
b- Nesîm bêt ji wan dirhan (B.)
184. a- Bilbil neşê xwe bigirî (Hej.)
b- Bulbul xwuhê bigirî (S.)
c- Bilbil cihî bigirî (B.)
d- Bilbil xwo jî digirîn (H.)
185. a- Xûn dê der bit ji cerhan (B.)
b- Xûn dê der bê ji cerhan (S.)
c- Xwun da bît ji cerhan (A.)
186. a- Bi daxên gulê bimrî (A.)
b- Dê bi daxên gulê bimrî (Hej.)
c- Li pêş gul dimirin (H.)
d- Bi daxên gul bimirî (B.)

Mela:
Bilbilên wê gulşenê [187]
Ji ezel her dibêjin [188]
Heta ebed j'me'denê [189]
Gewheran da birêjin [190]
Herfekê wesfan tenê [191]
Alem têk naperêjin [192]

---

187. a- Bulbulê wê gulşenê (S.)
b- Bilbilê wê gulşenê (B.)
c- Bilbil in wê gulşenê (H.)
188. a- Ji ezel ew dibêjin (S. Hej.)
b- Ji ezel her ew tibêjin (B.)
189.a- Ta ebed ji me'denê (Hej.)
b- Heta ku di dinê mînî (F.)
190. a- Gewheran diperêjin (A.)
b- Ji me'den darêjin (H.)
c- Ji me'dan dadirêjin
191. a- Herfek ji wesfan tinê (Hej.)
b- Herfek e ji wesfan tinê (S.)
192. a- Alem têk nabirêjin (Hej. A.)
b- Alem naperêjin (H.)

Feqî:
Cema kin têk alemê [193]
Hemiyan bi ustad kin [194]
Herfek j'lewhê qidemê [195]
Bênin b'şerh û sewad kin [196]
Nayêne ber qelemê [197]
Behran ew bi medad kin [198] *

---

193. a- Cemakên têk alem (S.)
b- Cemaken têk alemê (B. H. A.)
194. a- Hemuwan bi ustad kin (S. A.)
b- Hem ni işhad kin (H.)
195. a- Herfek ji lewhê qidemê (Hej.)
b- Herfek ji lewhê edemê (H.)
196. a- Binî bi şerh û sewad ken (S.)
b- Bi şerh û bi sewad ken (Hej.)
c- Bi şehr û bi sewad ken (H.)
d- Bînin bi şerh û sewad kin (A.)
197. Naête ber qelemê (Hej. A.)
198. a- Behran ew bi mîdad kin (Hej.)
b- Behran bi mîdad ken (H.)
*- Behran er bi mîdad kin

Mela:

Nesrîn û gul tebeqek*
Seher ji baxê gulan [199]
Ji nesteran wereqek [200]
Bes e me sahibdilan
Urfê xwahê sebeqek [201]
Çêtir ji sed sîclan **

Feqî:

Ehsen ji nû sebeqan [202]
Qelem j'qend û nebatê
L' sehîfeya wereqan [203]
Dirêjîn ava heyatê [204]
Dest bi dest jê tebeqan [205]
Melek têne cenatê

---

* Ji vir û pê de di dîwana Lîtografa Hartman de nîn e.

199. Sehrê ji baxê gulan (A.)

200. a- Ji ne siterên wereqek (A.)
    b- Ji nesteren wereqek (Hej.)
    c- Ji nestirin wereqek (B.)

201. a- E'rifxahî sebeqek (A.)
    ** 'uruf-xwahî sebeqek
    b- Urfe xwubahê sebeqek (Hej.)
    c- Îrfxahu sebeqek (S.)
    d- Irqxahî sebexek (B.)

202. Ehsen ji tu sebexan (A. B.)

203. Li ser sefha wereqan (Hej.)
    Li sehîfeya wereqan

204. a- Dirijî ava heyatê (Hej.)
    b- Dirêjit ava heyatê (S.)

205. a- Dest bi dest jê tebeqan (A. B. M.)
    b- Des bi dest jê tebeqan (S.)

Mela:
Nefesa te enber e [206]
Zubad û misk (di)bêjin [207]
Çi şaxê ney şeker e [208]
Nebat û qend dirêjin [209]
Nutqa te xwe gewher e [210]
Sed ber gewher havêjin [211]

Feqî:
Gul im di destê xaran
B' ismê Muhemmed nav im [212]
Bilbil im di gulzaran [213]
Ji işqê lew zerbav im
Di remza muhirdaran [214]
Tu roj î, ez hetav im

---

206. Nivîsa te enber in (Hej.)
207. a- Zubad û misk dirêjin (S.) T.
 b- Zubad û miskî dirêjin (A.)
 c- Zubad û misk tirêjin (B.)
 d- Zubad û misk dirêjit (T.)
208. a- Çe şax û neyşeker e (A.)
 b- Çi şaxê neyşekerîn (Hej.)
 c- Çi çax ney şeker e (B.)
209. a- Nebat û qendê dirêjin (A.)
 b- Qend û nebat dirêjin (Hej.)
 c- Nebat û qend dirêjit (T.)
210. a- Nutqa te xwe gewherîn (Hej.)
 b- Nitqa te xwo gewher e (A.)
 c- Nutqa te gewher e (B.)
211. Sed bar gewher dirêjin (S. A.)
 b- Sed bar gewher ti rêjin (B.)
212. Ismê Muhemmed nav im (A.)
213. Bulbul im di gulzaran (S. Hej.)
214. Di remzeya mihirdaran (Hej.)

Mela:
Dûr im j'gulê b'xunav e [215]
Lew zer şibhetî bih im [216]
Sosina ereq ji tilave [217]
D' fîrqetê dibirijim [218]
Li bal Xwuda dilave
Tu hetav î ez sih im [219]

Feqî:
Birîndarê 'işqê me
Dûr im ji siha bihan [220]
Dizanin meddahê kê me [221]
D' hezar û yek û sihan
Senaxwanê Melê me [222]
Li hemû erd û cihan [223]

---

215. Dûr im ji gulêt bi xwinave (S. Hej.)
216. a- Lew zer şubetî bih im (Hej.)
    b- Lew zerê şubhetî bih im (A. M.)
217. Sosin ereq tilave (Hej.)
218. Di firqetê dibirijehim (Hej.)
219. a- Tu hetav û ez sih im (S.)
    b- Tu roj î ez sih im.
220. a- Dûr im ji sîha bêhan (Hej.)
    b- Dûr im ji sîha bihan (A.)
221. a- Zanim meddahê kê me (Hej.)
    b- Dizanim meddahê kê me (A.)
222. Senaxahê Melê me (A.)
223. Lew hemû erd û cêhan (Hej.)

Mela:
Hindî ku digazehim [224]
Dikêşim sebr û xîrê
Şubhetê çeng û zeh im [225]
Hilak in j'derba tîrê [226]
Senaxwanê Feqeh im [227]
Îroke di Cizîrê *

224. a- Hindî ku diguzim (S.)
b- Hindî ku dikarhim (H.)
c- Çendî ku ditikirhim (B.)
d- Çendî ku digerhim
225. Şubhetî çung û zeh im (Y. S.)
Şubhetê çeng û jihim
226. Hilak ji derba tîrê (Hej.)
227. a- Senaxanê Feqîh im (A.)
b- Senaxahê Feqîh im (S.)

* Ev helbest 50 şeşîne ye. 25 şeşîne Feqiyê Teyran, 25 jî Melayê Cizîrî gotine. Ev helbest li ber 11 dîwanan hatiye hevberkirin û tûjandinê. Ev dîwane ev in: Hejar, Zivingî, Taha, Ebû Bekir, S.B.Amêdî, Mela Şemseddîn- A. Reqîb Yûsif, El-Cihhûrî, Feqe Ehmed Tixûbî- Von Hartman (destnivîs), Maî, Bexda û litoxrafa Hartman.

Dilo Rabe*

1.
Dilo rabe dilo rabe
Veke çavan ku êvar
Nezan û bes di xew da be
Bi newmê ra mebe yare [1]

2.
Li xwe şîrîn meke newmê [2]
Ji nefsa xwe bike lewmê
Meçe nêzîkî vê qewmê [3]
Qewî ew fi'la xesar e [4]

---

* Ev destana li ber ya Zerî Rudenko (R.) hatiye hevberkirin.

1. Ji newmî ra mebe yare (Z.)
2. a- Dilo şîrîn neke newmê (X.)
   b- Dilo li xwe şîrîn neke newmê (H.)
3. Neçe nêzîka wê qewmê (X.)
4. a-Dilo ew fi'la xesar e (X.)
   b-Nezan û bes tu xew da be (H.)

3.
Dilo newma me jê behs e [5]
Beyana xefletê nehs e [6]
Ne hişyar î gelek tehs e [7]
Me nêv xabe ku mirdar e [8]

4.
Dilo rabe ji vê xabê [9]
Wekî bapîr û wek babê [10]
Em jî dê çîne turabê [11]
Bi bal baxwoy û ferwar e[12]

5.
Binêr baxwoy û ferwarî [13]
Binêr çerxê di rozgarî [14]
Li te roj hate êvarî
Te ne ‘eql e, ne hişyar e [15]

---

5. a- Dilo newmê me jê behs e (X.)
   b- Dilo rabe me jî behs e (Z.)
6. a- Beyana xefletê nehs e (X.)
   b- Beyana xefletê tehs e (Z.)
7. Nehişyar î gelek nehs e (Z.)
8. Li min ew xaba mirad e (X.)
9. Bes e rabe ji xewabê (X.)
10. Weka bapîr û wek babê (X.)
11. a- Em jî dê biçine turabê (X.)
   b- Lazim dê çîne turabê (X.)
   c- Em jî dê biçne turabê (Zinar)
12. a- Li bal baxwo we ferwar e (X.)
   b- Ji bal bax û weferwar e (Zinar)
13. a-Binêr bax û we ferwarî (X.)
   b- Binêre bax û ferware (Zinar)
14. a- Binêr çerxê û rojgarî (X.)
   b- Binêr çerx û rozgarî (A.)
   c- Binêre çerx û ruzgare (Zinar)
15. a- Te ne eql î ne hişarî (H. Z.)
   b-Te ne eql e ne hişyar e (H.)

6.
Eger ‘eql î were çengî [16]
Binêr nefsê heya kengî [17]
Tu xafil bî bi vî rengî [18]
Eya eqlê neguhdar e [19]

7.
Çiqa sist î çiqa kehl î [20]
Tu xwe yekcar ji xwe mehl î
Mebe xergûş di nêv dehlî [21]
Seyadê te kivandar e [22]

---

16. a- Eger eqlî were çengê
 b- Eger eql î were cengî (Z.)
17. a- Bi nefsa xwo heta kengî (X.)
 b- Bibêj nefsê heta kengê (Z.)
 c- Bibêj nefsê heta kengê (Zinar)
18. a- Tu xafil î bi vî rengî (X.)
 b- Tu xafil bî di vî rengî (Z.)
 c- Tu xafil bî bi vê rengê (Zinar)
19. a- Eya kero ney guhdar e (X.)
 b- Eya kalê ne guhdar e (Zinar)
20. a- Çi wey sist î, çi wey kehl î (A.)
 b- Çu wê sistî çuwê kehlê (Zinar)
21. a- Nebe xerguş di nêv dehlî (X.)
 b- Nebe xerguş di nêv dehlî (Z.)
22. a- Seyad dê bêne çardare (A.)
 b- Seyadê bêt û madar e (Z.)
 c- Seyad dê bête madare (Zinar)

8.
Seyadê bêt û te rake [23]
Mebêj na û mebêj nake [24]
Mecala ew bi xewxak e [25]
Binêr carek çi hawar e [26]

9.
Binêr carek çi bangîn e
Ji newmê xwe bi hiş bîne [27]
Dinê qetl e dinê xwîn e [28]
Dinê gerdûn û rojgar e

---

23. a- Seyadê bêt û te ranakim (X.)
b- Seyad dê bêt û te ranakin (Z.)
c- Seyad dê bêt û te rakit (Zinar)
24. a- Mebêj nabêt, mebêj nakem (X.)
b- Nebêj nabêm, nebêj nakim (Z.)
c- Nebêj nayê nebêj nakit (Zinar)
25. a- Mecalê dê bi xewxa kim (X.)
b- Mecalê bêm û xewxakit (Z.)
c- Mecal e ew bi xewxa kit (Zinar)
26. Binêr carek çi hawar e (Z.)
27. Ji newmê xwe vekişîne (X.)
28. Dinê qetl e dinê xwîn e (K.)

10.
Dibarin tîr ji gerdûnê [29]
Ji xew rabe demek rûnê [30]
Tu natirsî ji êtûnê [31]
Di bin da agir û nar e [32]

11.
Di nêv agir di nêv pêtê [33]
Li ser sihlê xewa kê tê
Ecel gurrye yeqîn pê tê [34]
Te ne fikr e ne efkar e [35]

---

29. Dibaritin di gerdûnê
30. a- Li xwo rabe demek rûnê (X.)
    b- Ji newmê rabe demek rûnê (H.)
31. Tu natirsî ji hêtûnê (X.)
32. a- Li bin te agir û nar e (X.)
    b- Di bin te agir û nar e (Z.)
33. a- Li nav tariyê evê pêtê (X.)
    b- Li nav agir ewê pêtê (H.)
    c- Di nav narê di nêv pêtê (Zinar)
    d- Dibit agir dibit pête (Z.)
34. a- Ecel gurg e yeqîn kê te (X.)
    b- Ecel gurg e yeqîn pêt e (Z.)
    c- Ecel gurg e yeqîn bêtê (Zinar)
35. Te ne fikr e û ne ew kar e (X.)

12.
Tu van fikran çira nakî
Te navê xwe ji xew rakî [36]
Ku êvar hat çi peyda kî [37]
Eya meymestê meyxwar e [38]

13.
Xewa qelbê emel bê cih [39]
Guhê xelkê kerr û bê bih [40]
Meçe pal de li ser balgih [41]
Xewa bê cih qewî ‘ar e

---

36. a- Tu navê xwe ji xew rakî (A.)
b- Tu xwo ji xewê cuda nakey (X.)
37. Dê êvarê çi peyda kî (X.)
38. a-Eya meymestî xemar e (X.)
b- Eya meymestêmî xare (Z.)
c- Heya mêmest û xumar e (Zinar)
39. a-Xewa qelbî emel bêbê (A.)
b-Xewa qelbê emel çê bû (Z.)
c-Ev çarîne di pirtûka Zinar de ya kêm e leng e.
40 a-Guhê xelkî kir û gêj bû (Z.)
b-Gehê xelkê kir û gêj bê (A.)
41. a- Micîd xwe berda ser balgî
b- Mecih palda li ser bilgî (Z.)

14.
Xewa bê cih qewî pûs e [42]
Me ne nave ne namûs e
Dikana me qewî rûs e [43]
Dibêjin Xoce qerdar e [44]

15.
Dibêjin Xoce bê debr e [45]
Di me'nê da dikan qebr e [46]
Tijî toz e tijî xebr e [47]
Selb teng e tijî mar e [48]

---

42. a- Xewa bêcih qewî kûs e (Z.)
    b- Xewa bêcih qewî tûs e (H.)
    c- Xewabî çî qewî kûs e (Zinar)
43. a- Dikana Xaceya rûs e (X.)
    b- Dikana min qewîrûs e (Z.)
44. a- Dibên xace yê qerdar e (X.)
    b- Dibêjin Xoce qerdar e (Z.)
    c- Dibêjin Xoce qerzdar e (Zinar)
45. a- Dibên Xoce yê bêdebr e (X.)
    b- Dibêjin Xoce bêdebr e (Z.)
46. a- Di me'nê da dikan qebr e (A.)
    b- Di me'nî da dukan qebr e (Zinar)
47. Tijî toz û tijî xebr e (X. Z.)
48. a- Sebetreng e tijî mar e (X.)
    b- Sereb teng e tijî mar e (A.)
    c- Sebet reng e tejî mar e (H.)
    d- Seleb teng e tijî mar e (Zinar)

16.
Tijî mar e tijî mûr e [49]
Qewî teng e qewî kûr e [50]
Ji xwe qebrî neke dûre [51]
Li wê mal e li hir war e [52]

17.
Bûye payîz li van waran [53]
Xezam weşyan li bin daran [54]
Li bin çi d'kin gelo yaran [55]
Li mêrgan bûye xûsare [56]

49. Tijî mar û tijî mûr e (H.)
50. a- Qewya teng e gelek kûr e (X.)
b- Qewî teng e gelek kûr e (Z.)
51. a- Xwo ji qebrî mebin dûre (X.)
b- Ji xwo qebrî mebin dûre (Z.)
52. a- Li wê mal e li hêre war e (X.)
b- Li wê mal e li her war e (Z.)
c- Li wê mal e li vir war e (Zinar)
53. a- Bûye payîz li van wara (X.)
b- Bûye peyîz li van wara (Z.)
54. a- Xezal weryane bin dara (X.)
b- Xezam weryane........ (Z.)
c- Xizaw weşyan binê daran (Zinar)
55. a- Li bin çi dikin gelî yara (X.)
b- Li min çêkin gelî yara (H.)
c- Ji me çib kin gelî yaran (Z.)
d- Ji min çidkin gelî yaran (Zinar)
56. a- Li mîrgan bûye xîsare (H.)
b- Li mêrgan bûye xesare (Zinar)

18.
Xezam zer bûn ji xusarî [57]
Sefa nakin li vî warî
Li ber sermê û hewa sarî [58]
Hewayî zer kirin dare

19.
Xezam zer bûn ji sermayê [59]
Revî rewneq ji dunyayê [60]
Ji boş avan guşên nayê [61]
Ne şet man û ne enhare [62]

---

57. Xezam zer bûn ji ber xwusarî (Z.)
58. a- Ji ber sermê û hişyarî (A.)
b- Ji ber sermayê asarî (H.)
c- Ji ber sermê asarî (Zinar)
59. Xezal zer bûn ji sermayî
60. Rabûn rewneq ji dunyayê (X.)
61. a- Li boş avan guşên nayê (X.)
b- Ji paş av ku hêşîn nayê (Zinar)
62. a- Ne şetmane ne xubare (X.)
b- Ne şeytan ma, ne ezhar e (Zinar)

20.
Neman enhar di vî warî
Dibên kêm bûn şetê carî
Çu nînin bo te xemxwarî
Ku li wê bûye bihare? [63]

21.
Bihar borî û av kêm bûn
Hezaran bax li ber dêm bûn [64]
Payîz dahat û gul kêm bûn
Weşandin belg û man xar e [65]

63. Gelo bedr e di buhare (Zinar)
64. a- Hizar baxçe li ber dêm bûn (X.)
b- Hizar buxçe li ber dêm bûn (H.)
65. a- Weşandin belgêt minxare (X.)
b- Weşandin belgêt muxare (H.)
c- Ev çarîne di pirtûka Zinar de wiha ye:
Buhar borî av kêm bû
Hezaran bax li ber çêm bû
Payîz hat û gul tên bû
Weşandin belk û ma xare (Zinar)

22.
Ne belçim man ne sunbul man [66]
Ne ruhan man ne sorgul man [67]
Ne hevrî man ne hevdil man [68]
Tinê min heyf ji wan xware [69]

23.
Ne hevrî man ne heval man
Ne sosin man ne al-al man
Ne al-alê siyahxal man
Tenê min heyf li wan xware [70]

---

66. a- Ne berçem man ne sosin man (X.)
    b- Ne belçim man ne sorgul man (A. Z.)
67. a- Ne gul man û ne rihan man (X.)
    b- Ne rihan man ne sunbul man (A. Z.)
    c- Ne reyhan ma ne sunbul ma (Zinar)
68. Ne hevrî man ne heval man (A.)
69. a- Turab kêm kirin yare (A.)
    b- Ne hevalên wefadar e (Zinar)
70. a- Ev herdu malkên jêrî bi tenê di destnivîsa H. de hatine.
    Ne sosin man helal man
    Ne lalayên siyaxal man
    b-ev çarîne di pirtûka Zinar de hebû.

24.
Tinê min heyf li wan tiştan [71]
Li beybûnan li bamiştan
Xwezî ev reng ne êvîştan [72]
Di asmînê di namdar e [73]

25.
Ne çîçek man ne asmîn man [74]
Ne rozanê di rengîn man [75]
Ne goyînê di xwoşxwîn man [76]
Ne Nîsan man ne Adar e [77]

26.
Dilo borîn ji Nîsanê
Hewayê wan mehan kanê
Bûye Eylûl li rozanê [78]
Ne kanî man ne cobar e [79]

---

71. Tinê min heyf li wan tişta (X.)
72. a- Xwezî ev reng heba hêşta (X.)
    b- Xweda ev reng ne abûsûn (Zinar)
73. a- Ne elçiyên sitîndare (H.)
    b- ji yek çînê îstindar e (X.)
    c-Ji asmînê di qamdar e (Zinar)
74. a- Ne çîçek man ne zeytîn man (X.)
    b- Ne çûçik man ne makîn man (Z.)
    c- Ne asmîn man ne yasmîn man (Zinar)
75. Ne zozanên di rengîn man (X.)
76. Ne abdinê di xwoşxwîn man (X.)
77. Ne nîsan û ne Adar e
78. a- Xoşî borî li nîsanê
    Heyamê wan mehan kanê
    Bûye Eylûn li zozanê (H.)
    b- Bûye payîz li zozanê (Zinar)
79. Ne Kanûn man ne cobar e (A.)

27.
Ji cobaran giya ker çûn [80]
Letîf û nazik û ter çûn [81]
Wekî bayî kelemper çûn
Gelo ew bo çi dijwar e [82]

28.
Li me bayî kire gazî [83]
Xezam pêçan l'ber evrazî [84]
Muqîm ew aş li vî sazî [85]
Reşandin sunbulan ar e [86]

---

80. a- Ji cobara giya tev çû (A.)
 b- Di cobaran giya ter çû (Zinar)
81. a- Ji lutfa xwo bi dilber çûn (X.)
 b- Ji letîfa xwo dilber çûn (H.)
 c- Letîf û nazika her çû (Zinar)
82. a- Dilo ya bêt jî dijwar e (X.)
 b- Dilo ya pîç e dijwar e (H.)
83. a- Li min bayê kire gazî (X.)
 b- Li me bayê kire gazî (Zinar)
84. a- Xezal pêcane evrazî (X.)
 b- Zîzam pêça ber evrazî (Zinar)
85. a- Madem aş e li vî sazî (X.)
 b- Madem aşek li vî sazî (H.)
86. a- Weşandin sunbulan ar e (X.)
 b- Reşandin sunbulan xar e (Zinar)

29.
Dibarin ar ji asmanî
Ji doma çerx û dewranî [87]
Gerê avête rojhanî
Bixûr nayê ji Bulxare [88]

30.
Ji Bulxarê di reng dayê
Ji mexmûrê di pêçayê
Qumaş kevn e bi kêr nayê
Ruyê hîmê ku ‘eybdar e [89]

---

87. Dibarît ar ji asmana
Zemanê çerx û dewrana (X.)
88. a- Ne bixur e ne Bulxar e (X.)
b- Dibarîn ar ji asmanê
Ji doma çerx û dewranê
Girê avête reyhanê
Bixur nayê ji Bulxare (Zinar)
89. a- Rûyê hîmayê eybdar e (X.)
b- Ruyê hîmê yê eybar e (H.)
c- Ji wê hîmê ku eybdar e (Zinar)

31.

Ruyê hîmê çû çil salî [90]
Di nêv baxçeyê reşkalî [91]
Deqîq borî li pertalî [92]
Hemî têk bûne cûbar e [93]

32.

Li me pertal kete avê [94]
Kefa behrê geha navê [95]
Siya mexmûr li ber tavê
Spî bû reng û rûkar e [96]

---

90. a- Ruyê hîmê çil salî (A.)
    b- Ev çarîne di pirtûka Zinar de wiha ye:
    Ji wî hîmê culusanê
    Di bexçeya di reş kanê
    Gul û nergiz û reyhanê
    Li me pertal dibû sare (Zinar)
91. Di nav qebrî û reşkalî (X.)
92. Reqîq barî li pertalî (H.) F.
93. Hemî êk bûne çobar e (X.)
94. a- Li me pertal kefte avê (X.)
    b- Li min pertal ketin avê (H.)
95. Kefa behrê geha navê (H.)
96. a- Spî bûn reng û rukare (X.)
    b- Spî bû rengê rûbar e (Zinar)

33.
Spînûr e j'hidayatê [97]
Reşîreng e ji zulmatê [98]
Şukur şev çû û roj hatê [99]
Xweda xesal û qettar e [100]

34.
Xesalî nerm kirin şuştin
Li ber tavê bi dom hiştin [101]
Ji rengê pîriyê riştin [102]
Şukurdarîn ji Cebbar e [103]

---

97. Spînûr e û hîdayat e (X.)
98. Reşîreng e bi zulmat e (H.)
99. a- Yeqîn şev çû we roj hate (H.)
b- Yeqîn şev çû bû rojhate (X.)
100. a-Xwedê Xesalê Qehhar e (X.)
b- Xwedê Xesal e Xeffar e (H.)
c- Xwedê Xessal û Qessar e (Zinar)
101. a- Xesalî terkirin şiştin
Li ber tavê gelek hiştin (X.)
b- Xetarî ter kirin şiştin (H.)
102. a- Xwedê ev reng neayuştin (Zinar)
b- Bi rengê pir riştin (A.)
103. Şukurdaniyê Cebar e (X.)

35.
Şukurdar în ji vî halî [104]
Hewayê lewleba salî
Weşandin belg ji al-alî
Ne reng mane ne ruxsare [105]

36.
Me ne reng ma ne qamet ma
Me ne xew ma ne rahet ma
Me ne bêhn ma ne sîret ma
Hemî borîn dinê sar e [106]

---

104. Şukurxwaz în bi vî halî
Hewayê lew libas lalî
Weşandin belgêt helalî (X.)
105. Şukurdar în ji vê halê
Hewayê lewleba salê
Weşandin belk ji al-alê
Me ne reng ma ne xussar e (Zinar)
106. a- Ne me reng ma ne rahet ma
Ne me xew ma ne quwet ma
Ne me çar ma ne qamet ma
Hemî jî çûn dinê sar e (X.)
b- Me ne reng ma ne rahet ma
Me ne xew ma ne taqet ma
Me ne çar ma ne quwet ma
Hemî çûn û dinê sar e (H.)
c- Me ne reng ma ne taqet ma
Me ne xew ma ne rahet ma
Me ne bîn ma ne sîret ma
Hemî borîn dinê sar e (Zinar)

37.
Dinê mehd e û mehlok e
Weku le‘be û leyzok e [107]
Çi zanin tifl û zarok e [108]
Felek çerx e û xeddar e[109]

38.
Felek çerx e û dewran e [110]
Mîsalê mewcê behran e
Me‘aşê ehlê şeytan e
Dinê dewre û dewwar e

---

107. Dinê mehd e û mehlûk e
Wekî le‘b û leyzok e-A
108. Çi dizanin tifl û zarok e
109. a- Felek çerx e û dewran e (A.)
b- Felek çerx e û dewwar e (Zinar)
110. Di navbeyna vê çarînê û çarîna di pêşiya vê de çarînek dî hebû û bi vî awayî bû:
Bêqerar e ya şirîn e
Weku şekir û hingivîn e
Di nav yek da westirîn e
Ya davdoz e ya mekar e
Min ev çarîne neêxiste nav rêza helbestê. Lewra ev çarîn li yên berî û piştî xwe nayê.

39.
Dinê qenc e ji mêran ra
Eceb mulk e ji şêran ra [111]
Ku ava kin ji xêran ra [112]
Ecêb mezr e û eqqar e[113]

40.
Dinê qenc e tijî şêr bin
Jê xêran ra di xweşmêr bin
Ne mislê min di bêkêr bin [114]
Dibê kesp û dibê kar e [115]

---

111. Dinê qenc ji şêran ra
Ecêb milk e ji mêran ra (X.)
112. Ku ava kin ji xêra re
Çi xwoş milk e ji şêra re (Z.)
113. a- Ecêb mezra û eqqar e (Z.)
b- Eceb mezra û eqar e (X.)
c- Ecêb mulk e û aqar e (Zinar)
114. a- Ne şibhê min di bêxêr bin (X.)
b- Ne şitî min di bêkêr bin (H.)
115. a- Dibê kesb û bêkar e (X.)
b- Wê bêkesb û wê bê kar e (Zinar)

41.
Eya bê kesê bê xîr e [116]
Yeqîn eqlê te texsîr e[117]
Te ya can da bi ya pîr e [118]
Tu dest jê berde sehhar e [119]

42.
Dilo ya pîr bi kêr nayê [120]
Eger aqil û zanayê [121]
Mebe yoldaşê dunyayê [122]
Ne yoldaşek wefadar e

43.
Dinê xelqno bi kê maye
Belê qenc e û mezra ye
Ji xêran ra Xwedê daye
Xebatkar bin ku ev car e [123]

---

116. Eya bêkesb û bê xêr e (A.)
117. a- Eger eqlê te tehsîr e (X.)
b- Eger eqlê te teqsîr e (Z.)
c- Yeqîn eqlê te teqsîr e (Zinar)
118. Tu ya can ne de b'ya pîr e (X.)
119. Desta jê berde ya sar e (X.)
120. Dilo ya pîrî kêr nayê (Z.)
121. a- Eger eqlê û sewda yî (Z.)
b- Eger eql î û zana yê (Zinar)
122. Nebe aldaşê dunyayê (Z.)
123. Gelo ya pîr bikêr nayê
Lew ya qenc e ku mezrayê
Ji xêran ra Xwedê daye
Xebatê b'kin ku êvar e

44.
Du car nayête dunyayê [124]
Çelapa xweş herro nayê [125]
Bikêr qûtê xwo zanayê [126]
Niha ew qût dibit çare [127]

45.
Tu qûtê xwe niha çar ke [128]
Zewadê axretê kar ke [129]
Bilezîne, û zû kar ke [130]
Dinê sûk e û bazar e

---

124. a- Du çar naête dunyaê (X.)
b- Du cara nayî dunyayê (Zinar)
c- .... nayê tu dunyayê-
125. a- Cewaba xweş hero nayê (X.)
b- Çelapa xweş heroz nayê (Z.)
c- Celaba xweş heroj nayê (Zinar)
126. a- Bigire qûtê xwo tê zayê (X.)
b- Bigire qûtê xwo sar narê (Z.)
c- Bigir qûtê xwe zanayê (Zinar)
d- Bigire qûtê xwo vê rayê (H.)
127. a- Niha ew qût e bêçar e (X.) H.
b- Niha ew qat bêçar e (Z.)
c- Niha ew qûtê dibe çare (Zinar)
d- Niha ew qûtê bêçare (X.)
128. Tu qûtê xwo niha kar ke (X.)
129. a- Zewada axîret kar ke (A.)
b- Zewada axretê kar ke (Z.)
130. a- Bilezîne û dê bar ke (X.)
b- Bilezîne zû bar ke (Z.)
c- Bi lez bîne û zû bar ke (Zinar)

46.
Dinê şehr e dinê sûk e
Dinê pîr e ne nûbûk e
Heçî mêrê ku ew şû ke [131]
Girî girt û niha xar e [132]

47.
Te ew xwarin hemî yekser [133]
Neda kes ta nuqtek mefer [134]
Ji Adem heta Pêxember
Veşartî cumle yekcar e

48.
Eya xelqê kerr û gîr e
Ne ya can e ne ya pîr e
Qebûl nakim ji wî mîre
Vi Adem ra nebû ware [135]

49.
Ne Adem ma û ne Şîs ma [136]
Ne Nûh ma ne Îdrîs ma
Ne Yûsuf ma ne Cercîs ma [137]
Ne Eyyûbê birîndar e

---

131. a- Heçî mîr e ku ew şûk e (Z.)
b- Herçî mîr e ku pê şûk e (X.)
132. a- Girît girt û nehat xare (Z.)
b- Ku rêgirt û nesîbxwar e (Zinar)
133. Nehat xwaran hemî yekser (Z.)
134. a- Nedayê kes qet tu mefer (X.)
b- Nedayî qet tu kes mefer (Zinar)
135. Ev çarîne di pirtûka Zinar de nîn bû.
136. Ne Adem ma û ne Şîs ma (X.)
137. Ne Yûnis ma ne Cergîs ma (X.)

50.
Ne Yehya ma ne Salih ma [138]
Ne Harûn ma ne Mûsa ma
Ne Meryem ma ne Îsa ma
Ne Ehmed ma ne çaryar e [139]

51.
Ne heval man ne çaryar man
Ne eshabê di xemxwar man
Ne 'alimên di hişyar man
Ne Calisê wefadar e

52.
Ne Calis û ne Soqrat man [140]
Ne Talis û ne Boqrat man
Ne Zulqerneyn û Mîr'at man
Ne Cumcum ma ne Exyar e [141]

---

138. Ne Eyyûb ma ne Yehya ma (Zinar)
139. Ne Harûn ma ne Mûsa ma
Ne Îsa ma ne Ehmed ma
Ne Miryem ma ne çaryar e (A.)
140. a- Ne Cilinûs ne Soqrat ma
Ne Talînûs û ne Buqrat ma (Zinar)
b- Ne Calîn û ne Soteqrat man (H.)
c- Ne Çalînûs ne Qret man
Ne Tatalêt ne Seqret man
Ne Zulqerneyen û mur'et man
Ne Cemacin û exyar e (X.)
141. a- Ne Cemacin û exyar e (X.)
b- Ne cumcum ma ne exbar e (Zinar)

53.
Ne Eflaton û Loqman man
Ne Dawid û Suleyman man
Ne Fi'rewn û ne Haman man
Ne sultanê di kubar e [142]

54.
Ne Cemşîd ma ne Rustem ma [143]
Ne Qeyser ma ne Hatem ma [144]
Ne Asef ma ne Xatem ma
Ne malxwo ma ne serkar e [145]

55.
Ne serkar ma, ne serdar ma
Ne yoldaş ma, ne heval ma
Ne Harût ma, ne Marût ma
Di axê mane ruxsar e [146]

56.
Ne Talût û ne Calût man
Ne Harût û ne Marût man
Ne ewladê di Ye'qûb man
Ewê pîrê Yûsif xare

---

142. a- Ne xindkarêt li ser kar e (X.)
b- Ne ew malxe li ser kar e (H.)
143. a- Ne Cemşîd ma ne Cimcim ma (X.)
b- Ne Cemşîd ma ne Camcem ma (Zinar)
144. Ne Qeys ma ne Hatim ma (H.)
145. Ne sultanêd di kubar e (X.)
b- Ne malxwar ma ne serkar e (Zinar)
146. Ev çarîne di pirtûka Zinar de leng e, ya kêm e.

57.
Ne xalib ma, ne mexlûb ma
Ne talib ma, ne metlûb ma
Ne ewladê di Ye'qûb ma
Kefa behrê Yûsif xare

58.
Dinê pîr e, ne me'qûl e
Ew pê xor e ya milxûl e
Ew piştqur e, sifetxûl e
Qewî teng e, deng heftar e [147]

59.
Ji heftarê di lêvşûr e
'Ecûz e kevn e devkûr e [148]
Hevûreng e hiştin pûr e
Heçî vêket ewê xware [149]

147. a- Dinê pîr e ya me'qûl e
Ya pîr xar e ya me'qûl e
Ya xaîn e ya pîr şûl e
Wekî gurg û heftiyar e (H.)
b- Dinê pîr e û me'lûl e
Ewa pêxwar û milxwûl e
Û piştgor û sifetxwûl e
Qewî tehl e rengheftar e (Zinar)

148. a- Ecûz e tew ya devgûr e (H.)
b- Ecûzkevn e û devkûr e (Zinar)

149. a- Heçyê têket ewê xar e (H.)
b- Hev û reng e heşînpor e
Heçî veke ewî xwar e (Zinar)

60.
Heçî vê ket ewê xwarin
Ger 'amîn e ger kesar in
Hemî j'ber te bi hawar in
Eya xûlo te xel xwar e. [150]

61.
Eya xûla beyabanê
Heşîm xelqê me dî kanê
Te xwarin pir di vê xanê
Ne sultan man, ne xwunkar e [151]

150.Heçî vêkis ewî xwarin
Eger alim di kubar in
Hemî ji bo te xemxwar in
Eya ewrê te xwînxwar e (Zinar)

151 .a- Eya xelqê beyabanê
Xelqê me dît hemî kanê?
Hemî çûne li wê xanê
Ne siltan mane ne xindkar e (X.)
b- Tu wî xola beyabanê
Heçî xelkê te dî kanê
Tu ....bo di vê xanê
Ne siltan ma ne xwundkar e (Zinar)

62.
Ne xwundkarê xûdantext man
Ne kubbarê xûdanbext man
Ne kuffarê xûdansext man
Tu yî Îsa ku neyhar e [152]

63.
Dinê pîr e ku Îsa dî
Bi şiklê wê nebû razî
Telaq dabû li nik qazî
Ji serdanê serhefsar e [153]

64.
Bi wê sonda me pê xwarî [154]
E'ser nakim serhefsarî
Tu ew pîs î tu ew ar î [155]
Te ne şikl e, ne dîdar e [156]

---

152. Ji wê Îsa ku neyar e (Zinar)
153. a- Telaq dabû li ber qazî
Ser deynabû ser hevsar e (A.)
b- Telaq dabû li ber qazî
Denanî sert û hefsar e (Zinar)
154. a- Bi wê sînda ku min pê xwarî (X.)
b- Bi wê sînda ya min pê xwarî (X.)
c- Bi wê sondê me pê xarî
Bi ser nadim tu hefsarî (Zinar)
155. a- Tu ya pîs î tu efar î (H.)
b- Tu ya pîs î ya fe'ar î (X.)
156. Te ne şikl e û ne dîndar e (X.)

65.
Dinê bûka Ebû Cehl e
Li nik me ‘asiyan nehl e [157]
Bi ‘eqlê ‘aqilan tehl e
Li nik Îsa ku mirdar e

66.
Dixum sondê bi bab Adem
Bi Încîlê kelam dadem [158]
Êdî meylê bi te nadem [159]
Te ne ‘eql e û ne iqrar e [160]

67.
Ruhê Îsa Xwedê kes kir
Dinê nas kir û jê bes kir [161]
Muşerref bû bi wê hes kir [162]
Di nêv xelqê xwe vavar e [163]

---

157. Li nik me amiyan nehl e (Zinar)
158. a- Bi Încîlê kefa dudem (A.)
b- Bi Încîlê kefan dadem (Zinar)
159. Êdî ehdê bi te nadem (H.)
160. a- Te ne ehd e û ne qerar e (X.)
b- Te ne ehd e ne iqrar e (Zinar)
161. Dinê nasî û jê bes kir (X.) Zinar
162. Mucerred bû xwe jê hifz kir (A û Zinar)
163. a- Di nêv xelkî xwo vavar e (A.)
b- Di nêv xelkê xwe .... (Zinar)

68.
Kesê 'eql e kesê merd e
Di ber ku hêj ne bû erd e
Ji vê, meyla xwe jê berde
Çira ax mak e, qehar e [164]

69.
Dinê mehd e, dinê mak e
Dinê teng e, dinê xak e
Bi ewladan ebed nake
Ewa bêrehm û dijwar e [165]

70.
Wa bêrehm û bêhin teng e
Heroj qal e, heroj ceng e
Dema lêxe xwe ew deng e
Ne dilsoj e, ne xemxwar e [166]

---

164. a- Kesê ehd e kesê merd e
Dibe ku hêj ne bû mehde
Heq e meylê jê berde
Çi reng kehmekê qehar e (X.)
b- Di ber hêj neban erde
Heq e meylê ji wê berde (H.)
c- Di pirtûka Zinar de ev çarîne leng e.
165. Dinê tîn e dinê xak e
Dinê mehd e dinê mak e
Ve ewlada ebed nake
Ya bêrehm e ya xemxwar e (X.)
166. a- Dinê bêrehm û dilteng e
Beya mal e xerîleng e
Hero qal e hero ceng e
Ya bêrehm û ya dijwar e (X.)
b- Ew e bêrehm û bînteng e
Heroj herb e heroj ceng e
Di malê xwe ....ev reng e
Ne dilsoj e ne xemxwar e (Zinar)

71.
Ne xemxwar e ne dilsoj e
Ji wê bayê di reng roj e
Bi wan halan ker û gêj e
Bel awa tê û seyê har e [167]

72.
Bel awa tê û seyê dîn e
Dinê kevn e ji mêjîn e,
Heroj dor e, heroj kîn e [168]
Ne wey meyl e ne guşdar e [169]

---

167. a- Ya berêhm e ya dilsoj e
Ji wan rengêt bebê doj e
Bi wan halan gul û goj e
Belewatêt heyê har e (X.)
b- Dinê bêrehm e dilsoj e
Ji wan babêd rengêd·doj e
Bi wan xalan kul û goş e (H.)
c- Ne dilsoj e ne dilsoj e
Ji wî bayê di reng doje
Bi wan halan kerr û gêj e
Belawat û sehê har e (Zinar)
168. Heroj derd e heroj kîn e (Zinar)
169. Ne meyldar e ne guşdar e (Zinar)

73.
Heroj koç e heroj çûn e [170]
Li ba l'me hilgirtin kûn e
Di nêv qebran vedajone
Li wê kirişte izhar e [171]

74.
Di xurşîd û di axê da
Heroj carek binêr pê da
Ku razane di axê da
Di xamûşê di bêçar e [172]

---

170. Hero bar ken hero çûne (X.)
171. a- Heroj koç e çûn e
Ji dor ma hilgirê kon e
Bi bal qebrê ku dajone
Li wê ger baş kir îzhar e (Zinar)
b- Weku xîret heyê har e (X.)
172. a- Hero carek binêr tê da
Ku di razayîne axê da
Hemû xamûsêt bêçar e
b- Li wê ger boş ewê tê da
Heroj carek binêr pê da
Ku razane di axê da
Di xamûşê di bî car e (Zinar)

75.
Di xamûşên di razayê
Di mehcûrên ji dunyayê
Çewa dengek ji wan nayê
Ji wan fikran Feqê jar e [173]

76.
Ji wan fikran heq e jar în
Heya kengî ne hişyar în
Tirsim birîn gunehkar în
Dibê tobe û îstîxfar e [174]

173. a- Hemû xamûş di razayî me
Bi wan fikra vi veşarin
Bi van fikran Feqê jaran
Dibê tewbe û îstixfar e (X.)
b- Hemû xamûş di razayî
Di me'zûl în ji dinyayî
Çira dengek jara nayî
Ji wan fikra veşare (H.)
c- Di xamûşê di razayî
Çira dengek ji wan nayî
Di axê mane wendayî
Ji wan fikran Feqî jar e (Zinar)

174. a- Ji van fikran feqîr jar bin
Heta kengî ne hişyar bin
Neke bimrin gunehkar bin
Dibê tewbe îstîxfare (H.)
b- Ji wan fikran heq e jar bin
Heta kengê ne hişyar bin
Tirsim bimrim gunehkar bin
Wê bêtewbe îstîxfar e (Zinar)

77.
Hero çend car bibê tewbe
Di ber ku hêj nehat newbe
Dilo hişyar e bê xew be
Ne heval man, ne serdar e [175]

78.
Em hemî pê pê hevalan
Dê lazim çîne wan malan
Demek razîne wan çalan
Dê li ser me bit xubar e [176]

---

175. a- Hero sed car bike tewbe
Direng e hêj nebû newbe
Dil hişyarbûn dibê xew be
Ne hevrî man ne hevyar e (X.)
b- Herjo sed car bikeyn tewbe
Di ber ku hêj ne bû fewde
Di hişyar în tu bêxew be (H.)
c- Heroj carek bibe tewbe (Zinar)
176. a- Em di pê wan hevalan
Yeqîn dê biçîne wan malan
Ew çend razên di wan çalan
Heya bê ser me ka xware (X.)
b- Lazim dê çîn wan malan
Gelek razîn li wan çalan (H.)
c- Emê li pey wan hevalan
Yeqîn dê biçne wan malan
Hew ca razên di wan çalan
Heta bê ser ....xar e (Zinar)

79.
Em biçîn heval bimînin [177]
"Mîm û Hê" bîra xwe bînin [178]
Fatihan jê ra bixwînin [179]
Hewce û der întîzar e

80.
"Mîm û Hê" heftê felek çûn
J'hicretê dewran gelek çûn
Sal hezar û çil û yek çûn
Ev xezel anî diyare [180]

---

177. a- Em dê çin ewlad dê mînin (X.)
b- Emê biçin heval mînin (Zinar)
178. "Mîr Mihê" bîra xwe bînin (H.)
179. a- Fathan jê ra bixwînin
Hewceyîn der înîtîzar e (H. X.)
b- Ev çarîne di pirtûka Zinar de ya kêm e û malka dawiyê tê de nîn e.
180. a- Mîr Mihê heftê felek çûn (H.)
b- Mîr Miho her heft felek çûn- (Xid)
c- Li Mihemed heftê felek çûn (S.)
d- Li Mîm û Hê gelek çûne
Gelek sal û felek çûne
Hezar sal û çil û yek çûne
Ji hicra Nebyê Muxtar e (Zinar)

Îlahî Lew Dikim Zarî

1.
Îlahî lew dikim zarî
Di nav rojan şeva tarî
Zunûba min tu xemxwarî
Gunahê min bixufranî

2
"Mîm û Hê" pirr gunehkar e
Belê navê te xeffar e
Ez im pirr muflis û jar e
Bi e'ta û fedl û îhsanî

3
Ji neş'a badeya saqî
Dilê mecrûh û şeyda ye
Ji şewqa dîtina saqî
Zemîra min mucella ye

4
Were sofî misliman be
Bi saqî secdeyê bîne
Ku sûret mezherê zat e
Sifatê Heq Teala ye

5
Seher her rojê meyxanê
Xerab û serxwoş û mest im
Mela uzra me meqbûl e
Ku dilber mahê sîma ye

6
Dilo erînî neke gazî
Cewaba "len tera" sazî
Meke fikrê ji Mûsa yî
Dilê min Tûrî Sîna ye.

Şêx Sen‘an*

1.
Guh din vê nutqê aşiqan [1]
Da ez bixwînim vê xetê
Hemd û senayê Xaliqî [2]
Subhan ji şahê qudretê

2.
Subhan ji şahê zulcelal
Fikrê me neqşê bê zewal
Hal bêmecaz naête bal
Kamil dibî b'ulfiyyetê [3]

3.
Ew dê bi vê kamil bitin [4]
Derwêş ku sahibdil bitin
Dê nûr ji nûrê hilbitin
Ji meş‘ela nubuwwetê

---

* Ev destana ji destnivîsa Zeynelabidîn Amêdî hatiye stendin û bi ya Zerî Rûdenko (R.) hatiye muqayesekirin.
1. Guh bidêrin niqtê aşiqan (R.)
2. Hemd û senaya Xaliqê
3. Kamil dibin bi ulfetê
4. Ev çarîna di pirtûka R. de nîn e.

4.
Qelbê ku hal tê ra bitin [5]
Yan dê j'Resûl peyda bitin
Hal bêmecaz qet nabitin
Carî bûye l'vê adetê

5.
Carî bûye ev reng bela [6]
Sed muftî û şêx û mela
Ew bi surrê bûn mubtela [7]
Ji neynika ‘eksiyyetê

6.
Ji Me‘neya ‘eksê dibî [8]
Ellah ji cih naqelibî
Me‘bûd yek e nabê du bî
Roj hate nîva mir’atê

7.
Qemer û şems û sitar e [9]
Roj di nêv avê diyar e
Find û fanusê veşare
Ji beşera xelqiyyetê

---

5. Ev çarîna di pirtûka R. de nîn e.
6. Kamil dibin ev reng bela
7. Ew li sirrê bûn mibtela
8. Ji neynika ekso dibê
   Esl e ji cî naqelibê
   Mehbûb yek e nabe dudê
   Îlla ka şahê hikmetê
9. Ji vê çarînê heta çarîna 21, anku; 7, 8, 9, 10, 11, 12, 13, 14, 15, 16, 17, 18, 19 û 20 ku tev çarde çarîn in, di pirtûka Rudenko de nîn in.

8.
J'beşera zat û sîfatan
Pirr ji işqa mubtelatan*
Ketme behra muşkîlatan
Çûme halê heyretê

9.
Tu îlahê dîndurustan
Tu îmamê pûtperestan**
Dilberê hişyar û mestan
Xaliqê purr wesfetê [10]

10.
'Aşiq tu yî dilber tu yî [11]
Nazir tu yî menzer tu yî
Ruh û beden gewher tu yî***
Misbah û nûra qîmetê

11.
Rûh û rewan pir beşer î
Aşiq û me'şûqê berî
Ew li surrê bûn muşterî
Sahibdil î nûr vêketê

---

* Rûhê ruhan...

** Ney îmamê pûtperestan.

10. Di vê destnivîsa Amedî de carcaran hinek peyvên guherî anko ferq û cudahî hene, wekî li cem peyva "Xaliqê" Aşiqê" jî heye. Herwesa li gelek ciyên din ev cur ferq û cudahî hene. Em dê van nivsin lê bê remz. Wekî Xaliqê...û hwd.

11. Aşiq tu yî dilber tu yî.

*** Pur ji işqa but û latan.

12.
Dil kewkeb e mexlûqek e
Leş qefesê sundoqek e
Qelban xerez me‘şûqek e
Hemyan divê wehdanetê

13.
Hemyan murad eslê xwe ye
Ten sedefa canê me ye
Ruh perdeya nûra te ye
Hewl û quwet ji bal te tê

14.
Ruh bê te qet-qet nalivîn
Zulfê di şeng ser nacivîn
Agir bi qelban nakevîn
Narê mecaza hirqetê

15.
Meyla mecaz beşer divê
Dil daîma dilber divê
Ruh muhbeta ekber divê
Carna dibînin ru’yetê

16.
Çeşman cemala geş divê
Enfan reyhana reş divê
Uznan xu sewta xweş divê
Cî cî dikêşin wesletê

17.
Ew uzn û enf û beser e
Hemya xeyala ekber e
Cismê mecazî fener e
Dêm şûşe ye nûra te tê

18.
Dêm şûşe ye nûr qefes e
Mecaz ne işq e hewes e
Dil ji surrê naket bese
Can ji meya meweddetê

19.
Qet bê hubê xêr nabitin
Mîr bêhisab mêr nabitin
Can ji meyê têr nabitin
Dil bê zikir nûr nadetê

20.
Zikrê civata bê melek [12]
Sed car bikin, amî gelek
Şubhê te'amê bênemek
Dûr e ji zewq û lezzetê

12. a- Ev çarîne di pirtûkê de çarîna şeşê ye.
b- Zikrê civatan bêmelek

21.
Zikrê wacib e ‘amî bikin [13]
Nêzîkî şeyx sofî bikin [14]
Murşîd murîdî hî bikin [15]
Xaric bikin ji zulmetê

22.
Işq bê îbadet nabitin
Hetta mehebbet nebitin [16]
Hal û helawet nabitin
Îzhar bikin behsiyyetê

23.
Me d'vê qisan îzhar bikin [17]
Behsa ji kar û bar bikin
Yar û biran hişyar bikin
Da em ji şeyx din qissetê [18]

24.
Şeyxek hebû çaxê ewwil [19]
Nûra Xwedê hilbû ji dil
Sed kumreh û zalim, mudil
Bi destê wî tên tewbetê

---

13. Zikr wacib e amî bikin
14. Nêzîk şêx û sofî bikin
15. Murşîd mirîdan hîn bikin
16. Hetta ko ta‘et nebitin
17. Ez dê qisan îzhar bikim
18. Da em ji şêx kin qissetê
19. Ev çarîne di R. de nîn e.

25.
Şeyxek hebû Sen'aniyan
Çûbû meqamê ewliyan [20]
Serdarê pênsed sofiyan
Daîm di zikr û ta'etê

26.
Ta'et dikir vêk ra bi coş [21]
Pênsed murîdê xirqepoş
Bi muhbet û zewq û xiroş
Bi şewq û halê cezbetê

27.
Cezbe çi remzek cefî ye [22]
Mebde' çi halek xafî ye
Têtin bi dil da tavî ye
Mewcê di behra hikmetê [23]

28.
Me'na di meczûban evîn [24]
Murîd di batin da xufîn
Ew hal dibînin dikevîn
Xelqno birin ji taqetê

---

20. Ev malke û malka li dû tê di R. de cih guherîne.
21. Ta'et dikir vêk ra bi coş
Pansed mirîdê xirqepoş
Bi muhbet û eşq û xiroş
22. Cezbe hub e hub çavî ye
23. Mewcek ji behra hikmetê
24. Mane ji meczûban evîn
Mêrê dibatin dixevin
Nuhal dibînin dikevin
Xelqo ji çi kim taqetê

29.
Cezbe surre ser xatem e
Girtin li mêran lazim e
Cîger qewî bit qaim e
Îzhar bikin vê şohretê

30.
Dunya t'jî bû j'muste'idan [25]
J'me'neya şiîr û qesîdan
Bêne ser behsa murîdan
Lê em ji şêx kin qissetê

31.
Şeyxek hebû cara ewil [26]
Nûra Xwedê hilbû di dil
Sed munkir û dall û mudil
Bi dest wî hatin tewbetê

32.
Sen'aniyan şêxek hebû
Ew aşiqê baxwoy xwe bû
Qet meyl bi dunyayê nebû
Dûr bû ji vê meşxeletê

25.Tê ji boro misteîdan
Ji germiya şiîr û qesîdan
Bîne ser behrê mirîdan
Da em ji şêx kin qissetê
26. a- Ev çarîne rengêçarîna 24ê dide.
b- Ev çarîne di pirtûka R. de nîn e.

33.
Dûr bû ji vê dunya denî [27]
Pur digirî kêm dikenî
Kul bû ji ber secde, enî
Di karê roja axretê [28]

34.
Wî her zewade kar dikir
Zikrê di bêhejmar dikir [29]
Wî xwo j'dinê bêpar dikir
Dûr bû ji herçî şubhetê

35.
Dûr bû ji efa'lê bi şik
Ji emred û bikra xweşik [30]
Ma kes xeberdanek li nik!
Naket qebûl wê xeybetê

36.
Naket qebûl van xeberan
Medhê ciwan û dilberan
Ma kes xeberdanek mêran [31]
Behs û qissa menhiyyetê

---

27. Dûr bû ji vê dunya fanî
28. Di karê zewada axretê
29. Zikrekî bêhejmar dikir
   Ji dinyayê îstixfa dikir
   Dûr bû ji her çi sibhetê
30. Ji Emred û Bekr xosik
   Ma kes xeberdaneki li nik
31. Ma kes xeber nakit pê ra
   ....surran
   Xerîb Xwedê û pêxemberan

37.
Dûr bû ji ber menahiyan
Ned'hate 'îd û şahiyan
Ji şevselat û xêriyan [32]
Şîrîn dihate ta'etê

38.
Ta'et dikir daim mudam
Geh ji qu'ûd geh ji qiyam
Heftê û heft salê temam [33]
Xalî nebû j'vê xizmetê

39.
Her xizmeta mewla dikir [34]
Zikrê mezin jipê dikir*
Daim xelqê jê çê dikir [35]
Anîne ser hîdayetê [36]

40.
Her çî li Şêx guhdarî bû [37]
Axret bi wî ra yarî bû
Dunya di çehvan sarî bû
Ji pend û we'z û şîretê

---

32. Ji şerma selat û çêyiyan
33. Heftê û heft salî temam
34. Her xizmeta bo xwo dikir
35. Bi çêhiyan xelqê çi dikir
* .... pîyandikir (A)
36. Danî riya hidayetê
37. Her çî li Şêx guhdar dibû
Dinya li çavan sar dibû
Axret bi wîra yar dibû
Ji we'z û pend û şîretê

41.
Şîret û pendê hekîman [38]
Xeberê pîrê ‘ezîman
Beldeyê ehlê helîman
Kes nizanit qîmetê

42.
Der li nik ehlê mulûkan *
Ger here şehrê buçûkan [39]
Kes buha naket li sûkan
Yek hebek çih pê netê [40]

43.
Ma bi dev tête xeberdan [41]
Çêheya wan şêremerdan
Xweş dikin janan û derdan
Herkesê ew pufketê

---

38. Şîret û penda hekîma
Xeberê pîrê ‘ezîman
Dilberê ehlê helîman
Kes ne dikit qîmetê
* Durr li nik ehlê milûkan (B)
39. Ger bîne şehrê biçûkan
40. Yek bi yek cî’na ditê
Yek li hebek ceh pê netê
41. Ma bi dev têne xeberdan
Çêhiya wan şerêmerdan
Xweş diket sed jan û derdan
Herkesê şêx pif ketê

44.
Herkesê Şêx lê bixwînê
Nexweşê hal tê nemînê
Bi du'an daket vejînê [42]
Lê ricû' ket sihhetê

45.
Dîniyek tirsek hewayek
'Illetek rîşek webayek
Şeyx li ser bikra du'ayek
Xweş dibû wê sa'etê [43]

46.
Pê xweş dibû sed lal û şil [44]
Pê ron dibû sed çav û dil
Pê rast dibû dal û mudil
Ey ku sirra Şêx vêketê

47.
Nezera Şêx kîmiya bû
Pak wucûd û bêriya bû
Ehlê dil bû ewliya bû
Şey'ên lillah liber ketê [45]

---

42. Bi du'an radiket ser jînê
Lê ricû' diket sihhetê
43. Sax dibû di wê sa'etê.
44. Xweş dibûn pê la û şel
45. Şeylellah ji wê bereketê

48.
Şey'en lillah ya Şêx ekabir [46]
Qutbullah berkete hazir
Li xaib xelqê musafir
Li muellif vê sohbetê [47]

49.
Sohbeta Şêxê reşîd tê [48]
Meclisa pênsed murîd tê
Têk mela û muste'îd tê
J' melek û milyaketê

50.
Melekê can ji hewayê [49]
Difirin şubhetê bayê
Têne nêv zikr û semayê
D'weqt û hîna dawetê

---

46. Şeylellah ya şêx Ekabir
    Qutb Ellah bereket hazir
    Li xayib û xelqê misafir
Li me û ve suhbetê
47. Suhbeta şêx redidî
    Meclisa pansed mirîdî
    Tê tev mela û musteîdî
48. Ev jêrenot nexuya.
49. Melek û cin ji hewayê
    Difirit şubhetê bayê
    Tête nêv zikir û semayê

51.
Her dema xutbe dihate [50]
Germ dibûn zikr û civate
Keşf dibûn jê mu'cizate
Herwekî roj daketê

52.
Wî demê derwêş bi coş bûn [51]
Meclis û sohbet di xwoş bûn
B'mihbet û işq û xiroş bûn
Ji şahiyan kes xew netê

53.
Wê dema dewran di çê bû [52]
Kê xema mîran di bîr bû
Hemiyan meyla Xwedê bû
Ew cehda rê ketê

---

50. Her dema ko xutbe dihate
Germ dibû zikr û civate
Kifş dibûn jê mu'zate
51. Wê perhê derwêş bi coş bûn
Suhbet û meclis di boş bûn
....
Ji şahiyan qet kes xew netê
52. Wê pêlê dewran diçûn
Kê xema mîran diyî bûn
Hemyan di meyla Xwedê bûn
Cehda dîn diketê

54.
Ez xulam bûm ez emîr bûm
Ez geda bûm ez feqîr bûm
Têk û vêk guhdarê pîr bûm
B' işqa dîn û sinnetê [53]

55.
Şêxê serdarê xelîfan
Nazik û ciwan letîfan
Z'yareta qamet elîfan [54]
Nefs diket jê nefretê

56.
Deftera sahibcemalan [55]
Şerh û metnê zulf û xalan
Ew tu car naket xeyalan
Teb'etê Şêx nadetê

---

53. Er xulam bûn er emîr bûn
Er geda bûn er feqîr bûn
Têk û vêk guhdarê pîr bûn
Li eşq û dîn û sinnetê
54. Ji yariya qametelîfan
55. Ji deftera sahibcemalan
Şerh û metna zulf û xalan
Şêx tucar nakit xeyalan
Teb'etê şêx navetê

57.
Teb'etê husn û cemalan [56]
Şêx tucar nakit xeyalan
Yan ji cebhê yan ji kalan
Yan ji xof û xeşyetê

58.
Daîma dil nalenal bû [57]
Umrekî bêhed li bal bû
Rihsipî bû şubhê kal bû
Kuşt fena bû j'kesretê [58]

59.
Umrekî pirr li cema bû [59]
Yek mûyek reş lê nema bû
Dilberek dît û tema bû
Rohniya fîndê ketê

60.
Rohniya fîndê gihiştê
Horiya bikra bihiştê
Dî li ser banê keniştê
Batinî keç ban ketê [60]

---

56. Teb'etê husna cemalan
    Şêx tucar nakit xeyalan
    Yan ji çêyî yan ji kalan
57. Xeşyetê dil nalenal bû
58. Ew feta bûbû ji qewetê
59. Emrê wî bêhed cuma bû
    Yek muyek reş lê neba bû
    Horiyek dî û tima bû
    Rohniya fendê ketê
60. Dî ku keç ban dikitê

61.
Batinî keç wê vexwînî [61]
Perdeyê j'ber xwe hilînî
Şêx di xewnê da dibînî
Cam û tasek mey didetê

62.
Xemr û şerabê pur diket
Şêx jê di xewnê fir diket
Nezer bi ya dêm der diket
Dîn bû di nîva xelwetê

63.
Ji xelwetê ew dîn dibû [62]
Dimax tijî pirr xwîn dibû
Şeyba sipî rengîn dibû
Ew reng û hal qet jê netê

64.
Nayêt ji şêx ev hal û reng
'Eyb e ji wî ev nav û deng
Dîn bû ji ber zulfgê di şeng [63]
Ebter bi dunyayê ketê

---

61. Batinê keç vedxwûnê
Perde ji ber xwe hiltîne
62. Di nêva xexwetê ew dîn dibû
Tijî dimaxê xûn dibû
Şehba spê rengîn dibû
Ev hal û reng qet jê netê
63. Pirr coş dibû ji ber zulfêd şeng

65.
Zulfan gelek ebter kirim [64]
Cerg û hinav ker-ker kirim
Pêçam di Şamê werkirim
'Ebdal di sûka xurbetê

66.
Ji çeşmê reş dîn bûn gelek [65]
Jê kin kevanê reşbelek
Feryad ji Şêx çûne felek
Ah û fîxan behs jê netê

67.
Ah û fîxan dûr bûn hezar
Hingî hebûn derwêş û yar
Hemyan li Şêx kir pirsiyar
Bajar û ehlê Hêşetê

68.
Ehlê terîq ehlê sulûk
Hingî mezin hingî bicûk [66]
Axa û xoce û mulûk
Pirsîn l'Şêx wê sa'etê

---

64. Zulfan gelek ebter kirin
Cerg û hinav ker ker kirin
Bêcan di şamê wer kirim
65. Ji zulfê reş dîn bûn gelek
Kezma kevan reş helek
Feryadê şêx çûne felek
Ax û fîxan hiş jê netê
66. Herçi mezin her çi biçûk
Axa û xewwar e û milûk
Pirsîne li şêx zehmetê

69.
Herçî li Şêx pirsyar dikir
Zikrek di xweş mader dikir [67]
Li adetê hercar dikir
Şêx îltifat qet pê netê

70.
Şêx gote wan qir qir mekin
Zikrê xwo îro purr mekin [68]
Keyfê li min bê surr mekin
Xweş nîne sewta ji we tê

71.
Xweş nîne sewta zahidan
Dengê murîd û ‘abidan
Çi b’kim ji zikr û mescidan
Bi î‘tîkafa mizgeftê [69]

72.
Dê mizgeftê wêran bikim
Pêlek biçim seyran bikim [70]
Bur pê derê dêran bikim*
Kanê ku tê badê di tê [71]

---

67. Zikrekê xweş madar dikir.
68. Zikrekê xwe îro pirr mekin
69. Bi êhtkafa mizgeftê
70. Dê mizgef wêran bikim
    Ber bi derê dêran bikim
    Biçim gavek seyran bikim
    Binê dinya çavan lê tê
* b- Qesta derê dêran bikim
    Kanê ku tu bayê dinî
71. Bayê demê ji kû ve tê

73.
Kanê ku tê ba dêdemê [72]
Derwêş qewî ketne xemê
Pansed murîd civyan hemê
Fikrîn li Şêx vê teb'etê

74.
Teb'etê xelqê û 'amê
Xweş dibin l'zikr û siyamê [73]
Xafil in j'halê meqamê
Ji wîsal û lezzetê

75.
Natiqê teb'ê dewarî
Ê muqîm şorbe vexwarî [74]
Qet nedî ava bijarî
Çeşmeya hazir vêketê [75]

---

72. Dayim ku tê bayê dinê
Derwêş hemî ketne xemê
Pansed mirîd civyan hemî
Fikrîne şêx tebiyetê
73. Xweş dibû bi zikr û siyamê
Xafilê ji hal û meqamê
74. Ê muqîm şorav vexwarî
75. Çeşmeya Xidir vêketê

76.
Çeşmeya şîrîn zuhûr e [76]
Hal ji qalib bêhed dûr e
Min mudem behrekî kûr e
Kes bi ‘ilmê rê nabetê

77.
‘Ilim terîqa aqilan [77]
Halê ne mewca xafilan
Babetê ehlî û dilan
Mîr di bitin dere tê

78.
Mîr hakim e pê dizanî [78]
Şêx tebat nayê di xanî
Xelîfe hatin dihanî
Hîn li Şêx kin nesîhetê

---

76. Çeşmeya sofî tehûr e
Halê ji qalê bêhed dûr e
Min ledûn û behrekê kûr e
Kes bi ilm rê nabetê
77. Ilim terîqê aqilan e
Hal ne mewcê xafilan e
Babetê ehlê dilan e
Mêr di bînê diditê.
78. Mîr hekîm pê dizanê
Şêx tebêt nayê di xanê
Xelq hatin di hanê
Çin li şêx kin nesîhetê

79.
Kes nehin cuz'ek di dest ne
Surr neh in perde qefes ne
Kes neh in hewceyê kes ne
Bi qedrê halê hîmmetê [79]

80.
Ew sofî sahibkemal e
Bêtekelluf çûne bale
Jê kirin hal û hewale [80]
Ev çi tirs e bi ser te tê

81.
Ev çi hal e ev çi derd e [81]
Dora te nîn e çu perde
Vê sirrê bo me xeber de
Da bizanîn hikayetê

79. Bi qedr û hal û himmetê
80. Hemyan jê kirin suale
Ew çi tirs e bi ser te tê
81. Ev çi hale e ev çi derd e
Me û te nîn e çu perde
Vê sirrê ji bo me xeber de
Da em bizanin hey'etê

82.
Sofî bi erkan û şerm e [82]
Şêx demek axift ji berme
Vê surê keşf ke li ber me
Da em dewa kin 'illetê [83]

83.
Şêx go hekîm Îsa bitin [84]
Loqman ji qebrê rabitin
Daxa min sakin nabitin
Destê hekîman lê netê

84.
Daxa perinkê muhr li ser [85]
Hetta spêde bête der
Aram û xew nayêt ji ber
Sebr û sikûna min netê

85.
Şêx li xwo naket sitaran
Aşkera wî gote yaran [86]
Ah j'dest dohta kufaran
Bir me dînê şirketê [87]

---

82. Sofiyan barekan û şerm e
83. Da dewa kin illetê
84. Go hekîmê Îsa bitin
85. Daxa perengê sor li ser
Hetta sipîde bête der
86. Eşkera xwe gote yaran
87. Bimre dînê şirketê

86.

Bê mezheb û bê dîn kirim
Bêxwendin û yasîn kirim
J'yar û biran şermîn kirim
Wirdek xiyala min netê

87.

Lew neşêm werdan bixwînim
Bejnekê nazik dibînim
Dîn dibim sewda dimîmin [88]
Dil ji min bir wê qametê

88.

Qameta sekran û mestan
Horiya lu'lu' di destan
Birme dêra xaçperestan
Xelweya xumxane tê

89.

Birme nê xemr û şerabê
Nazika gerdenşebabê
Wê dikir sed reng xerabê
Ji nû hebû bedxusletê [89]

---

88. Dîn dibim wer dimînim
89. J'newahî û bedxisletê

90.
Hem nû kirim hem bed kirim
Îsewî û murted kirim [90]
J'terîqetê ez red kirim
Kafir kirim bê murwetê

91.
Kafir kirim meyxwer kirim
Dîwane û ebter kirim
Belkî ji Pêxember kirim [91]
Ev reng bela bi ser me tê

92.
Ev reng bela ev reng birîn
Çi d'kin ji min ya hazirîn
Hemyan bihîst vêk ra girîn
Nalîn kete cema'etê [92]

93.
Kalîn kirin xekê li nik [93]
Ew pîremêr rabû sivik
Ji agir û wehca di zik
Ma bêt hewaya derdetê

---

90. Ko ewê ez Îsayî kirim
91. Balekê ji Pêximber kirim
Ev reg bela li ser min tê
92. Galîn kete cemaetê
93. Galîn kete xelqê li nik
Ew pîremêr dikir sivik
Ji agir û hica di zik
Ta bêne hewaye derdite

94.
Belkî ji mal anîne der [94]
Bê tesbîh û şeml û kemer
Dilq û 'esa çûbû ji ber
Nalîn ji tîra hicretê

95.
Nalî ji dest dêmxawerê
Narê firaqa dilberê
Ateş gihabû cîgerê [95]
Dil bû wekî pêt vêketê

96.
Narê keçê dagirt hinav
Dêma ku tê da nûr û tav
Eksa îlahî daye nav
Mezher bûye ser jê netê [96]

97.
Husna keçê bû mezher e
Ew horiya dêmxawer e [97]
Şêxê dibû cihanper e
Şerm û edeb qet jê netê

---

94. Pêlek ji mal anîne der
Bêtizbî ye şeml û kemer
95. Germê gihande cegerê
96. Mezher diye sebr jê netê
97. Ew horiya dêqemer e
Şêx dîbû cîhan çû bere

98.
Şerm û edeb çûn wê demê
Dîn bû ji işqa sertemê [98]
Bû pêkenînê alemê
Havêt kirasê rûmetê

99.
Rûmet hebû ew bê qiyas [99]
Bayê evînê bir libas
Geh geh ji xwe davêt kiras
Ji agir û heraretê

100.
Işqa keçê germ kir evîn
Pabende kir ew har û dîn [100]
Pur dîn dibû we pêkenîn [101]
Ku b'kin gelo vê qissetê

101.
Ku b'kin ji kê pirsyar bikin [102]
Ev dergehê derman bikin
'Işqa dilê Şêx sar bikin
Peyda bikin burûdetê

98. Nalî ji tîra sertemê
99. Rûmet hebû Şêx bêqiyas
100. Pê dakirin ew har û dîn
Pîr dîn dibin û pê dikenîn
101. Jê der dibin xwîn ji birîn
102. Go bikin ji kê pirsyar bikin
Îlacekê maçar bikin

102.
Işq agir e ma sar dibî?
Hingî diçî dijwar dibî
Şêx pê ze'îf û jar dibî [103]
Çend rojekan ma raketê

103.
Çend rojekan ev terz buhar [104]
Rûniştî xelq li çar kenar
Şêx dîn dimayê bê qerar
Bo berderê mecnûn ketê

104.
Mislê semek têk wer dibû
Geh sor dibû geh zer dibû
Rojê sêcar xwûn der dibû
'Işqê bire wî haletê

105.
Ew pîremêrê kalbûyî
Nêzîkî heştê sal bûyî
J''işqa keçê bedhalbûyî
Derheq bidîn ji lometê

---

103. Şêx jê zeîf û jar dibî
104. Çil rojekan ew hal buwar
Rûniştibû xelq çar kenar
Şêx ne tebit bû ne qarar
Bû masiyê bi dêm ketê

106.
Derheq bidîn çi tê heye
Naxwe li Şêx ev qisse ye [105]
Çi b'kin bi dest baxoy me ye
Îzhar bikin çi tê netê

107.
Îzhar bikin bedname ye
Derheq bidin lê tame ye [106]
Ageh bibin pê ame ye
Hilak dibin ji xeybetê

108.
Ya qenc ew e mestûr bikin
Rabin ji 'amê dûr bikin [107]
Nabit surrê meşhûr bikin
Bi derkevin ji Hêşetê

109.
Ji Hêşetê bi derkevîn
Pansed murîd bi ber kevîn
Pêşber keça dilber kevîn
Zayil bikin vê hesretê [108]

---

105. Nayêt li şêx ev reng qiseye
Guh bidnê bi destê baxwe me ye
Zahir bikin cî tê netê
106. Deheq bidin bêtame ye
107. Nabe sirrê meşhûr bikin
Da bên ji amê dûr bikin
108. Pêş keça dilber kevin
Zayil bikin vê hesretê

110.
Ya qenc ew e em vê bikin
Rabin karê em rê bikin
Qesda derê dêrê bikin
Ku em bikin j'zerûretê [109]

111.
Ku em bikin lazim bûye [110]
Gerçî ne meşrû dabûye
Derman necis bit me'fû ye
Di merteba şerî'etê

112.
Husna keçê wasil dibî [111]
Yan 'arif û kamil dibî
Yan xafil û cahil dibî
Xelas dibin ji zehmetê

113.
Şêxê me şêxek hacî ye
Hemyan keramet jê diye
Me'lûm bibî nefsanî ye [112]
Nakin qebûl vê de'wetê

---

109. belkî derxin ji ber derûretê
110. Komek li me lazim bûye
Ger çi ne meşrû darû ye
Derman necis çi me'fû ye
111. Pê husna keçê wasil bûye
Yan 'arif û kamil dibe
Yan xafil û cahil dibe
Em xelas dibin ji zehmetê
112. Me'lûm dibe nefsanî ye
Nakin qebûl vê 'illetê

114.
Husna hebîban seh bike [113]
Safî binêr zêr û sike
Lê keşf dibî ‘eyb û leke
Bi kêrî îrşadê netê

115.
Em dê b’vê niyetê biçin [114]
Bê puşta ayinê biçin
Nêzîkî dêmpêtê biçin
Kanê ji perwane çi tê

116.
Nêzîkî dêmpêtê bire [115]
Şêxê me ger sahibsure
Teslîm dibe keç bi mi re
Zû bête ser silahetê

---

113. Husna hebîba mehek e
Sofî dibî zêr û sike
Lê kifş dibî ’eyb û leke
114. Em dê bi vê niyetê
Herin pişta ayetê
Biçin nêzîkê dêmpêtê
Da binê dewran çi tê
115. Nêzîk em bibin dewran dor e
Şêxê me ger sahibsir e
Teslîm bibe keçê bi me re
Zû têtê ser silahetê

117.
Wan got xiyala qenc ev e
Hemyan qebûl kir bê xefe
Sofî cemi' bûn bi şev e [116]
Heta stêra su'detê

118.
Hetta bi derkeft muşterî
Cumle cemi' bûn seferî
Ewwel ve rê bûn seherî [117]
Şêx birne nêv ziyaretê

119.
Ser meqbera bavê birin
Hindî murîd û zakirin
Hemyan li wê du'a kirin [118]
Li çar kenarê kunbetê

120.
Destê di xwe perwaz kirin
Wechê di xwe evraz kirin
Îman ji Heq daxwaz kirin [119]
Suwar kirin wê sa'etê

---

116. Sofî bi rev bûn bi şev e
Hetta stêrka se'adetê
117. Ewwel qerîbê seherî
118. Hemyan li wî du'a kirin
Wan çar kenarê kunbetê
119. Îman ji Xwedê daxwaz kirin
Siwar dibûn wê sa'etê

121.
Wê sa‘etê suwar kirin [120]
Zad û zewade kar kirin
Qesda keça kuffar kirin
Ya Reb tu xêr kî niyyetê

122.
Şeyxê me esnam niyyet e [121]
Ya Reb em û ev qisete
Çibkin ku dinya xîret e
Şert e temam kin xizmetê

123.
Xizmeta şertê xulaman
Deftera ‘aqiltemaman
Teb‘etê naehlê xaman [122]
Xeber ji xelqê wan netê

124.
Xelqê ku bed‘eslê şekil [123]
Kezzab û xwar û bed‘emel
Dûrîn ji tuxmê bê‘esil
Tovê xerab bi kêr netê

---

120. Di wê sa‘etê suwar kirin
121. Şêx me esman niyet e
Ya Reb em û ev qiset e
Go bikin ko dinya xîret e
122. Teb‘etê ne ehlê eman
Xêr ji xelkê wan ne tê
123. Xelqê ne ehl û bedşikil
....
Dûr in ji tuxmê bi emel

125.
Tovê bijarê bê ‘illlet
Bavêje erdê bê xillet
Ew dexlekê paqij diket [124]
Ji sunbula zira‘etê

126.
Rast û durst e ev xeber [125]
Şêxê ku şemla kesk li ser
Sahibsurr û nazikbeşer
Ji nutfeya teharetê

127.
Ew murşîdê tahirbeden
Perwaneyê durra ‘Eden
Sofî li ber çerxan diden
J’‘işqa ‘erûsa cennetê [126]

128.
Sofî ji ‘işqa bûne ref
Derwêş li ber Şêx bûne sef
Zikran didin bi çeng û def
Bi deşt û sehrayê ketê

---

124. Ew dexekê paqij didit
Ji simbila zîra‘etê
125. Rast û durust ev xeber e
Şêx ko şemla reş li ser e
Xalis dilê paqijbeşer e
Ji nefteya teharetê
126. Ji eşqa erûsa dawetê

129.
Li deşt û sehrayê diçin [127]
Lew şubhetê bayê diçin
Ji 'işqa leylayê diçin
Vêkra dikêşin xîretê

130.
Xîretkeşê rengkakilê [128]
Murîd ji rengê bulbulê
Ah û fîxanan radihilê
J'bayê nîfaqa firaetê

131.
Bayê firaqa agir e
J''işqa delîla kafir e [129]
Pansed murîd û zakir e
Wer bûn di behra hêretê

---

127. Xî deşt û sehraye diçûn
Reh şubhetê bayê diçûn
Li eşqa Leylayê diçûn
Pê ra dikêşin xîretê
128. Xîretkeşê reşkakilê
....
Ji bayê firaqa firqetê
129. Bayê firaqê agirî
Pansed mirîd zakirî
Ji eşqa kelaya kafirî

132.
Hêreta behra belayê [130]
Merkeza hewl û liwayê
Birne pêş dêra kelayê
Ji rehtiya qet xew netê

133.
Ji rehtiya cehda terîqê [131]
Çengela wê leb'eqîqê
Celb kirî kêşa xerîqê [132]
Hate bextê dewletê

134.
Çengela şîrînkelamê
Merkeza Şêxê selamê [133]
J'rohniyê kete zelamê
Di nava nûr û zulmetê

---

130. Heyreta behra belayê
Merkeba hewl û welayê
Birne pêş dêra gelayê
Ji rehtiyan behs jê netê
131. Rehtiya cehda terîqê
132. Zû gemî kêşa xerîqê
Hate bext û dewletê
133. Merkeba şêx selamê
Ji ruhniyayê kêşa zelamê
Nav nûra zulmetê

135.
Sekinî li nûra tarî
Bihn û bû miska nesarî [134]
Lê dikir pur dijewarî
Zêde li zikr û 'adetê

136.
Zikrek dikir bi remz û naz [135]
Bêhna gula baxê mecaz
Aşê dilê wan hate saz
Gerya wekî av pê ketê [136]

137.
Geryan wekî dolaba aş
Seknî li dor şêx pêş û paş [137]
Da xaçperest bêne temaş
Ji 'eskera temaşe tê

138.
Eskerê haldar li ber tê [138]
Leşekerê mîrî bi ser tê
Ber derê dêra ku der tê
Şêx dizanit qîmetê

---

134. Ji bêhna bûne ensarî
Sofî dikin dijwarî
135. Zikrek dikir bi remz û raz
136. Çerx û ger û bez vêketê
137. Çerixîn li ber şêx pêş û paş
Na xaçperest bête temaş
Ji eskeran temaşe tê.
138. Eskerê haldar û ber tê
Leşekrê mîr bi ser tê
Çû derê dera ku dûr tê
Şêx dizanî qîmetê

139.

Qîmetşinasê morê tê [139]
Rengê sipî û sorê tê
Durdaneyê Şêx ku rê tê
Çeşmahuwê horşubhetê

140.

Çeşmê di wê horî beçê
Sofî ji 'işqa wê keçê
Geryan li dor dêra neçê [140]
Zahir bikin vê huccetê

141.

Hemyan di dil bû ev fikr [141]
Em dê bi coş biçne zikir
Da bête pêş qenca bikir [142]
Da Şêx bibînit sûretê

---

139. Ev çarîne jî her di destnivîsa Amedî de heye:
a- Qîmetşinasê mehriyan
Şubhetî............tûtiyan
Serdefterê qaz û siyan
Horiya rengşubhetê
b- Qîmetşinasê mehrê
Qedrî sibe wê cewherê
Durdaneyê şêx gewherê
Çeşm ah û horî subhetê
140. Çerxan didim li dêra neçê
Zahir bikin bi wê hêcetê
141. Hemyan li dur ve ev fikir
142. Da bête pêş qîza bikir

142.
Ew sofiyê b'reqs û sefa
Hemyan ji 'işqa mustefa
Vêkra hilavêtin defa
Wan deng bi esmanan ketê [143]

143.
Dengê murîdan çû felek
Dêra ku rahib tê gelek
Anîne pêş ya çavbelek
Hatî şebaka qibletê [144]

144.
Hatî şebak û pencerê
Keşf bû ji sîng heta serê
Xweşhorî û cebhetperê [145]
Bûka dilê cema'etê

145.
Li zakiran keç seyyirî
Murşîd li dêmê fikirî
Ya Reb hene ev reng perî
Nazikbeşer vê xilqetê [146]

143. Wan deng bi suman ketê
144. Hate şibeka qubletê
145. Jor da nezer da eskerê
146. Nazikbeden b'vê şubhetê

146.
Haşa hene ev reng beşer
Roj bû ji şerqê hate der
Vêkra hebûn herdû nezer [147]
Ehsen ji fedl û nî'metê

147.
Dilberê palda şibakê [148]
Sahibê şeml û siwakê
Qenc bir û anî zikakê
Cundî ji hespê daketê

148.
'Aşiq li me'şûq ferricî
Behra evînê heccicî [149]
Murşid di xûnê memicî
J'tîra kivanê cebhetê

149.
Nesraniya zerrînguhar
Sofî dihatin çar kenar [150]
Şêx dest bi dest avête xar
Bê hiş kir û hiş vê netê [151]

---

147. Bûn eqiran herdû nezer
148. Sekinî palda şibakê
Sahibşeml û siwakê
Ber wan anîne zikakê
Yew cindî ji hespê ketê
149. Behra evînê hezizî
150. Sofî ko şad reş li bal
151. Bêhiş kir û hiş pê netê

150.
Herdu wucûd anîne pêş
Hindî hebûn 'esker û cêş
Heçî ku dî lê bû dilêş [152]
J'husn û cemala hey'etê

151.
Sofî ji husnê cehişîn
Cerg û hinav lê herişîn
Herçî ku dî pê şewişîn
J'berq û birûska ru'yetê

152.
Ew berq û tîra purweş e [153]
B'husn û cemal û mehweş e
Pêta birûska ateş e
Zêde ji hedd û xayetê

153.
Tîra di dil ateş bitin [154]
Gezm û kevan tozreş bitin
Heyhate kengê xweş bitin
Can sohtiyê sor vêketê

---

152. Heçî ku dî rabûne pêş (Amedî)
153. a- Perqa birûska perweş e
Tîrê kevanê tozreş e
Pêka birûskê ateş e
b- Tîr û kivanê tozreş e (Amedî)
154. Tîra di dil da ateş bitin
Kezmane kevan reş bitin
Heyhate kengê xweş bitin
Cansotiyê ser vê ketê

154.
Narê surrê peyda bitin
Bayê mecaz lê rabitin
Qet ew birîn xweş nabitin
Tîra li dil meyl nadetê [155]

155.
Wê dilberê dil lerizand [156]
Murşîd di xwûnê gevizand
Pêsîr ji xwînê qirmizand
Qet mahê rû rehm pê netê

156.
Hemyan ku dî ew rûmeh e
Qoce kete ber dergehe
Wan gote qet lewme neh e [157]
Îro li şêxê xelwetê

157.
Xelqno ji şêx loman mekin
Ew reng perî xalan vekin [158]
Dê aşiqan dîwane kin
Ji teb‘ê me‘şûqan ve tê

---

155. Tîra di dil mêl naretê
156. Wê dilberê dil derizand
Murşid di xwûnê gevizan
Pîr ji xwînê qurmizand
Ruyê rehmê qet pê netê
157. Wan gote hev lome neh e
158. Ev reng perê zilfan vekin

158.
Me‘şûq di surrşîrîn dibin [159]
Mehbûbê dêmnûrîn dibin
‘Aşiq ji pêş ve dîn dibin
J'bayê firaqa firqetê [160]

159.
Sîngebyed e xunce li ser
Nazik ji bircan bête der [161]
Pê dîn dibin sahibnezer
Sofî ji kêfa qudretê

160.
Keyfa surrî bê şubhe ye
Ew ne wekî benka me ye
Sofî dibên seddeq we ye [162]
Dijwar e bêhna hikmetê

---

159. Me‘şûq li ser şîrîn dibin
160. Ji bayê wisala qurbetê
161. a- Narê mecazî bête der (Amedî)
b- Di R. de ev çarîne wiha ye:
"Singebyeda xunce li ser
Dikan sêv hîv û hinar
Turence dema ji der têne der
Jê dîn dibin sahibnezer
Sofî wê ji kêfa qudretê"
162. Saqî dibê sidqê we ye

161.
Bêhna gula baxê bi gul [163]
Bête dimaxê d'çine dil
Jê dîn dibin sahib'eqil
Tîra ji wesla dil ketê [164]

162.
Nesraniya b'zêr û zeheb
Zahir bibê cuz'ek rexeb [165]
Dêşî ji ber cerg û kezeb
J'tîra di nîva dilketê

163.
Tîrek ji qewsê mahihîlal
Têtin ji burca rojheval [166]
Mecrûh dibin ji ehlê hal
Ku jê bikin cerahetê

---

163. Bihna surê baxê bi gul
Dête dimaxê diçête dil
164. Ji dîndar û dîna xefletê
165. Zahir bibe ciz'ek xebeb
Dêşan ji ber cerf û kezeb
166. Bêtin ji birca rojheval
Mecrûh bidin jê ehlê hal
Guh bidin j'vê cerahetê

164.
Cerhê bi xwîn tîmar bikin [167]
Dîsa bi şûn ve bar bikin
Hetta ku şêx hişyar bikin
Piştê bidin kerahetê

165.
Ned'hat ji Şêx nutq û kelam
Hetta sê roj bûne temam
Li ser girîn yar û xulam [168]
Derwêş û xelqê rehmetê

166.
Mekrûh û tehrîm e nezer [169]
Ew sofiyê "Yasîn" jiber
Wan sê şevan xwendin li ser
Nutq û kelamek jê netê

---

167. Birînê bi xef tîmar bikin
Werin em şêx hişyar bikin
Dîsan bişûn ve bar bikin
Piştê bidêne mekrûhetê
168. Li ser digrîn yar û xulam
Dilêş û xelqê rehmetê
169. Mekrûhiyê tehrîm nezer
Ew sofî ku "Yasîn" jiber
Wan sê seva xwendin li ser

167.

Şîn û girîn matem kirin [170]
Hemyan li dor hawar kirin
Hetta ku Şêx hişyar kirin
Xelq lê dixwûnin tebbetê

168.

Hindî hebûn vê ra murîd [171]
Sed şîret û we'z û we'îd
Wan rêhte gohê Şêx seîd [172]
Şerh û bayana ayetê

169.

Ayet dibê neqqaş yek e [173]
Neqşê fena ber pê meke
Lubsê ku lê bêtin leke
Qet ew nebî ji de'wetê

---

170. Ji paş sê rojan mader kirin
Hemyan li wî hawar kirin
Hetta ko şêx hişyar kirin
Bi xefle dixûnin sinnetê
171. Hingî hebûn li cem mirîd
172. Wan gote wî Şêxê seîd
173. Ayet dibê neqş yek e
Neqşê fena ber ve meke
Leheb ko tê lehb tu meke
Ew bi tenê jê te tê.

170.
Libsê leka reş lê hebî [174]
'Eyb e di ber şêxê me bî
Ya qenc ew e Şêx jê vebî
Em jê dikin vê şîretê

171.
Em şîreta nûriyetê [175]
Hem xîreta qewmiyetê
Nadin bi teb'ê dînetê
Bê cezbeya sefahetê

172.
Şêx go Sefîh û ebleh im [176]
Îro li teb'ê we nehim
Sondî dixwum bikra rûmeh im*
Qebûl dikim qebahetê

174. Libsê li kariş lehebê
Nabe di ber pîrê me bê
....
Em aciz in ji vê şîretê
175. Ser şîreta nûraniyê
Em xîreta qewmîniyê
Nadin bi teb'ê diniyê
Bi cezbeya sefahetê
176. Şêx go sefiyê Allah im
Sond xwar û bikra rûmeh im
Îro li teb'ê wê neh im
Qebûl dikim qebahetê
* Sondxwarê bukra rûmet im

173.

Şêx got bi ezmanê fesîh [177]
Dengê keça bikra melîh
Nadim bi zikrê we sehîh [178]
Dûr im ji wê sem'iyyetê

174.

Ez 'arif im min têk medin [179]
Bes şîretan li min bidin
Îro keça nazik beden
Nadim bi we cem'iyyetê

175.

Mecnûn kirim 'acgerdenê
Ew 'ef'iye j'rengê xenê
Kuştim li erdê Yemenê [180]
Şehmar û zulfa qametê

---

177. Şêx gote wan libsê qebîh
....
178. Nadim bi wê banga sehîh
179. Er aqil in min têk medin
Bes şîreta bêhûde din
Îro keça nazik beden
180. Kuştim li erdê Ermenê
Şehmar û zulf û qametê

176.
Marê milê wê gestime [181]
Zulfê di nazik bestime [182]
Sani' ji sun'an xwestime
Da têr bibînim ru'yetê [183]

177.
Sofî dibên ya ewliya
Hubbê mede zulfê siya
Daîm hişîn nabin giya
Bayê payîzek lê ve tê [184]

178.
Bayê gerand aşê kubar [185]
'Enbersiyah çûne diyar
Çerxê gerand lê toz û ar [186]
Anîne rengê kaxetê

181. Marê mirî ez kuştime (Amedî)
182. Bi zulfê di nazik bestime
Sani'ê sen'an xwestime
Da têr dibînim sin'etê
183. Da ez bibînim sun'etê (Amedî)
184. Payîz û buharek di pê ve tê.
185. Bayê gerandî aş li kar
186. Çerxê reşandî toz û ar

179.

Em lew dibên dil jê veke
Ew sunbula rengîn yek e [187]
Birim serê şeyba xwe ke
Zulfa siyah jê lewme tê [188]

180.

Kustaxiye em şîretan [189]
Î'lam bikin Şêx qissetan
Pîr e li ser van milletan [190]
Kes î'tîbar qet pê netê

181.

Ew ta'etê te bêhisab [191]
Pêncî hecc û pêncî sewab
Mefroş bi vê bey'a xerab
Poşman dibî j'me'melet

---

187. Ew sunbula rengîpek e
Bavêje kêfa xwe ke
188. Zulfa siyah qet jê netê (Amedî).
189. Şêx xeyidî ev şîretan
Îlam min mekin şîretan
Pîrê li ser van miamelatan
Qet kes îltîfat pê netê.
190. Dûr bû ji ferz û sunnetan (Amedî)
191. Ew taetê te bêhisab
Pênce hec û pênce tewaf
Sewm û selat û î'tîkaf
Mefiroş bivê 'eyba xirab
Poşman dibî ji vê me'ameletê

182.
Mefroş durran bi moriyan [192]
Cama di destê horiyan
Îro mede b'avşoriyan
Rabe here ava şetê [193]

183.
Şêx gote wan ev rengsuxen
Şîret eser nakit li men
Pênce hec û çarde ruken [194]
Danîne ser vê xizmetê

184.
Pênce hec û pênce tewaf
Sewm û selat û î'tikaf
Bexşîş kirin min bêxilaf
Di mizgîna beşaretê [195]

185.
Pêla ku min îhram-i best [196]
Şahidê min bûn herdu dest
Min rehbera baxo dixwest [197]
Vêk ra bicîne hezretê

---

192. Mefiroş duranbi xermoriyan
193. Dibuhire ava şetê
194. Pênce tewaf û çar rikin
Min danîne ser vê qissetê
195. Di mizgîniya bişaretê
196. Pê ko min îhram di best
197. Min ruhberek ji baxwê di xwest

186.
Şêx gote wan ev rehber e
Ev neynika Îskender e
Yan meqsed e yan mezher e
Dêm şûşeya xenîmetê [198]

187.
Şûşeya nûrîn cesed lê [199]
Dergehê muhra ehed lê
Eks û nîşana semed lê
Li mifteya wehdaniyetê

188.
Şêx gote wan hûn zakir in
Guhdarê ‘ilmê zahir in
Bo çi ji me’bûd nagirin [200]
Davêne ser min tuhmetê

---

198. Ew şûşeya canê me tê
199. a- Dêmşûşeya nûrîncesed
Li dergehê muhra ehed
Li eks û nîşana semed (Amedî)
b- Ew şûşeya nûrîncesed
Li dergehê mihra ehed
Li eks û nîşana hemed
Li mifteya wehdanetê-Rudenko
200. Çarek ji me'bûd nakirin
Davêne ser min qissetê)

189.
Xelqno qisan mekin ji min
Bê qudreta şahê mezin
Mewcek ji behra lemyekun
Nayête der bê meşyetê

190.
Bêmeşyeta mîr nabitin
Hetta ku teqdîr nabitin
Qismet bi tedbîr nabitin
Zêde ji miqdarê netê

191.
Hêj qet nebû derya û ber
Baxwo nivîsî xeyr û şer
Muhr kir berata nef' û derr
Xelqno ji wî bi ser me tê [201]

192.
Hindî xeber hindî şixul [202]
Defter kirin roja ewwul
Baxwo bi xwe mohr kir sicil
Havêt berata huccetê

---

201. Xelqo ji wê kin qisetê
202. Hingê qise hingê şixul
Defter kirin roja ewil
Bixwê bi xwe mihr kir secil
Avêt berata hicetê

193.
Hemyan reqem hingavtibû [203]
Şad û xem û hem nîkê bû [204]
Fîlhal qelem hişk bû û çû
Hûr bû li ser kitabetê

194.
Ji paş evan kitabetan
Dirêj mekin 'îbaretan
Hûn seh bikin îşaretan
Dûr in ji halê hikmetê [205]

195.
Ev halekî kûr tê heye
Durbînekî dûr tê heye
Pur metnekî hûr tê heye
Sofî nizanin wê xetê

196.
Kaxidê herfê di reş tê
Muhr û mizgînê di xweş tê
Geştê seyrana beheştê
Vê keçê şêx naretê [206]

---

203. Ev çarîne di pirtûka Rudenko de nehatiye, anko nîn e.
204. Hem jar û xem hem nîkê bû.
205. Dur in ji hal û hikmetê
206. Bê keçê şêx naretê

197.
Bê ism û cismê dilberê
Çi b'kim bi ava kewserê
Dê ixtiyar kim seqerê
Nar xweştir e ji firqetê

198.
Narê firaqa sertemê
Wasil be pêtê cehnemê [207]
Agir diçîne 'edemê
Esla buruska jê netê

199.
Xelqno cihê nav lê cehîm [208]
Biberketa yarê helîm
Dê bête "cennetunneîm"
Jê têt buxûra cennetê

200.
Şêx go bi fedla mekkehê
Naçim ji nik wê rûmehê [209]
Er cennetê er dojehê
Her çî cihê yar dê her tê [210]

---

207. Wasil dibe cehennemê
Agir diçête edemê
Esla burûskek jê netê
208. Xelqo cihê nav cehîm
Bi bereketa yarê helîm
Dibite cinita neîm
Ji bêhna bixura cinetê
209. Naçime heşrê bê rûmehê
210. Her çi derya dûr ditê

201.
Sofî dibên ya Elleh e
Şêx ixtiyar kir dojeh e
Tabi‘ bibîn çi tê neh e
Layiq dibîne hirqetê

202.
Şêxê me hal lahiq bûye
Dîwane û ‘aşiq bûye
Ger çî ji bal xaliq bûye [211]
Cezba wuhe qet kêr netê

203.
Cezba feqet peyda bitin [212]
Hindî di Şêx doma bitin
Mestî çû rayê nabitin [213]
Pê agehe j’ terbiyyetê

204.
Şeyx aşiq e bêageh e
Qet hay ji halê me neh e
Nayêt bikêr Şêxê wehe
Jê seh bikin terîqetê

211. Gerçî ew ji Xaliq bûye
Cezba feqet bikêr netê
212. Ev çarîne di R. de nîn e.
213. Bê pîr û rehbera nabitin (Amedî)

205.
Mecnûnsifet nayêt bikêr [214]
Meczûb bûye ew pîremêr
Şêxê me bû naqos û dêr
Bû hucceta terkiyyetê

206.
Heta niha herçî hebû [215]
Xîretkeşî heqê me bû
Ev car qisset bêlome bû
Azad-î bûn ji lometê

207.
Xîretkeşan reng xeyyirand [216]
Wan sofiyan Şêx heccirand
Hemyan li dêrê şemmirand [217]
Mecrûh dilê jan vêketê

214. Mecnûnsifet nabit bikêr
215. Heta niha çi tê hebû
Xîretkeşê heqê me bû
Ev car qiset lome bû
Aza bûn em ji lometê
216. Xîretkeşan nêt xeyirand
217. Şêx li dêrê şemirand
Mecrûh dilê şaşî ketê

208.
Ew sofiyê dînmehkema
Ji cem'eta lê bûn cema [218]
Yek hevriyek vê ra nema
Bûne surûda ayetê [219]

209.
Sofî hemî rabûn ji bal
Hiştin li vî ew pîrekal
Hiştin li ser dînê betal [220]
Wan bê hisab kir jê vetê

210.
Hemyan vebûn jê kerb û kîn [221]
Der bûn ji cehvan av û xwîn
Talan kirin ya xaçhebîn
Derba xezalan vêketê

211.
Kê dî xezal şêran bigrin [222]
Betlan ji nav mêran bigrin
Şeyxan di nav dêran bigrin
Qutban ji xelqê ummetê

---

218. Cemiyetan lê bûn cema
219. Dabûne ser wedaetê
220. Hemiyan li ser dînê betal
221. Qewî jê hebû kerb û kîn
Der bû ji çehvan av û xwîn
222. Kê dî xezal şêran gerîn
Betilan ji reng wan dergerîn
Şêxan di nav dêran gerîn
Qutbê ji xelqê ummetê

212.
Ew murşidê pur muste'îd [223]
Ew ten ji 'işqê bû qedîd
Ji hevriyan maye wehîd
Çû mewzi'ê selametê

213.
Hindî ku Şêx heval hebûn [224]
De'wa û qîl û qal hebûn
Her roj hezar xebal hebûn
Ji hevriyan nigah ketê [225]

214.
Bazgîr divê peyker bitin [226]
Xewfê ji 'amê der bitin
Têxûn di torê wer bitin
Bi vê mîsalê nisbetê

215.
Ew murşîdê nav di dinê
Heta nema fikrek tinê [227]
Giha derê dêr mezinê
Babê xezîna hacetê

---

223. Ew murşidê qenc musteîd
Dil ji eşqê bû qedîd
224. Heta ku şêx heval hebûn
225. Ji hevriyan nagihtê
226. Ev çarîne di R. de nîn e.
227. Heta nema ew bi tenê
Negiha derê dilmezinê

216.
Babê xezîna mar li ser
Şêx ejdeha avête der
Dêmdurr ji dêrê hate der
Îkram kirî kalê ketê

217.
Îkram kir Duhta Gurciyan
Şeyx nexweş rabû piyan
Ji ber keçê û hevriyan
Meylê kêşande xizmetê

218.
Meyla evîna ekber e [228]
Qametneba lebşeker e
Pursîn ji Şêx çend xebere
Kû ve diçî ji kû ve tê

219.
Ji kû ve tê ya rihsipî [229]
Nedbû ji hevalan vebî
Di reng te da 'işqek hebî
Bihn û bûya misk ji te tê

---

228. Meyla hebîba dilber e
Qametneya lebşekir e
Pirsî ji şêx çend xebere
Bi ko ve diçî ji ko ve tê

229. Ji kove tê yarê sipî
Nedbû ji hevalan vebî
Rengê te jî mîna eşq hebî
Bêhna bû miska te tê

220.
Şêx gote wê bêşek we ye [230]
Nafe bixwe qelbê me ye
Ev esera miska te ye
Lew zahirî bihn ji me tê

221.
Miska te ev reng zer kirim
Dîwane û ebter kirim [231]
Pêçam di dêrê wer kirim
Anîme ser vê haletê [232]

222.
Şêx go te ez bedhal kirim [233]
Bê hevrî û heval kirim
Hubba te ez ker ker kirim
Bi çak û gaza muhbetê

223.
Girtim bi gazê giffişîm
Batin bi xwûnê şewwişîm [234]
Zahir birîn lê herrişîm
Pehtim çiraya hezretê

---

230. Şêx gote wê bêşik we bû
Navê bi xwe qelbê me bû
Ev eserê miska te bû
Lew zahirî bênh ji min tê
231. Hubba te ez ebter kirim
232. Îname ser vê haletê
233. Şêx go te ez bedhal kirim
Bêhevr û heval kirim
Pêçam di dêrê werkirim
Îname ser vê haletê
234. Batin di xûnê şewişîm

224.
Pehtim xezala çavxurab
'Işqa tê ez kirme kebab [235]
Sotim biraştim bê hesab
Berqa 'uyûnan vêketê

225.
Herdu 'uyûnan berq veda
Burca kivanê esweda
Tîrek li mêlaka me da [236]
Hetta qiyam jê dernetê

326.
Teb'etkubara Ermenî
Dêm xawer û xurşîd enî
Xweşxweş bi halê Şêx kenî
Mecnûnekê b'dêrê ketê

227.
Mecnûnekî rengebter î [237]
Dîwanekî qelender î
Ne lawekî gerdenzer î
Ne cindiyê gencbabetê

---

235. Puxtim te xezala çavxerab
Hubba te ez kirme kebab
Sohtim, biristim bêhesab
Berqa çehvan vêketê
236. Tîrek di mêlaq da mi da
237. Mecnûnekî qelender î
Feqîrekî rengebter î
Ne jî lawekî gerden zerî
Ne jî cindî ku ez babetê

228.
Ne j'cindiyê babet ez î [238]
Naxut li te tiryan rezî
Quwwet nehin sêvê gezî
Bê fem û dev ji kar ketî [239]

229.
Bê fem û dev ji kar bûyî [240]
Kuftar ji reng ji kar bûyî
Ji taqetê bîmar bûyî
Ji kuhneyê pur afetê

230.
Ji kuhneyê lêv şorbûyî [241]
Kuftarê qametqor bûyî
Îro qewî devkor bûyî
Borî ji behra lezzetê

---

238. Ne jî lawekî babet ez î
Bihoriye li te terî rizî
Taqet neh in sêvan bigezî
Bêfem bûyî ji kar ketî
239. Bêfamekî ji kar ketî (Amedî)
240. Bêfem û hem ji kar bûyî
Keftar û reşkal bûyî
Ji bêtaqetê bêxwar bûyî
Ji taqeta ve daketî
241. Ji kalî lêvşor bûyî
Keftar bûyî devgor bûyî
Îro tu yî dergor bûyî
Tu borî j'behra lezzetê

231.

Bê reng û bê usûl bûyî [242]
Ji kuhneyan milxwar bûyî
J'cuwaniyê me'zûl bûyî
Ji taqetê xwo daketê

232.

Dilber dibê ya pîremêr [243]
Ji kuhneyê nayê bi kêr
Lew hevriya hêla li hêr [244]
Tu b'kêrî bazara netê

233.

Dilber dibê ya bapîrmezin
Îro ji te têtin kefin [245]
Muhemmedî naxut li min
Ez îsewî tu sunnetî

---

242. Tu borî bêwisûl bûyî
Ji kohnê medxûl bûyî
Ji ciwanî mazûl bûyî
Ji taqetê da tu ketê
243. Dilber dibê ya kalemêr
244. Lew hevriyan hiştin li hêr
Bi kêrê bazaran netê
245. Îro te bibin kefin
Tu Mehemed nabî ji bo min
Ez îsayî tu sinnetî

234.
J'vê qissetê vêk nakevîn
Ne j'mezheb û dînê hev în [246]
Meqbûlê min nabin evîn
Ta binî ser cehaletê [247]

235.
Sosinzebana pursehîh [248]
Gotî bi ezmanê fesîh
Ger tête ser dînê Mesîh
Belkî bikin ri'ayetê

236.
Ri'ayetan em pur bikin
Vêkra şerabê fir bikin
Me'aşê te em şert bikin [249]
Ji nan û av û qismetê [250]

---

246. Ne li sin hebû dînê hev in
Meqbûl min nebe evîn
Hubba bi vê cehaletê
247. Meger tu bê cehaletê (Amedî)
248. Sosonzibana paksehîh
Wê got bi ezmanê fesîh
Er tê bê ser dînê Mesîh
249. a- Maşê te jî serbir bikin
b- Maşê te em vê pur bikin (Amedî)
250. Ji nav û avê qismetê

237.

Maşê meşayix rast bikin
Nêzîkî xwe çavnas bikin
Rahîbsifet lîbas bikin
Şêx bê zinar bikêr netê

238.

Qebûl dikir zinnarekî [251]
Herroj û her êvarekî
Ez te bixwînim carekî
Bi hucceta ziyafetê

239.

Ziyafetan bi şev bikin
Herîfiyan bi dev bikin [252]
Pur yariyan bi hev bikin
Rûnin li koşa sohbetê

240.

Rûnin li ser dînan şevê [253]
Er Şêx disojit mushefê
Rast e cemala min divê
Heqqul-yeqîn min bê te tê

---

251. Qebûl dikî zinnarekî
Hero hero êvarekî
252. Henekan em bi hev bikin
253. Rûnên li ser dinya şevê
Er şêx disoje mishefê

241.
Lebşekera dur di dev e
Got xebera paşîn ev e [254]
Er tê bi ser dînê me ve
Tu b'kêrî baqura me tê

242.
Ez lew dibêm vê gotinê
Ez 'arif im me'nê binê [255]
Sergeşteyê dîn minê
Tu min bighîne axretê

243.
Dê aşiqan meylek hebî
Guhdarê me'şûqa xwe bî [256]
Qet hay ji paşrojê nebî
Ji intîzara wesletê

244.
Işq û mehebbet ismek in
Aşiq û me'şûq cismek in
Herdû di hev da qismek in [257]
Şêxek di vê me'nê de tê

---

254. Got xebara paş ev e
Ger tê bi ser dînê me ve
Bikêrî baqorê me tê
255. Ez 'arifî me'nê tenê
Sergiştine dinê minê
Tu min bigir ne axretê
256. Guhdarê mehbûba xwe bî
257. Herçar di hev da qismek in

245.
Şêx go tu necata min î
Îhram û mîqata min î
Neynik û mîr’ata min î
Ser ta qedem têru’yetê [558]

246.
Ser ta qedem tê neynik î
Mişkat û nûra bê şik î
Leble‘l û sîma nazik î
Tu muhriya letafetê

247.
Muhriya rohnî şefîf e [259]
Neynika Şêxê şerîf e
Mezhera Şahê Letîf e
Me‘dena durdane tê

248.
Yan me‘den î yan gewher î
Yan sani‘ î yan mezher î
Yan ‘eksa Şahê Ekber î
Yan neqşê têkda ru’yetê [260]

---

258. Ser ta piyan têk rayetê
259. Tu rohniya mihra sefîf î
Neynika şêxê şerîf î
Mezhera şahê letîf î
260. Yan tê ji te neqşê royetê

249.
Katibê neqşê li avê [261]
Sani'ê şûşa gulavê
Nûr ji bala rihte navê
Narê zeyta hikmetê

250.
Agirê zeyta fitîlê
Pertewê şem'a cemîlê [262]
Da dilê Şêxê qebîlê
Ji rohniya wehdanetê [263]

251.
Rohniya dabû wucûdê
J'muhbeta şahê wedûdê [264]
Nagihan Şêx bir sicûdê
Mey vexwar vê sa'etê

---

261. Katib neqiş li avê
Şûşeya ava gulavê
Nûr ji bala tête navê
Nar û nûra hikmetê
262. Pertewa ismê cemîlê
263. Rohniya wehdanetê
264. Ji muhbet aşahê wirûdê
Nagihan Şêx çû sicûdê
Mey vexwar di wê saetê

252.
Ew meya gulgûn û al e
Dilberê dayê peyal e [265]
Noşîcan kir Şêxê kal e
Badeya afiyyetê

253.
Dilberê cam dabû deste
Wan zinar anîbû beste
Zahirî dîn çû ji deste
Batinî ma di meşyetê [266]

254.
Şêx go di batin fikirîm [267]
'Işqa te ez xaret kirim
Îro di gel te kafir îm
Hetta ku dewrana me tê [268]

255.
Lewleb û dunya bi dor in [269]
Geh li jêr in geh li jor in
Me û te nobet bi dor in
Ta zemanê firsetê

---

265. Dilberê wî daye piyale
Noşîcan kir pîrekale
Sadeya afiyetê
266. Batinî çû meşyetê
267. şêx go te batin vekirim
268. Heta ko dewra min tê
269. Lewleb û dewran bi dor in

256.
Firset û talî û bext e
Hudhudê Belqîs û text e
Şêx dizanî hêj ne wext e
Wext di pê sebrê ve tê

257.
Sebrê mey bade vexware [270]
Wan li puşt bestî zinar e
Şêx suhûf avête nare
Ji meyxwer û dîsan ve tê

258.
Ew meyxwurê hişyar û hey [271]
Di meclisa purçeng û ney
Şeml û seccade dan bi mey
Me'bûd dizanit hikmetê

259.
Hikmeta wan remz û razan
Murşîd û naz û niyazan
Mey vexwar çû ber berazan
Pêxwas bi kendalan ketê [272]

---

270. Sebirî bade vexware
Wan li pişê best zinare
Şêx mishefê avêt nare
Ji muskur û dîna ve tê
271. Ev çarîne di R. de nîn e
272. Pêxwas di pê wehsan ve tê

260.
Murşidê pêxwas û tazî [273]
Cih li ser postê berazî
Sedefa duran dixwazî
Ji herdû lêvan şerbetê

261.
Şerbeta wan herdû lêvan
Qameta narinc û sêvan [274]
Mehneta wan roj û şêvan
Ew sefa bû vêketê

262.
Her durra dost lê lîqa ye [275]
Hûn mebên xizmet cefa ye [276]
Xizmeta ba xwo sefa ye
Di deftera me'rîfetê

263.
Pansed hezar cewr û cefa
Nêzîkî dostê purwefa
Li Şêx bûn lezzet û sefa
Pêxwas di pê wehşan ketê

---

273. Ew murşidê pêxwas û tazî
Çû li ser postê berazî
Sedefa dur tê dixwazî
274. Qameta rîhan û sêvan
Zehmeta wan roj û şevan
275. a-Her dilê dost lê qefaye
b- Her durra dost lê lixa ye (Amedî)
276. Hûn mebên zehmet cefa ye

264.
Ew murşidê pêxwasqedem
Têra diçûn pansed kelem
Jê der dibûn xwûn û elem
Çeşmê mubarek vêketê

265.
Çehv pê ket û dil pê sihot [277]
Şêx rojekê xwend û hevot
Rewa neh in wehş bîne cot
Cî cî dixwun me'îşetê

266.
Wehş û beraz vêk nakevin
Cî cî diçêrin rakevin [278]
Nabî li dû bi ba kevin
Zêde dibînî zehmetê

267.
Hebik şedîd bin çar bike [279]
Wehşê mezin tîmar bike
Darê qutanê kar bike
Pêla li te êvar ku tê [280]

---

277. Çehvan didî dil pê disoht
Şêx dewrekî xwîn du hevot
Adet nehên wehş bêne coht
Cî cî dixwun meîşetê
278. Cih cih derin radikevin
Nabin li derve rakevin
Şêx zêde dibîne zehmetê
279. Heblek şedîd pê çir bike
280. Heta ko pê êvar ve tê

268.
Hingî ji wî têtin hewar [281]
Baqur hemî têne kenar
Hîna ku lêdî tu bi dar
Garan di hewara te tê

269.
Mecmû‘ dibê baqur li bal [282]
Ew tîremaşê bêfesal
Da bên bi hev re biçne mal
Meş û mûpîsê leşketê

270.
Xweş mecala şîretê bû [283]
Qîl û qalê meselê bû
Gişt kemala Wesletê bû
Bakutê bextê bi xwe tê

---

281. Êvar ko tê rabî bi dar
Hingî ji wê bitin hewar
Baqor hemî têne kenar
282. Mecmû‘ bûyin baqor li bal
Ew têrmaşê bêfesal
Rapêç bi hev re bine mal
Xweş xweş mecala şîretê
283. Bû qîl û qala qisetê
Gihişt kemala wesletê
Bakû tê bextê xwe tê
Şêx maye di dewrana zehmetê

271.
Şêx li wê ma duwazde mehan
Hetta refîq çûne cîhan
Bi zatekê sadiq gihan
Li serwerê xilafetê

272.
Xelîfekî mabû li mal
Hevrê di şêx têk çûne bal [284]
Jê ra kirin hal û hewal
Ji cezbeya Şêx vê ketê

273.
Şêx cezbeyek hatî nehîn
Çil rojekan geryaye dîn
Lubsê di ber têk bûne xwîn [285]
Ji perdeya bi derketê

274.
Perde dirandin zahirî
Pur dikenî kêm digirî [286]
Dîn kir keça sîmenperî
Meger giha xesaretê [287]

284. Hevalê şêx têk çûne bal

285. Pêsîr li ber têk bûne xwîn

286. Geh dikenî geh digirî

287. Mekseb giha xesaretê

275.
Rabûn bi qesda xêrekî
Nageh gihane dêrekî
Keftine pencê şêrekî [288]
Lerzîn ji hewl û heybetê

276.
Pencê di şêr em dane hev [289]
Şêxê me xwe avête dev
Li sofiyan bû hewl û rev
Qet yek nema l'wê haletê

277.
Şêxê me pur şêrehmerî [290]
Pansed murîd tîjnezerê
Belav kirin ji wê derê [291]
Eslansurrê şêrheybetê

278.
Eslansurrê Şêxê me bir [292]
Qenc tabi'ê dînê xwe kir
Me qesda dergahê te kir
Hatîne ber hîmayetê [293]

---

288. Keftin penceya şêrekî
289. Çehvê di şêr em dane hev
290. şêxê me bû ehmer e
291. Belav kirin li wê derê
Ji wê eslan şêrheybetê
292. Eslan serê şêxê me bir
293. Em hatine ber himayetê

279.
Tu Şêx Etarê Sadiq î
Rast û dirustî Xaliq î
Îro wekîlê mutleq î
Ewnet ji ferwara te tê [294]

280.
Em cumle mêr pansed heyîn
Îro di fermana te yîn
Wellah li ser ehda xwe yîn
Himmet bikî Şêxê me tê [295]

281.
Şêx gote wan sahibsurran
Ne aferîn j'ehda we ran
Kafir nebûn b'şêxê xwe ran [296]
Tirsan ji şêr û şewketê

282.
Şewket nekir we pansedan [297]
Hîna ku Şêx da ber esedan
Calek nebû di kusedan
Hespê xwe batin hey ketê

294. Hikmet ji fermana te tê
295. Hikmet bike Şêxê me tê
296. Tabi' nebûn bi Şêxê xwe ra
Hûn tisiyan ji şêr û şewketê
297. Himmet nebû we pansedan
Ku Şêx ne rehandî ez bilan
Maî di destê yaxiyan
Hespê xwe batin jê ketê

283.
Xweş hûn hemî bi kêr nebûn [298]
Cumle xwe pansed mêr hebûn
Lew pencegîrê şêr nebûn
Ji qelsî û kêmcur'etê

284.
Sofî dibên ya Şêx meded [299]
Bêhede dijwar e esed
Vala kirin zîn bê'eded
Davêt û awur nadetê [300]

285.
Sofî dibên şêran werîn [301]
Mixleb wekî şêr didirîn
Vêk ra hezaran dibirîn
Mecrûh di babîl raketê [302]

286.
Mecrûh kirin şêran gelek
Harût û Marûtê melek
Zincîr kirin ya çavbelek
Li doşeka seltenetê

---

298. Xwe hûn cumle bi kêr nebûn
Xwe hûn pansed mêr hebûn
Lew pencekerê şêr nebûn
Ji qelsî û bêcur'etê
299. Sofiyan gote ya şêx meded
Bêhed dijwar bû ew esed
300. Avêt û awir naditê
301. Sofî dibên şêr awirîn
302. Mecrûh li balê raketê

287.
Pur pehlewan pur şehsuwar [303]
Hevrê di Şêx bûn sed hezar
Ferhad û Xusrew dîn û xwar [304]
Danîn ji hespê qudretê

288.
Şêxê me fehm kir ev xeber [305]
Şêxê ku şêran daye ser
Heval hemî hatin ji ber
Ferz e li we yek teb'etê

289.
Ferz bû hemî heval bûna [306]
Tabi'ê Şêxê kal bûna
Nêzîkî dînê Zal bûna
Ew bû di ya ehliyyetê

290.
Min ehlê dilsabir divên
Nêzîkî Şêx Qadir divên [307]
Vêk ra hemî kafir divên
Qenc bû qewî j'bo xîretê

---

303. Ev çarîne di R. de nîn e.
304. Feryad ji wî bo te diyar (Amedî)
305. Şêx go me fêm kir ev xeber
Xîret li wî kir bû eser
Hûn zû bi zû nehatin ji ser
Qîr bû li we yek teb'etê
306. Qîr bûn hemî heval bu wan
Tabiê Şêxê kal buwan
Nêzîkî dînê Zal buwan
Li ser xatirê ehliyetê
307. Nêzîkî şêxê kal divên

291.

Eqil hebûna bi we ra [308]
Meyl û muhebbet ji we ra
Kafir bûna b'Şêxê xwo ra
Lê ew hucû bikêr we tê

292.

Qenc bû qewî ew ji we ra [309]
Ji nam û namûsa we ra
Kafir bûna b'Şêxê xwe ra
Qenc bû ji bo ehliyyetê [310]

393.

Ya ez dibêjim qen ev e [311]
Vêk ra hemî hûn têne ve
Da çîne pê Şêxê xwe ve
Herçî qeza bi ser me tê

294.

Ew murşîdê te'sîrnezer [312]
Berhev kirin sahibkemer
Hemyan ji mal ho dane ser
Ji zakiran hengame tê

---

308. Ev çarîne di R. de nîn e.
309. Qenc û qewî ew ji we ra
310. Lê ew li mal bîra we tê
311. Ev çarîne di R. de nîn e.
312. Ew murşidê şîrînnezer

295.
Bi hayî û hengame çûn
Bi şahî û me'reke çûn
Hetta ve pêş dêran ve çûn [313]
Esker giha memleketê

296.
Ewwel gihane cayekê
Sofî dikin semayekê [314]
Vêk ra dikin du'ayekê
Kanê nabînin zû ru'yetê [315]

297.
Da em bibînin xewnekî [316]
Bi bûnekî bi kewnekî
Bi rengekî bi lewnekî
Da betê ber îşaretê

298.
Ew sofiyê ewrad ji dev [317]
Wan meclisek danî bi şev
Şêx seherî çav çûne hev
Wî dî Şefî'ê ummetê [318]

---

313. Heta ew pêş dêrê û çûn
Dengek giha memleketê
314. Îşev bikin semayekî
315. a- Dan dibînin re'rayetê
b- Da em bibînin zû ru'yetê (Amedî)
316. Ev çarîne di Amedî de nîn e. Lêdiyar e ku eve
cihê wê ye.
317. Ew sofiyê bawer di dev
318. Zû dî şefîê ometê